

**Omitê Mistefê**

**HÊVÎ**

**Û**

**TÊKOŞÎN**

**-roman-**

Gelê mêvanan!

Îro civaka kurd rastî neheqiyêke mezin tê ku dewletên mezin bi polîtîkayên kirêt alîkariya dijminên kurdan dikin. Neteweyên Yekbûyî bi qasî mezinahiya navê xwe tevnagere, ne li kurdan xwedîtîyê ne jî wasîtîyê dike. Divê bê zanîn ku navê gelê me û hebûna me ya li ser axa me ya îroyîn him di pirtûkên dîrokî yê kevnare de him jî di nava rûpelên dîroka îslamê de bi awayekî eşkere hatiye tomarkirin. Ez ê di vê axaftina xwe de qala rûpeleke zêrîn a navlêkirina kurdan bikim.

Li meclisa cenabê Pêxemberê Îslamê Mihemed eleyhiselam kurdek xuya bûbû. Navê xwe wekî Caban Es-Sardî El-Kurdî pêşkêş kiribû. Bi erebî axivîbû Cabanê Xwedê jê razî; lêbelê kurd bû, kurdî û latînî dizanibû. Ji ber ku di erebî de tîpên /g/ û /v/yê tunebûn navê xwe wekî Caban bi lêv kiribû; lêbelê bajar û nijada xwe ji bîr nekiribûn, digel navê xwe ew her du jî di Dîwana Pêxembertîyê ya li Medîneyê de tomar kiribûn. Ev serkeftineke bêhempa bû ku alaya navekî kurdî digel navê bajar û gelê kurd li dîwaneke ewqasî pîroz hatibû kişandin. Beriya Gavanê Kurd Bîlalê Hebeşî, Selmanê Farisî û Suheybê Romî jî navên xwe û hebûna gelên xwe li cem cenabê Pêxemberê Îslamê Mihemed eleyhiselam dabûn pênasekirin; hê di rojên destpêka belavbûna îslamê de bûbûn rêheval, têkoşîneke îmanî dabûn, di vê riyê de gelek êş û azar jî kişandibûn. Gavan dereng mabû, dibe ku dereng bi rê ketibû, dibe ku koledarên wî gelekî stemkar bûn û nehiştibû ku zûtir bigihêje mirazê xwe; lê çi dibe bila bibe, êdî ew jî rêheval bû û navê kurdekî bi wê xelegê ve girêdabû.

Rizgarîxwaziya Gavên ew heta Medîneyê anîbû, pêrgî gelek dijwariyan hatibû; lê di dawiyê de derbasî vî bajarê pîroz bûbû û beyata xwe pêşkêşî cenabê Mihemed eleyhiselam kiribû. Êdî mafê wî hebû ku helbesteke kurdî biavêje ser vê hevdtîne, vê qebûlbûnê û bibêje:

*Pesna bê hed ji bo Xwedayê alemîn  
Ew Xedayê daye me dîne mubîn*

*Em kirine umeta Xeyr'ul-Beşer  
Peyrewê wî pêşengê bîrewer*

*Ew Xwedayê xwedanê milkê giran  
Daye me pirtûka bi navê Quran*

*Dîn û nimet li ser me kir tamam  
Ango da me Ehmed û ev meqam*

*Navê me li dîwana wî tomar kir  
Înkara navê me her şermezar kir*

Gavên her tevgereke pêşveçûna îslamê dîtibû; lê nedixivî, ditirsiya ku tiştekî kêr bibêje yan jî li ser ve zêde bike. Ji ber ku wî bihiştibû cenabê Pêxember eleyhiselam gotiye: **“Kî bi zanatî li ser navê min derew biaxive, bila rûniştika xwe ya agirîn amade bike.”** Herwiha divê gotinên xwe bispertana zanyariyêke rast; ev ayînek bû, wehyek bû, nedişibihî siyaset û rêveberiya jiyaneke asayî.

Gavanê Kurd -Xwedê jê razî- li Dîwana Risaletê bêyî tirs û xem navê xwe bi kurdî gotibû; navê xwe neguherandibû ku kêfa ereban pê re were; heyama koletiyê jî li ser navê xwe bazar nekiribû, cih nedabû nîqaşê ku navê wî Gavan e.

Gavanê Kurd -Xwedê jê razî- li Dîwana Risaletê bêyî tirs û xem navê bajarê xwe jî wekî

Sard nîşan dabû; dabû zanîn ku çavkaniya hebûna wî ew der e, ew şûnwar aydî kurdan e, her çiqas ji aliyê hinekan ve hatibe dagirkirin jî ew erdnîgariya kurdan e, demografiya wê nayê guhertin.

Gavanê Kurd -Xwedê jê razî- li Dîwana Risaletê bêyî tirs û xem navê gelê xwe jî wekî kurd dabû tomarkirin; negotibû em û Selmanê Farisî, Bîlalê Hebeşî û Suheybê Rûmî heman gel in, negotibû em asyayî, ewropî, anatolyayî, efrîqayî, aryayî ne.

Gavanê Kurd -Xwedê jê razî- li Dîwana Risaletê bêyî tirs û xem hemû zanyariyên derbarê xwe de li ser navê xwe, li ser navê erdnîgariya xwe û li ser navê gelê xwe dabûne tomarkirin. Xwedê, milyaket û cenabê Pêxember eleyhiselam şahidên vê yekê ne, sehabe şahidên vê yekê ne, dîrok şahidê vê yekê ye.

Gavanê Kurd -Xwedê jê razî- li Dîwana Risaletê ketibû wê tirs û xemê ku rojekê nijada wî bibe bindest; ji her aliyê ve welatê wî rastî êrişê were. Lewre ev tedbîr girt ku gelê kurd hişyar be; heke rojekê hinek rabin, mafên kurdan binpê bikin, zimanê wan înkâr bikin, navên wan biguherînin bila li hemberî vê neheqiyê li ber xwe bidin. Hezar silav li ser ruhê te yê bilind ey rêhevalê cenabê Pêxember eleyhisselatu wesselam! Amîn!

Bi vê axaftinê Komeleya Gavanê Kurd hate vekirin; di bin tabelaya wê ya bi tirkî Caban El-Sardî (r.a.) Ilim, Arastirma ve Dayanişma Dernegi de xizmetên zanistî, lêkolînî û hevkarîyê hatin meşandin. Di vekirina komeleyê de çend hosta-karkerên kurd, sê feqî û Seyda Mela Hisênê Heskîfî beşdar bûbûn.

Seyda Mela Hisênê Heskîfî bi salan li medreseyên Kurdistanê xwendibû, di dawiyê de vegeyriyabû welatê xwe yê Heskîfê, mala bavê xwe ya li devê çemê Dicleyê vegeyrandibû medreseyekê û dersên erebî-kurdî didan; lêbelê biryara hikumeta tirk hebû ku Heskîf bê valakirin, li ser eraziye wê benda avê ya Ilisuyê were avakirin. Mela Hisên jî bi vê biryarê gelek cîrnexweş bûbû, bi neçarî mal-medreseya xwe terikandibû û berê xwe dabû bajarokê Salihliyê yê Manîsayê. Li wê derê çend pismamên wî hebûn ku ligel wan di karê avahîsaziyê de bixebitiya û debara xwe bikira.

Mela Hisên piştî ku li Salihliyê bi qasî sê-çar mehan xebitibû rastî hevaleyê xwe yê feqîtiyê hatibû ku ji zû ve ye li vî bajarokî bi cih bûbû. Seyda ligel hevalê xwe li qehweyekê rûniştibûn, çay vexwaribûn, serpehatiyên xwe ji hev re gotibûn.

Hevalê wî yê bi navê Bedir êdî hostayekî avahîsaziyê bû, karê boyaxê dikir û rewşa wî ya aborî baş bû; lê aliyê wî yê feqîtiyê hişk-ziwa bûbû, hema hema êdî mutale û muzakereya pirtûkên xwe nedikir. Lewre dema ku ligel Seyda Mela Hisên rûniştibû qe behsa ilm û xebatên ilmî nekiribû. Bedir pirsî:

-Seyda, li ba min jî kar heye; dikarî bi me re jî bixebitî û ez ê ji xelqê zêdetir heqdesta te bidim; lê hêvîdar im ku pêşniyareke min jî binirxîni.

-Fermo, guhê min li te ye?

-Wekî ku xêlek berê hate gotin, min xwendin hişk kiriye û êdî bûme hostayekî boyaxê. Bi Xwedê, ez vê xebatê bi ser ilm û xwendinê re nagirim. Were, em li vir ji te re komeleyekê ava bikin; zarokên me hînî xwendinê, mezheba me û zimanê me bike. Ez ê di nava hevalan de ji te re mehaneyekê kom bikim; ne bila ilmê te winda bibe ne jî zarokên me li vê biyanistanê.

-Welleh xweş xeber e, lê min ne bawer e, -got Mela Hisên û kenîya.-

Bedir xwest ku beşera Mela Hisênî xweş bike û hêviyekê bide ber dilê wî:

-Seyda, xebera xweş piştî baweriya xweş pêk tê. Ka jimareya telefona xwe bide min ku bila pêwendiya me qut nebe, divê êdî ez rabim û herime ser paleyan; lê ez ê êvarê li te vegerim.

Her du hevalên kevn li hev kir ku êvarê li cihekî hev bibînin, jimareyên telefonên hev girtin û her kesek çû ser karê xwe.

\*\*\*

Wê êvarê her du hevalan li taxa ku mala Bedir lê ye hev dîtin; Bedir Mela Hisên bire mal,

xwarinek xwarin û êpêcekî derbarê rojên bihurî de axivîn. Ber bi nivê şevê Mela Hisên destûr xwest ku rabe û here cihê ku lê dimîne. Bedir jî tu negot li malê bimîne; ji ber ku li bajarên rojavayî urf-edetên kurdan ên mêvandariyê hema hema têk çûne. Sedema wê jî xanûmanên teng û karê rojane yê kefteleftê ye; lê Bedir dîsa jî got:

-Seyda, tu xema wê yekê nexwe, tu dikarî bi min re jî bixebitî; lê bi rastî ez naxwazim ku bikevî nava boyaxê û dost-heval te wisa bibîn. Ji kerema xwe re vî pereyî jî xerc bike, heta ku min heval gihandin hev û karê te têkûz kir.

-Bedir can, mala te ava! Xwedê şûna wê bi hezarî tijî bike! Şîreta min li te, li vî bajarê biyanî hinekî baldar bibe. Ji ber ku em ji tiştêkî nebûyî-nedîtî tiştêkî din diafirîn; di rastiya de niyêta me cuda ye, komele tenê sîwanek e û gava ku armancên me derkevin holê dibe ku em rastî eziyetê werin.

-Seyda, şîreta te li ser çavên min, ji bîr neke ku her kes komeleyan vedike. Mesele ew e ku nekevî nava siyasetê û bi ilmê xwe re mijûl bî, -got û di dilê xwe de wiha fikirî "Pêşyan gotiye: 'Gotina melayan bike; lê kirinên wan neke'. Ez ê fikra xebatê bidime we; lê rêvebiriya komeleyê aydî we ye. Ez ê di tevgera xwe ya hundirîn de Ristemê Zal bim, wisan xuya bikim bi gavekî bi pêş ve çûme; lê dizîka gaveke din jî biavêjim. Bila her kes wisa bizanibe ku ez bi mijarekê re eleqedar im; lê ez ê girîngiya xwe bidim ser armancên xwe. Va ye mela behsa tirsê dike: wisan e divê heta ku ji deryayê derbas bibim çavên xwe ji esmên raneqetînim û li ber çavan bigirim; lê niyêtên xwe veşêrim. Bide xatirê Xwedê, îcar niyêt û armancên min çi ne?"-

-De Xwedê tev kar û barê te be, xîretkêş dost û yarên te bin, -got û ji malê veqetiya-.

Dema ku Mela Hisên di riya xwe de dimeşîya telefonê jê re hat û nihêrî ku jina wî lê digere; bala xwe da saetê ku yanzdeh e û bi lezgînî vekir:

-Kerem bike jinik, te xêr e; tu van saetan li min nagerî. Çima hişyar mayî?

-Welleh, Zelal ketiye kincan, hinekî sancûya wê heye û digirî. Ez jî pê re hişyar mam û ji bêhtengiyê li te geriyam.

-De Xwedê şifayê bidê, tiştêk ji destê min nayê, -got û derbarê karên malê, zarokan û pismaman de hinekî axivî ku hema hema ghiştibû cihê mayîna xwe. Lewre xatir ji jinikê xwest, telefon girt, kete hundirê avahiyê, nimêja şevê kir û kete xewê ku sibehê digel hevalan rabe xebatê.

\*\*\*

Piştî ku Mela Hisên ji malê veqetiya Bedir kete tatêla sozên xwe û rewşa hevalê xwe yê medreseyê; hizra xwe ya hundirîn dîsa tevda: "bide xatirê Xwedê, îcar niyêt û armancên min çi ne?" Bedir hedîsa niyêtê ya navdar anî bîra xwe ku dibêje "karpêk li gorî niyêtan in" û rabû digel nimêja şevê du rikat nimêja destpêkirina karê xêrê kir. Ev awayê 'nimêja du rikati' usûleke alimên berê bûye ku gava biryara xêrekê dane, hertim du rikat nimêj kirine û ji Xwedê alîkarî û serkeftin xwestine. Wî jî di niyêta xwe de dua kir ku Xwedê wî nede şermê ku bikaribe alîkariya hevalê xwe yî alim bike û li pêşberî wî şermezar nebe. Axaftinên xwe yê digel Mela Hisênî di ber hişê xwe re derbas kirin: qala hevaltiya xwe ya berê, hevalên xwendinê û seydayan kiribûn; hinekî jî mijara binavkirina Heskîfê û encamên wê vekolabûn. Bedirî jî mijara binavkirina Heskîfê dest bi nixandinê kiribû: bajarê kevnare yê kurdan bi neheqî û dekbazî ji holê dihate rakirin; binaşeyên dîroka gelekî dihate binevatkirin, welatek dihate çolkirin, gelek malbat ji şunwarên wan dihatin koçberkirin. Bedirê ku ji zû ve kar û barên xwendinê, ramanên siyasî bi dûr ketibû bi vê mijarê ve dîsa hişyar bûbû. Helbet awayê şîrovekirina Mela Hisênî jî gelekî bandor li vê nêrîna wî kiribû. Hinekî li internetê nihêrî, bertekên herêmî û navneteweyî sist dîtin û ji xwe re got: "Ev mijar ji serê min mezintir e; serê ku neêşe divê meriv bendan nedê. Bajarek bajartî, welatek bi miletkî û cîhanek bi tevahî berpirsiyarê vê sitemkariyê ye; qulpa cîhanê qetiyabe ez belengazê ku bi olama xelqê zikê xwe têr dikim çi dikarim bikim? A baş ez tenê di çarçoveyê de destê hevlekî xwe bigirim ku wî jî gelek caran alîkarî daye min."

Bedir hevalên heyama xwendinê Celîlê Xano û Feqî Şafî; seydayê xwe Mela Eysayê

Perwazî anîne bîra xwe; ji nişkê ve her sê feqîhên Mela Hisênî yên êlihî Mihikê Çerxê, Erebi Elî û Hesikê Besê ber hişê xwe re derbas kirin. Metînê Çerxê tevî mafyayeke mezin bûbû, hevalên xwe yên berê diqehirandin; lewre Erebi Elî jî ketibû nava refên mafyayeke sosyete yê ku xwe biparêze. Erebi Elî çend caran êriş biribû ser serekê mafyaya Mihikê Çerxê; lê tiştê pê nekiribû, êdî ditirsiya û xwe li kuncan vedişart. Piştî van hewldanên bêfayde Mihik bi serbestî digeriya û Hesik kiribû şewirmendê xwe. Sê mirovên xwendî ji bo parî nanê heram ketibûne qirika hev; navê ilm û aliman xera kiribû. Bedirî axek kişand, Celîlê Xano û Feqî Şafîî di xeyalên xwe de gerandin. Feqî Şafîiyê ku demekê jê re digot “di bin alaya van partî-rêxistinên kurdan de xebat heram e” xwe sipasrtibû şebekeyeke dizan, ji bo karên qirêj gundiyeke xwe jî biribû cem xwe û pereyê baş dabû hev. Celîlê Xano jî ne di rewşeke baş de bû: ketibû nava cemaetekê, ji rêxistinên ereban re meriv peyde dikirin, xêr-guneh li stûyên gotiyan li pey jinên bî û mêrkirî digeriya. Di nav wan bîranînan de wêneyê herî birûmet aydî Mela Eysayê Perwazî bû. Perwazî seydayekî xelatî bû, ji aliyê gel ve dihate hezkirin û carinan digot “du cure mela hene: Qurana dardakirî û Qurana şipê; ya Rebî tu min bikî numûneya Quranê şipê!” Bedir di nava van xem-xeyalan de ji xew re çûbû û ji mijara hevaltiya wî û Mela Hisên re derfet nedîtibû.

Bi berbangê re Bedir şiyar bû, niçande jinê, ew jî rakir û her duyan nimêja berbangê kir. Dema ku jinê taştê amade dikir, wî çav li nûçeyên şeva çûyî û destpêka rojê gerandin. Li ser taştîyê bi jinê re hinekî qala axaftinên xwe û Mela Hisênî kir, duaya serkeftinê jê xwest û derkete derve. Li otobusekê siwar bû, rast berê xwe da avahiya ku karê boyaxa wê dikir. Wekî her dem beriya hoste-karkeran derkete avahiyê; karê qediyayî tesele kir, plana karê wê rojê danî û li benda ekîba xwe sekinî. Ji heştan re bîst deqe mabûn ku karker hêdî hêdî kom bûn; derbasî odeyekê bûn, kincên xwe yên xebatê li xwe kirin û li gorî plana rojê dest bi kar kirin.

Saet dehan hoste-karkeran navbereke çayê da û bîstekê bêhna xwe stand. Bedirî ev bêhnvedan vegerande derfeteke gotebêjê û wiha dest pê kir:

-Hevalino, bi texmîna min mixên çarçoveya dinyayê jê kişiyane; duh min hevaleyê xwe yê feqîtiyê dît ku li vê derê paletiyê dike.

Pismamekî wî jê pirsî:

-Qe dilê te neçizirî, te xerciyek jî nedayê pismam? Welleh, mela mîna keviran li cihê xwe giran in; gava leqiyên êdî bi kêrî pênc pereyan nayên.

Bedir him bersiv da û niçande wî him jî fitikek li binê hişê wî xist:

-Helbet min hevaltiya xwe kir, bir malê, zikê wî têr kir, xerciyek jî dayê. Îcar min got dibe ku “cinê xêrê” li we jî bixe û hûn jî dest biavêjin bêrîka xwe.

Pismamî bê şik û rawestan pêşniyar pejiwand:

-Hay hay, li ser çavên min; lêbelê ev ne dû-derman e. Divê çareyeke mayinde bê dîtin; gava hêlîna alimekî dîne Xwedê xera bibe û kesek qirşekî dirêj nekê dibe ku kevir bi ser me de bibarin.

Bedir bi vê hesta pismamê xwe şa bû û tê gihişt ku li ba hinek merivên ji rêzê şopên baweriyê yên xurt hene; lê divê tenê ji bo karên qenc bînan bikaranînin, neyên lewitandin, hêviyên wan neyên şikandin. Di vê navberê de hosteyekî cizîrî ku teze ketibû ekîbê qurtek li çaya xwe xist, bêhnefîşkek da cixareyê û pirsî:

-Kekê Bedir, te behsa hevalê xwe yê medrese yê kir. Îcar tu çima nebûyî mela?

Bedir wekî ku kêrek li birîna wî bikeve, devê birînê biaxivîne, pêşiyê kêmeke kirêt jê bikişê, paşê xwîneke sor jê were û jana wî rehet bibe bersiv da:

-Ka kalikê te yê Mela Ehmedê Cizîriyî nehişt, mala wî ava be!

Hosteyî kalikên xwe anîn bîra, di nava wan de ne mela dîtin ne jî kesekî bi navê Ehmed, tê gihişt ku Bedir qala Mela Ehmedê Cizîrî yê navdar dike ku bi dîwana xwe navdar e; lewre gelek mereq kir bê ka vê dîwanê çawa bandor lê kiriye ku dev ji xwendinê berdabe:

-Dibêjin ku ew kalikê min evîndar bûye û keçik xwestiye; lê nedanê. Îcar wî ji eşqa xwe helbest gotine, paşê bavê keçikê razî bûye û gazî kiriye ku were; lê êdî wî qebûl nekiriye û nezewiciye. A ku dizanim tu zewicî yî; va ye te jê re muxalefet kiriye.

Bedir nexwest ev mijara zewacê dirêj bibe, bi kurtî şrove kir û derbasî hişkkirina ilmê xwe

bû:

-Min li Xelatê li ber destê Mela Eysayê Perwazî dixwend ku hevalekî dîwaneke Cizîriyî diyarî min kir. Dema ku gihiştim dawîya dîwanê min nihêrî ku gotebêjeke wî ya digel Feqiyê Teyran heye û min dîwaneke wî jî peyda kir. Piştî ku min ev dîwan jî qedand ez bûme aşîqê keçeke Miksê, min keçik revand; lê zêde nekişand, ez dîsa zewicîm û min ew jî berda. Îcar meseleya melatîyê jî wiha ye: Dibêjin alimekî navdar pirtûkeke li ser aboriyê dinivîse û jê dipirsin bê ka çima derbarê tefsîra Quranê yan jî şerîetê de nenivîsiye. Alim dibêje xwediyê pirsê “qirika ku hînî pariyê helal nebûye dê bi tefsîrê çî bike?” Îcar piştî wê zewaca bêencam û zewaca diduyan êdî min biryar da û divê min karekî wisa bikira ku têkiliya min bi malê haram re tunebe; lewre min ji paletiyê dest pê kir û gihiştim hostetiyê. Ji Xwedê re şukir ku ne poşman im; ji xwe tehma melatîyê jî nemaye, êdî dikevin ezmûnan, qezenc dikin, tayîna wan derdikeve û pereyekî şikber dixwin.

Hosteyê cizîrî ji gotina “êdî dikevin ezmûnan, qezenc dikin, tayîna wan derdikeve û pereyekî şikber dixwin” fêhm nekir û bi pirseke din Bedir da axaftinê:

-Çilo? Tu dibêjî bila mela nekevin ezmûnan, nebin karmend û pereyên dewletê nexwin?

-Belê, bi kin û kurt hema wisa dibêjim. Dewlet kaxezeke derewan dide destên wan û dibêje 'de bixwînin'. Devê ku hînî viran û qûna ku hînî tiran dibe eynî tişt e.

-Îcar zarokên me dê ji kê dîn û mezhebê hîn bibin? Evên teze derketine hê nizanin qûna xwe bişon û fetwayekê bidin.

-Li gorî qanûnê êdî qûnşuştin pêwîst nake; wextê bangê bang bide, wextê nimêjê pêşnimêjiyê bike, li mizgeftê miqate be ku diz nekevinê, deriyan berk bigire, ji xebera muxtêr dernekeve bes e, -got û kenîya-

Bedirî li saeta xwe nihêrî, rabû ser piyan û got:

-Îro ewqas galegal bes e, de rabin ser karê xwe; qurbana destên we xebateke baş derxin da ku ji pîşeyê me re bibe awêne û em nanekî jê bixwin. Ji we re quwet be!

Bedir piştî şandina hoste û karkeran, di hişê xwe de dîsa zivirî ser mijara Mela Hisên û ji xwe re got: “Bi kulîlkekê bihar nayê. Bi xerciya min û çend qurîşên hevalan tiştêk naçe sêrî.” Wî dizanibû ku destpêka her karî dijwar e; lê bi bawerî, karzanî û dorhêleke baş mirov dikare kesekî rast bide ser tevgerê qenciyê. Ji xwe êvarê niyeta xwe anîbû ku tevgerê qenciyê bide meşandin, merivê xwe yê durist û pişpor bike serkarê wê; lê du kêmasî hebûn: gelo ev bajar munasibî vî karî bû, gelo ev kar dê serê xwe bigirta û bimeşiya?

Heta paleberdanê Bedir li ser karê xwe sekinî; ha ev der nebûye, ha ev der baş bûye; tu vî karî bike, tu vî karî neke; heta berêvarê xebitî û çerçirî. Dema ku ji avahiyê veqetîya, hema li rawestgeha otobusê ya nêzîk nesekînî; xêleke xurt di kêleka riyê de meşiya û di hişê xwe de li “xala destpêkê” gerîya. Paşê li otobusê siwar bû, berê xwe da malê, şilimziwa avek bi ser xwe de kir, şîva xwe xwar û çû qehwexaneyê karkeran.

Dema ku Bedir gihiştê derê qehwexaneyê piştî merivekî nas dît; lê bawer nekir ku ew be, kete hundir, heta nîvekê çû, li pişt xwe nihêrî ku bûrayê wî yê Hecî Hemîd li bin simbêlan ve pê dikene. Hecî Hemîd bûrayê wî yê mezin û nixuriyê bavê xwe bû ku bi salan e li Îzmîrê dijiya û ji bilî şîn-şahiyan nediçû Wanê. Di ciwaniya xwe de çendekê medrese xwendibû, heta Nehc'ul-Enamê hatibû, paşê dibistana amadehiyê qedandibû û dev ji xwendin-perwerdehiya kurdî berdabû. Hecî Hemîd bi xatirê matematîknasiya xwe Zanîngeha Enqereyê qezenc kiribû, piştî salekê diduyan ketibû nava qumarbazan, hinekî navdar û zengîn bûbû, xwendina zanîngehê jî terikandibû, di dawiyê de qumarbazekî laz li ser qumarê kêr kiribû û reviyabû Qibrisê. Li Qibrisê êpêcek pere dabûn hev, li wê derê bi keçeke tirk re zewicîbû, piştî salan doza wî ji dosyayan ketibû; lewre ew jî veqeriyabû welêt û li Îzmîrê bi cih bûbû. Her çiqas merivekî peredar bû jî gelekî çikûs û çiriz bû; ev exlaqê xwe ji jina xwe ya bi navê Sevim hildabû ku eqrebayên wî jê re digotin “Kinê” û “Sevimsiz” ango cirmexweş.

Bûra û zavayî xwe avêtin hembêzên hev, gelekî kêfxweş bûn û kêf-halên hev pirsîn. Bedir hinekî dilê xwe kiribû ku bûrayê wî rasterast nehatiye malê û hatiye qehwexaneyê; lê bersiva wî amade bû:

-Zava, min got “pêşiyê kar û paşê bar”; ez li te digeriyam ku mijareke girîng bi te bişêwirim.

-Erê, tu me barê pišta xwe dihesibînî; loma te em kirine tiliya qilîçê ya li ser qulika dawîn a zirneyê.

-Na, heyran ne wisan e. Tu dizanî ez hingî ku çûme hec êdî min dev ji tiştinan berdaye û dixwazim hinek xêran bikim; lê riya wê nizanîm û di ber siya hin camêran de li rê-rêbazekê digirim.

-Heke dilê te 'xêra bi pereyekî helal' hebe te merivê xwe dîtiye; lê heke pereyê heram be vê babetê bigire, qe veneke û rabe em herine malê.

-Na, welleh pereyekî helal e. Îcar tu dê bibêjî gelo qira guran hatiye ku ez xêran belav dikim ne wisan?

-Ê welleh çi bibêjim? Va ye te got û çû.

-Min Hecî Kinê aniye îmanê û ez ji şukra Xwedê re zehf destbelaş bûme.

-Çawa, min fêm nekîr? Ma hûn her du bi tevayî neçûbûne hec? Îcar meseleya îmanê çi ye?

-Min hêwiyeke kurmanc daye ser sêrî û felek nikare pišta min dayne erdê.

-Ez mehtel mam. Sevîm Xanimê ji zimanê me û eqrebayên me hez nedikir; îcar çawa bû ku hêwiyeke kurd qebûl kir?

-Tu dizanî min êpêcek pere ji Qibrîsê anîn û li vir jî xebitîm. Piştî ku çûme hec min keda helal xwar û ew keda heram di riya qenc de xerc kir.

-Peh, xêr bi pereyên heram?

-Welleh ez jî wisan fikirîm; lê paşê hişê min ê matematîkî ji min re got ku vî pereyî ji bo doza kurmancan xerc bike û min wisan kir.

-De ez nikarim bibêjim Xwedê qebûl bike; lê hêvîdar im ku bi kêrî tişteki hatibe, qe nebe mirar ji birçiyarî re helal e, -got û kenîya.-

-Ka tu nahêlî ez gotina xwe bikemilînim.

-Fermo, guhê min li te ye!

-Îcar min vê dawiyê biryar dabû ku di lîsteya kurdan de bibim parlamenter; lê Hecî Kinê xwe da erdê, sond xwar ku qaşo ez tevî lîsteya kafiran bim divê ez wê berdim. Min got ku kafir-mafir tunene, ev siyaset e û ez jî kurd im; di nava kurdan de navdar im û ez ê xizmetekê bikim; lê wê zarok jî hildane aliyê xwe û got ku tişteki wisa bibe nikaha me dikeve. Îcar min di hişê xwe de heyfek gerand ku çawa dêla wê tefşo bikim û ghiştîm wê biryarê ku dîsa bizewicim, rûpeleke din ji xwe re vekim. Helbet êdî ez nesekinîm, navkutî bûm û min jê re got ku ez di îmana wê de ketime şikê, ew kesên ku baweriya wê bi wan heye jinfiroş in, ji baca kexxane-meyxaneyan zikê mela-muftiyan têr dikin, ji kafiran newêrin û tenê zar-zêçên misilmanan dikujin... filan û bêvan. Herwiha min got ku jin hukmê şerîetê qebûl nakin ku jinebî bi mêrên wan re bizewicin an jî mêrên wan ên ciwan jineke din li xwe mehr bike, lewre ew kafir in. Wê got û min got, di dawiyê de min da zanîne ku ez ê bizewicim; pêşiyê li esmanan ket, firiya û paşê qebûl kir û mîna qijikan li ser çiqilekî venişt. Îcar tu dizanî çima qebûl kir?

Bedir bi hejandina milên xwe bersiv da ku “na” û Hecî Hemîdî berdewam kir:

-Ji ber ku nikaha wê ya fermî li ser min e, zarokên jina duyem bi hukmê qanûna romê ewladê zinayê ne û seba wê qehra beşdariya siyaseta kurd û alîkariya wan a fermî nedihate kişandin; lê qehra hêwiyeke di hate kişandin. Îcar min sond xwariye, ez ê hemû serweta xwe di riya kurmênc de xerc bikim û paşê bimirim Xwedê hez bike.

-Ewqasî jî na loo, ma zarokên te ne kurmanc in ku tişteki ji wan re nahêlî?

-Bi dev kurmanc in û bi hiş romî ne; ji xwe kurmancî nizanin û tenê dibêjin bavê me kurmanc e û diya me romî ye. El-însaf lo, ez ê bi qasî ku pê îdareya xwe bikin tiştinan bihêlim!

-Îcar ew meseleyeke malbatî ye, êdî tu dizanî. Em werin ser mijara xêrê: heke pereyekî helal be deriyekî vekirî heye. De rabe, em herine malê; bila dilê xwişka te jî xweş bibe. Belengazê bi salan e birayê xwe yê cînar, birayê xwe yê ewqasî nêzîk nedîtiye.

-Rast e lo, Zehra çawan e? Hê ji min re dibêje Hecî Pehno?

Bedir bersiv neda pirsê wî û heta ku ghiştîne malê mijara Mela Hisênî kurteve kir. Dema ku

Zehrayê kekê xwe li pêşberî xwe dît ji kêfan û şaşbûnan tehisî, sergêjî bû, qerepere hatine ber çavan û dikir ku bikeve erdê; lê xwe bi dîwêr girt û Hecî Hemîd hembêz kir, êpecekî paştû-gerdena wî bêhn kir. Bedirî êdî dengê xwe birî, çavek li bûrayî û yek li jinê guhdariya wan kir. Ji xwe re got: “Belayê neyê neyê, heke tu hatî jî li ser seran û her du çavan re bêyî! Niha bi vî Hecî Pehnoyî bawer bikim gelo yan na? Gelo êgir girtiye mala vî derewînê û kesî jê bawer nekiriye; loma hatiye cem min? Ji xwe seba wî barek dirav û barek derew heman tişt in. Dibêjin beş hatiye ser maldaran; lê wan avêtiye ser feqîr û jaran. De ka em ê bibînin.”

Bedirî xwişk û bira li hêwanê hiştin, derkete balkonê ku hewayekê hilde û piçekê hênik bibe. Li balkonê rûniştibû ku hişê wî ber bi jinbûrayê wî Sevîmê ve çû: “Hela li îşê Xwedê binêre, axa kendalan a bêkê îro çawa bûye tazehiya malan? Hecî Pehno keçên kurdan avêtin kendalan, da pey keç, nizanim jineke biyanî; wê bûkê bi salan neyartiya kurdan kir, îro ji bo ku mêrê wê yê kurd bi sermayeya xwe nebe alîkarê miletê xwe wekî Kleopatrayê maran berdide canê xwe. Ez bim jin serbilaçikan li hinda xwe qebûl nakin. Îcar ji bo ku kurd bi rêxistin û destxurt nebin çî têkoşînê dide ev Sevîmsiz Xanim, hey gidiano.” Paşê pêkenokeke wekîlekî kurd anî bîra xwe; li gorî salixdarekî, -xêr-guneh li stûyê wî be- wekîlekî kurdnijad ku bi ser partiyeke romîyan hatiye hilibijartin dostikeke romî ji xwe re dîtiye, her cara ku çûye cem pere danê û rojeke hilibijartinekê ev wekîlekî kurdnijad ji dostika xwe ya romî re dibeje “tu dengê xwe bidî partiya kurddarê ez ê ewqas ewqas pereyan bidime te”, dostik lê vedigere û dibêjê “ez qûna xwe difroşim, lê xwîna xwe nafroşim”. Bi vê pêkenokê re di ber xwe de kenîya û vegehiya cem jinê û bûrayî.

Bedirî wê şevê li malê qala Mela Hisênî nekir û sibetirê dema ku ji malê veqetiyar dîsa vegehiya mijarê û got:

-Hecî, tu heta kengê li vir dikarî bimînî?

-Welleh, heke berêvarê vegehim baştir e, de tu dizanî êdî mêrê du jinan im, dûrketin bi berdêleke biha ye; îro min destûr ji ya kurd wergirtiye û roja wê birriye, îşev nîvê şevê be jî divê li cem Hecî Kinê bim. Nexwe astenga mezin li derê mala mirovî ye.

-De wisan e ez ê temeyê bidim hoste-karkeran ku îro naçime ser kar, bila ew ji xwe re bixebitin û ez ê hinekî te bigerînim; ew mijara xêrê jî divê bê zelalkirin.

Bedirî pêşiyê telefonî ekîba xwe kir ku bila şuxulî bidomînin, ew ê jî mêvanê xwe yê şermê bigerîne; paşê derbasî serê taxê bû û erebeya xwe ji parkê hilda. Di hişê wî de hebû ku mêvanê xwe bibe bajarê Sardîsê yê kevnare; heta nîvro wî li şûnwarên dîrokî bigerîne, di vê navberê de mijarê jî jê re baş şrove bike, wî bide serwestkirin.

Bedir û Hecî Hemîd li erebeyê siwar bûn û riya Sardîsê girtin. Xêleke xurt erebe xijikî-çû; lê her du jî bêdeng man: Wisa xuya dikir ku her du jî di goşeyê hişê xwe de mijûl bûn; bi mijareke wisa de ketibûn ku her yekî nedixwest kesek wî aciz bike. Bedir dîsa bi niyê û armancên Hecî Hemîdî yê kone re mijûl bû: “Ev mêvanê bêwext dixwaze firsêdê ji Kinê bistîne û rûpeleke nû bi jina nû re veke, bi rastî li gorî xwe dixwaze dora Bekoyî bipêçe û Memê Alan rizgar bike; lewre diviyabû êrişî hesp û erebeya wê bike.” Lewre şik ketibû dilê Bedirî, mîna pezeke kurmî hişê xwe ji kerban gez dikir, hewl dida xûlexûla kurmên hundir bide rawestandî: “Gelo dijminekî Hecî Pehno heye û dixwaze bi kêreke deynkirî wî dijminê xwe ji holê rake, gelo quweta wî nedigihîste jina romî û bi hêza jina kurd êriş dibire ser wê, gelo ji bo ku hevrika xwe biwestîne û bibehecîne bêhn vedida û radiwestiya, gelo bi sebr û aramiyeke fireh dikete rewşa amadebaşiyê ji bo ku êrişî dijmina xwe ya westiyayî bikira? Gelo çima pêwistî bi vê sextekariyê didît, çima rojhilat nîşan dida û êriş dibire ser rojavayê, çima li rastê dinêrî û êriş dibire ser çepê? Gelo divê li hemberî Hecî Pehno çî bikira ku nekeve dafika wî ya qumarbazane?” Bedir di dawiyê de biryar da ku bajarê agirdadayî yê malbata bûrayê xwe li aliyê din ê çem temaşe bike. Heke Hecî Pehnoyî kemînek li pêşiya wî danîbe jî divê wisa bike ku dijminên wî têkevin qirika hev, hev şerpeze bikin; ew jî raweste, bivêsihe û raçav bike; paşê jî bizivire ser sizakirina dijminan û êrişê bibe ser yê herî westiyayî, wî binevat bike.”

Di riya ber bi Sardîsê de Bedir hewl da ku Hecî Hemîdî qanî bike:

-Hecî, dibêjin merivek çûye cimaetekê û rûniştîye, nihêriye ku qe kesî negot “bi xêr hatî” û ev yek lê zor hatiye; dest avêtiye qutiya xwe ya titûnê û derxistiye, cixareyek pêçaye û qutî dirêjî



hevalê li teniştaya xwe kiriye ku ew jî bacikekê ji xwe re bipêçe. A wê hingê her kesê ku cixare pêçaye hal-xatirê wî pirsîye û gotiye: “Tu teze bi ser çavan re hatî”.

-Ez nizamim mijara xêrê çima ewqasî kêfa te aniye; lê fikirîm ku gava av di golan de dimîne, genî dibe. Îcar min biryar daye ku di vî temenê xwe de hinek şermezariyan ji ser xwe rakim. Li ser navrojê bîne bîra min ku ez ê çîroka “Heyfelan”î ji te re vebêjim; lê niha em dest bi mijara xwe ya sereke bikin.

Bedir êdî neçar ma ku ji xwe re bibêje “bila Xwedê yar be, bila ewqasî dinya neyar be” û xwe siparte Xwedê; lewre bi dilsaxî dest bi mijarê kir:

-Bûrayê hêja, tu teze bi ser çavan re hatî, bi Xwedê wekî ku min kurtasiya mijarê ji te re şîrove kir, ez dixwazim ji Mela Hisênî re medreseyekê vekim û wî ji paletiyê rizgar bikim. Min carekê ji paletiyê avahîsaziyê dest pê kir, êdî dest û pê li min nasekinin; min dinya daye ber xwe û boyax dikim. Îcar ditirsim ku ew jî mîna min be, ilmê xwe hişk bike û bi xebatê re alimek bimire, here. Lewre dibêjim heke em jê re komeleyekê ava bikin û wî bidine ser karê wê sazîyê, ew dikare him dersan bide him jî di pêvajoyê de ji xwe re aboriyeke serbixwe qezenc bike.

-Ramanekê baş e; lê cihê wê xebata zanistî ne ev der e. Divê li bajarekî kurdan be ku bi kêrî tiştêkê were.

-Bûra can, zarokên me dê çawa bin? Ew ê di nava jiyana biyanî de biyanî û axozî bibin; ne me nas bikin ne jî reh-rîşeyên me.

-Ew jî rast e; lê sazî ji bo tiştêkî mayinde tên avakirin. Tu bawer bike, heta çend mehan zarokên biyanî dorê nadin zarokên kurdan; dê zimanê xwe li ser zarokên kurdan ferz bikin. Lewre li şûna vekirina komeleyeke bi ser navê ilmê divê em komeleyeke li ser navê Wanê ava bikin, zarokên xwe bişînin wê derê; bila mezinan bibînin, axaftina kurdan bibihîzin û dersa xwe jî wergirin. Lêbelê ji bo vê mebestê ne seydayekî qedrgiran lê feqiyekî ji rêzê pêwîst e. Îcar ji bo Seyda Mela Hisênî divê medreseyek, mizgeftê û lojmanek li bajarekî kurdan bê avakirin; ev jî ne îşê rojekê ye û pêvajoyek e.

Hecî Hemîd wekî merivekî ku bi devekî ken xencerê didize diaxivî; ji ber ku wî bi salan hevaltiya qumarbazan kiribû, li ber destê wan dek û dolab gerandibûn, ligel mafyayên biçûk çek û pûsatên sivik girêdabûn, hertim bi kêf û ken bû. Lêbelê ev tevgera wî demkî bû, ji bo ku hevrikê wî sist bibe, dilrehet bibe, çeka xwe daye; di wê maweyê de Hecî Hemîd jî êrişê bibe ser aliyê hevrikê xwe yî herî lawaz, pê li birîna wî bike ku ruh jê bikişê. Lewre Bedir bêhnêkê bêdeng ma, bi destêkî dîreksiyon girt û bi yekî straneke kurdî vekir; êdî heta kevnebijêr neaxivîn.

Dema ku ghiştin Sardîsê Bedir erebe ajote ber Akropolîsê û dest bi axaftinê kir:

-Ev der navenda rêveberiya bajêr bûye; dibêjin berê paytextê Keyaniya Lîdyayê li vir bûye.

-Te bi zanatî em anîne vir an sedemeke din heye?

-Na, welleh hema min got em ji xwe re bigerin, hinekî biwestin û navrojêkê bixwin; paşê her kesekî me here ser karê xwe.

Hecî Hemîd heyama qumarbaziya hîn bûbû ku her derfeteke biçûk vegehe berjewendiyekê; lewre wekî dizê ku nava gundekî re derbas dibe û bizinekê diavêje terkiya xwe dest bi dîroka bajêr kir:

-Keyxusroyê Axameniyîyan Sîrozê Mezin di navbera salên 559-530î BZ de dewleteke parsan damezrandibû, êriş biribû ser Medyayê, tevahiya welêt zefî kiribû û bûbû cînarê Keyaniya Lîdyayê. Bajarekî Sîrdê, ango Sardîs xwedî hêzeke aborî û siyasî bû; lîdiyan beşa girîng a serweta xwe ji kanên zêr ên li peravên çemê Sîrdê bi dest dixistin ku romiyan jê re digot: Paktolos. Li gorî efsaneyeke yûnanî, keyê Frîgrayê Mîdas rastî lanetekê hatiye ku destê xwe dirêjî çî kiriye bûye zêr; lewre di vî çemî de xwe şuştîye ku ji lanetê rizgar bibe, lewre peravên vî çemî tijî kanên zêr in. Li Sardîsê perestgeha Artemîsê ya heyama yûnanî yê pêşîn jî heye; gelek heykelên çêkirî wekî xwedawend lê hatine bicihkirin. Li Sardîsê kevirê bi navê “kuvars” derdikeve ku heyamekê wekî kevirê giranbiha û gewheran hatiye bikaranîn, kirîn û firotin. Li vir hemameke bi qasî 23 mêtro çarçikî heye ku ji mermer hatiye avakirin. Li hewşa hemamê nivîseke bi tetqalên zêrîn hatiye nîgarkirin dibêje ku du jinên mîrzade ev avahî dane sêwirandin û jenandin.

Bedir ji agehiyan matmayî pirsî:

-Tu ji ku derê van tiştan dizanî ku cara yekem e têyî vê derê?

-Ne cara yekem e, lê ez demekê li xezîneyan jî geriyam.

-Te tiştekek dît balê?

-Min dîtibe jî ez ê nebêjim min dîtiye. Îcar serwerê Lîdyayê Key Kroêz wekî Qarûnê heyama xwe zengîn û şûm bûye; digel Sparta, Misir û Babiliyan pêwendî girêdabûne, hevalbendiyeke siyasî û leşkerî li dar xistibûye û ji bo rawestandina hêza Axameniyan sala 574an BZ êriş biribûye ser hêzên Sîrozî yên li Kapadokyayê. Li ser vê yekê Sîroz bi artêşeke giran berê xwe dabûye Lîdyayê û li qada Pteryayê cengeke xurt bi Kroêz re pêk anîbûye; lê encameke serkeftinê yan jî têkçûnê diyar nebûye. Di vî şerî de hevalbendên Kroêzî xwe ranegirtibûne, ji hêrsa Sîroz tirsiyabûne; ji ber ku alîkariya hevalbendan negihiştibûye artêşa Lîdyayê Key Kroêz vekişiyabûye paydext Sfardê. Wan heyaman zivistanê şer nedihate kirin, artêş nedihatîn meşandin û şerkar li benda biharê disekinîn; lê Sîroz wisa nekir, riya xwe domand, pêşiyê êriş bire ser Tîmbriyayê û paşê jî berê xwe da paytexta Lîdyayê, Sfardê. Sala 546an BZ Sîroz serkeftin bi dest xist, Kroêz reviya û şopa xwe winda kir. Bi vî awayî Keyaniya Lîdyayê kete destê Axameniyan. Sîroz rêz li ayîna gel girt, Lîdyayê wekî parêzgeheke welatê xwe hesiband û qeyûmê xwe yê bi navê “satrab” danî ser rêveberiya herêmê û vegeriya Pasargadê. Bi sedsalan Sfard di bin serweriya Axameniyan de ma; lêbelê beriya zayînê sala 334an Skenderê Mezin ê makedonî Sfard ji destê Axameniyan derxist û bajar bi ser Romayê ve girêda.

Bedir û Hecî Hemîdî gera xwe ya li Sardîsê qedandin, dîsa vegeriyan Salihliyê û firavînek xwarin. Piştî firavîne her duyan li hev kir ku Hecî Hemîd vegere malê, hineka din jî ligel Zehrayê rûne û paleberdanê were cem Bedirî ku hevdîtinekê bi Mela Hisênî re li dar bixînin. Hecî Hemîd him dixwest vî camêrî bibîne him jî wî bi hîndekarekî Zanîngeha Yalovayê re bide naskirin.

Bi paleberdanê re her sê camêr li qehwexaneyê karkeran hev dîtin, nasiya xwe dane hev û qala gera xwe ya îro kir. Hecî Hemîd dixwest alîkariyê bide dezgehekî wisa ku bi kêrî pêşveçûna civaka kurd were; jixwe armanca wî ya sereke jî ew bû ku saziyê kurdewer ava bibe, wekî aşekî cemawerî xizmeta gel bike. Wî dizanibû ku avakirina saziyê bi maliyet e; lê ji xwe re digot ku divê mirov dareke alûçê di riya dareke hirmiyê de xerc bike, ji bo qezenceke mezin divê mirov dest ji mesrefeke biçûk vekşîne ku ev jî cureyekî bazirganiya li ser hîmê qencyê ye.

Hecî Hemîd bi henekekê dest bi nîqaşkirina mebestên xwe kir:

-Seyda ez benî, îro Bedir ez birim kevnebjarê Sardîsê û gerandim; wî bi pêşniyareke qenc ez qanî kirim ku alîkariyê bidim avakirina medrese, mizgef û lojmanekê; lê divê em di serê sêrî de li ser çend babetan gotina xwe bikin yek.

Mela Hisên bi bihîstina peyva “Sardîs”ê re kete ramanekê kûr û hevokên din nebihîstin. Hecî Hemîd li bendê bû ku tiştekekî bibêje; bi qasî du-sê xulekan bêdeng ma û ji nişkê ve pirsî:

-Hecî, te got Sardîs û zanyariyên min serobino bûn; lewre ev çend deqe ne ku lalomalo bûme û nizanim çî bibêjim.

-Çima? Peyvê çî anî bîra te?

-Welleh, heta niha min digot qey sehabiyê navdar cenabê Gavanê Kurd ku ereb jê re dibêjin Caban es-Sardî El-Kurdî -Xwedê jê razî be- xelqê Sêrdê ye; loma ewqas ereb hatine û li wir bi cih bûne. Îcar tu qala Sardîsê dikî ku hişê min tev li hev bû.

-Ez jî nizanim gelo ev Sardîs ew Sard e yan na? Lê heta çend sal berê jî navê wê Sartmehmûd bûye; kevirê kuvarsê jê derdikeve ku di zimanê lîdî de navê wî bajarî Sfard bûye. Hinek li gorî agehiyên cihûyan dibêjin ku ev welatê cenabê Lût eleyhiselam bûye ku kurapê cenabê Brahîm eleyhiselam e. Îcar her du kurap jî kurd bin, wisa e demek ji deman ev erdnîgarî welatê kurdan bûye û xûya ye ku sînorê rojavayî yê welatê kurdan ev bajar bûye. Seyda, divê ev mijar di nava dîroka erebên pêşîn de baş bê vepincirandin, lêkolînkirin û rojanekirin. Jixwe mebesteke min jî ew e ku alimên wekî cenabê te bi çavekî kurdî dîroka mirovahiyê ya bi erebî ji nû ve binirxînin; bêtî ku ji çarçoveya zanistî derkevin seba berjewendiyên gelê kurd ji nû ve şîrove bikin. Îcar ev karekî paşê ye, niha were em mijara xwe zelal bikin.

Mela Hisên dixwest yekîneyekê ji cendekê mirî yê Caban es-Sardî El-Kurdî derxe, bi deynî giyan bide ber wî cendekî û ji kurdan re lehengekî pêşkêş bike. Lewre hewl da ku pêşniyara mirî bi awayekî din bide naskirin:

-Wisan e, teyrebazê Kurdistanê Gavanê Sardî xelqê Sfardê bûye ku ereban jê re Sard digot. Beriya Skender tevahiya Kurdistanê di destê Axemeniyan de bûye; lê beriya desthilatdariya Axemeniyan Keyaniya Lîdyayê welatekî serbixwe û gelekî zengîn bûye. Bi vegirtina Sfardê û beşeke Anatolyayê êdî Kurdistan bûye du parçe; bi vî awayî du serweriyên cuda li herêma desthilatdar bûne. Parçeyê rojhilatî di destê Sasaniyan û parçeyê rojavayî di destê Romiyan de maye. Paytexta Lîdyaya kurdan, bajarê Sfardê di bin serweriya Romiyan de dinaliya. Qeyserê Romiyan Heraklius textê xwe danîbû Qudsê û haya wî ji nalenala Sfardê tunebû. Bêheviyeke xurt li ser kurdan bi taybetî jî li ser Sfardê hatibû ferzkirin û gelê kurd li benda rizgariyekê bû. Xwedê dengê wan bihîst û cenabê Gavanê Kurd şande dîwana pêxemberê me eleyhiselam. Wî camêrê bimbarek cara pêşîn navê me li dîwaneke ewqasî payebilind kişand, em dane naskirin, em gelekî deyndarê wî ne.

Hecî Hemîd, ev ramana Melayî hêja dît; lê dixwest ku vî pilingî ji daristan û çiyayê parastî veqetîne, derxe şûnwarekî bêalî, hêza wî ya zanistî bide aliyekî û paşê pê re bazara xwe bike. Lêbelê Mela Hisên jî dixwest tirsê li vî marê pêşberî zanyariyên xwe bifirîne, çêreya li dorê bihejîne, xiştexîst bike ku xetereya gezkirinê ji xwe dûr bixîne, rewşê hinekî aloztir bike ku bi awayekî serkeftî armancên xwe yên sereke bide sepandin. Li gorî Mela Hisên kesên ku dijberiya zanyariyên wî dikirin dijmin bûn; lewre biryar da ku bila Hecî Hemîd bi rehetî ji xwe re here-were, hespê xwe bibezîne, bi serbestî tevbigere da ku giyanê berxwedan û êrişê lê peyda nebe.

Bedir nihêrî ku her yek ji mêvanên wî bi lîstikeke çyawaz govendê digêrîne; lewre pêwistî bi tîrkirina mijara sereke dît, ji bo nîşandana gewherekî giranbiha kevirekî bêqîmet avête pêşiya wan:

-Hecî Hemîd, tu dizanî me tiştê gelekî ferz ji bîr kiriye?

-Ew tiştê ewqasî ferz çi ye gelo?

-Dema em diçûne Sardîsê te got ku li ser firavînê meseleya “Heyfelan” bîne bîra min û me ji bîr kir. Dixwazî bi wê çîrokê hinekî asoya me veke ku em bi nêrîneke hevpar bifikirin; wiha her yekî me di newalekê de diçe û em hev nabînin. Ji kerema xwe re, me derxe besteke rast, me li bin darekê bide rûniştandin û zebeşekî sar bide ber me.

Pêşniyara zebeşî bi her du hevalên Bedirî xweş hat û her siyan biryar da ku derkevîne parkekê; ji xwe re zebeşekî bikirin û li bin darekê rûnin. Li parkeke bajêr her sê heval di bin darekê de vepeliyan ser zebeşê xwe. Hecî Hemîd bi kêra Mela Hisênî ya biçûk zebeş parçe kir, bi devê kêrê dendik jê dan alîyekî û dirêjî seyda kir; her wisa parçeyek da Bedirî û yek jî bi xwe hilda. Piştî gezek diduyan dest bi çîroka Heyfelan kir:

“Dibêjin ku ciwanekî bi navê Heyfelan hebûye ku hertim li bavê xwe asê bûye. Rojeke havînê dema ku pale zeviyê didirûn bav kurê xwe dişîne malê:

-Lawo here malê, ji diya xwe re dîkê sor ser jê bike, bila bipijîne û digel birinc û çeqilmasteke sar ji paleyan re bîne.

Kurik diçe malê ji diya xwe re dibêje ku bavê wî gotiye bila gayê çîl ser jê bikin û ji paleyan re qeliya wî bişînin. Dayîk bawer nake û gazî cînarane dike ku bibin şahidê wê bê ka kurê wê çi dibêje. Di dawiyê de ga tê serjêkirin, qelî ji paleyan re tê pehtin û lawik xwarinê digihîne bavê xwe. Bav devê qoşxaneyê vedike ku goştê sor e û jê dipirse bê ka çima goştê dîk nepijandine. Kurik dibêje ku diya wî xebera wî nekiriye û bi zora cînarane ga daye serjêkirin. Mêrik ji hêrsan xwarinê naxwe, dide ber paleyan û ji kurê xwe re dibêje:

-Kuro, li ser paleyan re bisekine; piştî xwarinê sistiyê neke û wan rake xebatê. Heta ku ez herim û dersekê bidim bela jê re hatiya diya te.

Pale vedipelin ber destexana qeliyê û birincê qerqas, çeqilmastê sar bi ser xwarinê de fir dîkin. Ji ber ku giştan gelekî xwariye teral dibin û di ber partan de vedilezin, radizên. Bav jî berê xwe dide malê û jinik li bendê ye ku a niha mêrê wê yê bihêrs vegere; lewre li ber dêrî kûrekûr dike,

digirî û şîna xwe dike bê ka çawa bersivê bide. Dema ku mêrê xwe ji dûr ve dibîne, gazî cînanan dike ku bibin navbeynkar û rastiya rewşê jê re rave bikin. Mêrê wê bi hêrs û dijûn digihêje malê ku sondesonda wî ye, diranên xwe diçirikîne bê ka çawa gayekî ji bo paleyan dide serjêkirin. Dema ku rastiya bûyerê hîn dibe, vê carê bi wê hêrs û sondesondê berê xwe dide zeviyê ku derseke ibretî bide kurê xwe yê bêxîret. Lê kurikî dizanibûye ku bavê wî ji xêrê re nayê û dibêje paleyên razayî:

-Gelî paleyan, rabin, bavê min hat. Bavê min beriya çûyîna xwe teme dabû min û min ji bîr kiribû ku temeya wî bibêjime we: Kî pêşiyê êgir berde partekê û xwe bigihîne bavê min ew dê heqê wî du qatî bide.

Paleyên ku teze ji xewê hişyarbûyî bi rev û bez êgir berdidine partan û ber bi bavê wî direvin. Dema ku xwe digihînin wî doza pereyên du qatî dikin mêrik hêrs dibe; lê êdî rik û kîn fayde nake. Di vê navberê de Heyfelan jî hespê li serê zeviyê tewilandî siwar dibe û direve. Dema ku ew direve bav li pey dikeve; lê pale wî digirin, dibêjinê ku pereyên wan bide û nahêlin here. Bi vî awayî ga tê serjêkirin, pale naxebitin û radizên, part tèn şewitandin. Bi ser de jî mêrik du qat pereyan dide paleyan, berê xwe dide malê û bi kokima jina xwe re şînekê datîne.

Heyfelanê me jî hespê xwe diajo, berê xwe dide bajarekî, li wê derê hespê xwe difroşe, dide çend zêran û zêrên xwe di paşila xwe de vedişêre. Çi bike çi neke, biryarê dide ku here û bibe şivan. Bi pirsan diçe gundekî, li axayê gund dibe mêvan û dibêjê ku karekî şivantî-paletiyê bide wî. Axa dibêjê ku ev dem ne dema şivantiyê ye ne jî dema paletiyê ye; êdî bender rakirine û tenê dikare bibe xulamê payîz û zivistanê, ji biharê re jî Xwedê mezin e û wê hingê gelek kar derdikevin. Heyfelan bi neçarî pêşniyarê dipejirîne û dest bi xulamtiyê dike.

Heta zivistanê Heyfelan ji karê xulamtiyê û olama xelqê poşman bûye; lê qirar di navbera wî û axayî de heye: kî ji sozê xwe poşman bibe heq dide muxatabê xwe ku zêlek goşt ji pišta wî vexe. Lewre nikare dengê xwe derxe; çi îtirazê bike axa jê re dibêje “ma tu poşman bûyî, were ez zêlek goşt ji pišta te hildim”. Li ser vê yekê Heyfelan neçar dimîne; dikeve dek û dolaban ku sûc têxe stûyê axayî û ji vexistina zêla goştê piştê rizgar bibe. Zivistanê xulamê acizbûyî baş li dewêr nanihêre û oreora dewêr digihêje guhên axayî. Axa jê re dibêje:

-Xulam, here nav dewêr? Ew çima wisa ji birçînan oreor dikin? Wisa giha, ka û cêh bide wan ku serên xwe ji ser afirana ranekin.

Heyfelan diçe, kayê berdide afirana û cêh bi ser de direşîne, yek bi yek serên dewêr jê dike, datîne hundirê afirana, gihayî dide ser û vedigere hêwana rûniştinê. Dema ku heta sibehê deng ji dewêr dernakeve, axa mereq dike bê ka çi bûye û diçe tewleyê. Dinêre ku bobelat hatiye serê dewêr, cendek li nava tewleyê ne û serî di nava ka û cêhê bi gihayî nixamtî de ne. Bi hêrs vedigere ku heyfa dewêr jê bistîne. Jê dipirse bê ka çima ewqas ziyana gihandiyê wî, divê pišta xwe veke ku axa zêlek goşt ji pišta wî hilde; lê bersiva wî amade ye:

-Axa xweş be! Cenabê te ji min re got ku “here nav dewêr, ew çima wisa ji birçînan oreor dikin? Wisa giha, ka û cêh bide wan ku serên xwe ji ser afirana ranekin”. Min jî gotina te bi cih anî, heke tu ji gotina xwe poşman bûyî divê ez zêleke goştê nerme ji pišta vexim.

Axa neçar dimîne ku bibêje:

-Na heyran, çima poşman bibim; îşê dinyayê ye, dibe. De ewqas goşt ji me re zêde ye, tu rabe û têkeve nava eqrebayên min, serê malan yek hêt goşt bidê û were. Her çi xwişk û birayên min in, li dêrî xe, hêt û pîlekê navçava wan de bide û vegere; bila bizanibin ku ez î çiqasî merd im.

Heyfelan radibe, goşt kelepîçe dike, ji bo her maleke eqrebayan yek hêt, ji bo cînanan hinek parsû, ji bo feqîran jî hûr-doran û ser-piyan vediqetîne. Pêşiyê parên feqîran, paşê parên cînanan, piştê parên eqrebayan û di dawiyê de jî parên xwişk-birayan belav dike; lêbelê dema ku diçe ber derê xwişk-birayên axayî pîleke çêlekekê an jî gayekî di navçava kesê derî vekirî de didê, heke kesek bi ser qêrîniyê de were hêtekê jî di navçava wî de didê û vedigere malê. Heta ku vedigere malê xebera mirin û seqetbûna xwişk-birayên axayî digihêje mala xwediyê. Axa jê dipirse bê ka çima wisa kiriye, ew dê zêlan ji pišta wî vexe; lê bersiva Heyfelanî dîsa amade ye:

-Axa xweş be! Cenabê te ji min re got ku “ewqas goşt ji me re zêde ye, divê ez rabim û têkevim nava eqrebayên te, serê malan yek hêt goşt bidim û werim. Her çi xwişk û birayên te ne, li

dêrî bixim, hêt û pîlekê navçava wan de bidim û vegerim; bila bizanibin ku tu yî çiqasî merd î". Min jî gotina te bi cih anî, heke tu jî gotina xwe poşman bûyî divê ez zêleke goştê nerme ji pişta vexim.

Axa dîsa neçar dimîne ku bibêje:

-Na heyran, çima poşman bibim; îşê dinyayê ye, dibe.

Şîna miriyan tê girtin û seqet tên dermankirin; lê kerba axayî neşkestiye û heta tiştêkî neyîne serê xulêm dilê wî rehet nabe. Biharê axa cotek ga dîstîne, maça cot dide destê Heyfelanî û dibêje:

-Bide dû tajiye, li ku sekinî wê derê cot bike.

Heyfelan cotê xwe deverûyî diavêje ser nîrê her du gayan û dide pey tajiye. Tajî diçe, diçe û li ser tehtêkî dikeve. Heyfelan dinêre ku kar î dijwar e; selekî kevîran hildide, di navçava tajiye de didê û sêrî dipelixîne, paşê jî cot hildide li wî tehtî û li vî tehtî dide, darik-berikê wî dişkîne, nîrê gayan vedike û wan berdide çolê ku biçêrin. Axa nîvro xwarinekê dide amadekirin, dide destê keça xwe û dibêje:

-Here cem xulêm, jê re silava min bibêje ku min gotiye: serê nêr ker neke, derê dîzê veneke û bixwe, şerm neke.

Dema keçik digihêje hinda xulêm dinêre ku tajî hatiye kuştin, cot hatiye şkandin û xulêm nîr vekiriye, ji sibehê de tu tişt nekiriye. Keçik dipirse bê ka çima wisa kiriye, bersiva wî amade ye:

-Tajî li ser têht veket û ranebû ku ez cot bikim; lewre min selek di serê wî de dayê wê de kir, paşê min dest bi cot kir û cotê min di têht de şikiya, ez neçar mam ku nîr vekim û gayan berdime çolê ku biçêrin. Ma ez ewqasî bêwijdan im ku van ajalên bê zar û ziman birçî bihêlim.

Keçik torbikê xwarinê dide pêşiyê û temeya bavê xwe jê re dibêje. Heyfelan radibe nîveka nêr dibire û sêrî ker nake, binê dîzê dişkîne û dêrî venake. Piştî xwarinê ji keçikê dipirse bê ka kesek bûye şahidê gotina wî, keçik dibêje ku 'belê li pêşberî dîwana mêran' wisa got. Heyfelan vê gotina wî mehrbirînekê qebûl dike, bi keçikê jî ba dikeve û dibêje:

-Here ji bavê xwe re silava min bibêje ku min çî çawa kiriye. Bila dilê xwe neke, tajiye zimanê min fêr nekîr û min berdayê, cotî bi têht nikaribû û şkest, min serê nêr ker nekîr, devê dîzê venekîr, bi şahidiya ewqas mêran te keça xwe şande cem min û min jî xwar, şerm nekîr. Heke emrekî wî yê din hebe bila banzde ser hespê xwe û heta vê derê were, heke emrekî tunebe jî ji xwe ez ê êvarê vegerim malê.

Keçik vedigere malê, bûyerê serdanpê ji bavê xwe yê axa re vedibêje. Axa êdî biryarekê dide ku riyek tenê li pêşiya wî heye: divê xulêm bikuje û bireve yan jî têkeve kemîneke xulêm û xwe bide kuştin. Dibêje jina xwe:

-Pitê rabe, hinek kulîçe-kadayan amade bike û qeliyekê bipêje, ez ê jî hinek tivdîrên rêwîtiyê bigirim; em ê îşev vê malê bihêlin û birevin.

Jina wî meriveke bi merhemet bûye; lewre lavahiyan dike û dibêje:

-Êdî keça me jina vî xulamî ye, dê niha hemle jî bimîne, em nikarin keçeke ducanî ya bêmêr bi xwe re bigerînin, guneh e; bila zarokê wê bêbav mezin nebe.

Axa bi hêrs dibêje:

-Min zehf ji wî re sond xwariye, hema tu xebera min nekî ez ê a niha rabim û wî bidim ber kêran. Ez dibêjim bila xwîna wî berazî destên min nelewîfîne, em ê ji bo keçikê jî bibêjin ku mêrê wê çendekî piştî dawetê miriye. Lewre divê em îşev devê wî girêdin, torbeyekî têxin serê wî û biavêjine çemekî, a wisa herin.

Dema Heyfelan tê malê, dinêre amadehiyeke ecêb di malê de heye, dikeve şikê û wê şevê xwe li şênîyên malê ditelîne; dibihîze ku di navbera hev de dibêjin 'gava xulam baş têkeve xewê û razê ew dê torbe têxin serê wî, devê wî girêdin û li ser pireyê biavêjin çêm'. Nîvê şevê xulam radibe, bi pîneyekî devê axayî digire, wî dixê torbe, hişkehişk girêdide, li kêleka jinikê radizê û di guhê wê de dibêje:

-Min ew girêdaye, îşê tamam e, em ê îşev berî berbangê bi rê kevin.

Berî berbangê hê ku şereş e û kes kesî nas nake, Heyfelan diniçîne keçik û diyê ku barê xwe hildin û herin. Dema ku digihêjine pireya nava gund alîkariya hev dikin, axayî diavêjin çêm û diçin. Gava sibe ron dibe, keçik û dê dinêrin ku xulam î sax e, axa bi ro de çûye, digirînin û dizêrin; lê

pere nake. Xulam dibêje wan:

-Jinê ji xesûya min re bibêje ku bes e digirî. Riya me dûr e, divê em herin. Tiştê çûyî nedine dû. Ez ê diya te li bavê xwe mehr bikim; bila badilhewa li ber xwe nekeve.

Heyfelan di riyê de xwe digihêjîne keriyê pêz û naxira dewêr ên axayî; heqê şivan-gavanoan vediqetîne û dide pêşiya wan, yên mayî jî hildide û diçe. Piştî serjêkirina gayê bavê xwe, şewitandina zeviyê û du qatî dayîna heqê paleyan malbata Heyfelanî gelekî şerpeze bûye. Heyfelan bi keriyê pêz, naxira dewêr, jina xwe ya ducanî û xwesûya xwe ya ku soz dayê bi bavê xwe re bizewicîne digihêje gund; xwe diavêje lingên dê-bavê xwe, dide efûkirin û daweta xwe dike. Çendekî disekine, muhleta xwesûya wî jî derbas dibe ku êdî dikare piştî mêrê xwe yê mirî bi mêrekî din re bizewice. Heyfelan diçe cem diya xwe, dibêje ku hemû zêrên axayê wî di paşila jinikê de ne, dema mêrê wê miriye soz dayê ku li bavê mehr bike û ew zêr bigihêjin bavê wî. Diya wî neçar dimîne û razî dibe. Bi vî awayî bav û kur êdî gelekî zengîn û bextewar dibin. Çîroka me bû axa qulikên dîwaran, rehet li dê û bavê guhdaran”

Hecî Hemîd li pêşiya xwe niherî ku hema hema du-sê parçe zebeş mane; dema ku wî çîroka xwe vegotibûye, hevalên wî zebeş merisandine. Lewre zebeşê mayî kaşî ber xwe kir û got:

-Gelî bêwijdanan, hûn qe nabêjin 'hevalê me jî heye', bes e ji we re! Îcar di vê çîroka min de Heyfelan ez im ku min bi salan xebera bavê xwe nekir; piştî ku çû rehetê, serê min bi keviran ket û gelek bobelat hatin serê min, ez pê hesiyam ku divê vegerim, karine qenc bikim ku şermezariyên xwe bişom.

Di vê navberê de Bedir devê şûşeya avê vekir, bi ser destê seyda û bûrayê xwe de kir û got:

-Hecî û seyda, ez di navbera de we şaş bûme. Hema ya bi xêr em herine cem wî hevalê Heciyî ku di zanîngê de hîndekar e, bila ew bibe hekemê di navbera me de, wî çi gotiye em wisan tevbigerin.

Hecî Hemîd -ê ku ji hevalê xwe yê zanyar bawer dikir- û Mela Hisên -ê ku êdî ji girmegirma ewr û esmanan aciz bibû, li benda baranê bû- pêşniyara Bedirî beraqil dît û qebûl kir ku hekemek vê rewşa nîqaşbar çareser bike. Lewre divê her siyan destên xwe sivik bigirtana û dawiya heman hefteyê biçûna cem hîndekarê Zanîngeha Yalovayê Elî Ferhad Şanlî ku bi rêberiya wî dest bi projeya xwe bikirana. Lewre têkiliyên pêwist hatin girêdan, roja yekşemê danê nivro wekî dema civînê hate diyarkirin û her sê camêr ji hev veqetiyên.

\*\*\*

Her sê camêr roja yekşemê bi nimêja berbangê re bi rê ketin. Hecî Hemîd êvara yekşemê hatibû Salihliyê û li mala xwişkê mabû ku sibehê bigihêje hevalan; lê Mela Hisên wê şevê alarma saeta xwe li gorî saetek beriya berbangê bar kiribû ku dereng nemîne. Her çi Bedir e wî jî hê roja şemiyê erebe kişandibû qada pîşesaziyê, li gorî pêwistiyê dabû nihêrtin û wekî hespekî dêlbijiyê wî hûnandî li parka nêzîkî malê dabû sekinandin. Zehra bi qasî saetekê beriya bangê hişyar bû, bi lez û bez çayek da ser û destnimêja xwe girt. Piştî çil-pêncî deqeyî taştê li ser pêşxûnê arastekirî bû û bangî mêrê xwe kir ku rabe û Hecî Hemîdî jî hişyar bike. Her du camêran nimêjên xwe kirin, taştîyeke lez xwarin, cil û bergên xwe li xwe kirin û bi xatirxwestina Zehrayê re banzdane derve. Her du rêwî peyatî heta parkê çûn, Bedirî erebe ajote taxa Mela Hisênî û melayî bi bihîstina dengê erebeyê re digel hopekî di dêst de derkete derve.

Mela Hisênî bismillahek kişand, li erebeya lawan siwar bû û bersiv da her du hevalên ku jê re gotin “bi xêr hatî seyda”. Erebe di nava riyên taxê de wekî hespekî loqloqo bi rê ket, dema ku derbasî riya sereke bû bi meşa revoyekî jîr orxe bû û bi dîtina lewheya sînorê bajêr re rabû çargaviyan. Piştî hal-xatir pirsînê Mela Hisênê ku ilmê xwe bi pirsan bi dest xistiye dîsa bi pirsêkê axaftin da destpêkirin:

-Hecî, ew hevalê ku em ê herin serdana wî merivekî çawan e?

Hecî Hemîdî wekî analîstekî dest bi danasîna Elî Ferhad Şanlî kir; lê zêdetir li ser

pşêvebirina kebabxaneyê wî sekinî:

-Welleh çi bibêjim seyda, merivekî akademîsyen e û zanyariyên wî kûr in. Bi rastî dema ku ew çûbû Yalovayê kebabfiroşî kiribû, karê xwe gelekî bi pêş ve biribû û dikanek ji xwe re standibû. Piştî standina dikanê bi awayê dûreke dest bi xwendina zanîngeheke vekirî kir, beşa civaknasiyê qedand û dikan radestî eqrebayên xwe kir ku li Zanîngeha Heranê lîsansa bilind bixwîne. Salekê li wê derê ma, hînî pehtina gelek cureyên xwarinên herêmî bû û dema amadekirina teza xwe vegeriya ser kar; him karê xwe digel menûyeke rengîn meşand him jî teza xwe amade kir. Piştî lîsansa bilind êdî ne got çav ne got serî da nava pereyan û doktoraya xwe li Îtalyayê kemiland; ji wir jî gelek cureyên xwarinan li lîsteya xwe zêde kirin. Niha ji xwe re şirketek vekiriye, birayên wî lê miqate dibin û rêvebiriyê wê şirketê ya navendî heye ku çend şaxên kebabxaneyê jî li bajarên din vekirine.

-Min got tu dê qala kesayetiya wî bikî Hecî; lê te dil bijande kebabên wî, -got û bi laqirdiyekê îtiraz kir ku hê bersiva pîrsa xwe hilnedaye. Li ser vê îtiraza nazik Hecî Hemîd ramanên xwe bi ser hev de anîn û xwest ku li gorî numeyekê rave bike; lewre wiha pirsî:

-Tu Bedirî çawa nas dikî? Binêrim ka tu girîngiyê didî kîjan aliyan ku ez jî wisan qala hevalê xwe bikim.

Mela Hisênî bi çend hevokên gilover û giştî numûneyeke wiha berpêş kir:

-Di destpêkê de merivekî berpirsiyar e, dikare rîskan hilde û karê xwe bigihêjîne armanceke serkeftî; dizane ku berpirsiyarî bi tenê nabe û bi dorhêla xwe re pareve dike, dizane ku berpirsiyarî amadekirina pêşeroj û dûmenê geş e, hertim hîn dibe û zanyariyên xwe rojane dike, ji eqreba û xebatkarên xwe bawer dike, zemanê xwe baş bi kar tîne, di nava zext û fişara kar de dengiya xwe diparêze. Bi texmîna min piraniya hosteyên serkeftî wiha ne; lê Bedirî beriya her tiştî derewan nizane, ji minafîqan aciz e û bi bêbextan re tu carî naxebite.

Hecî Hemîdî wekî ku awênêyeke şitî û rewneqdar dîtibe ramanên xwe derbirin:

-Ew jî hosteyekî serkeftî ye û tiştên ku te rêz kirin ji bo wî jî derbas dibin. Îcar kesayeta wî hinekî zanistî ye, pîvandî ye û berfireh e; mirov nikare tam sînoren wî kifş bike; lê taybetiya wî ya sereke ji gelê xwe hez dike, bi stranekê dikene yan jî digirî, hînbûna parçeyek ji çanda kurdî mînanî zêrekî li erdê dîtî dihesibîne. Her çiqas zêde bi kurdî nexwîne jî jiyana wî kurdewer e.

Mela Hisênî bi vê şîroveyê kêfxweş bû; ji ber ku gelek akademîsyenên kurd ewqasî ji jiyana kurdan dûr dikevin ku êdî nayên naskirin. Hecî Hemîd vegeriya ser Bedirî û got:

-Zava, te hişkehişk dîreksiyon girtiye û qe tişteki nabêjî?

Bedirî dil hebû ku bi riyeke ewle desthilatdariyê ji şeytên bistîne, di riya xwe de şaşiyê neke û bi silameti derkeve cihê xwestî; herwiha dizanibû ku Hecî Hemîd stranên xweş dizane û Mela Hisênî jî beytan xweş dixwîne. Lewre biryar da ku ji aliman deyn bike û bide navçava zaliman; di vê riya zalim de divê heta demê kurt beşdarî xebata hevalên xwe bibûya û li dijî neyarê hevpar ku şaşî ye bixebitiya:

-Hecî, ez ê çi bibêjim? Karê ajovanî ajotineke baldar e û ez jî wisan dikim; lê guhê min li her gotineke we ye. Heke dixwazin ez ê ji we re stranekê vekim, an tu dê kilamekê bibêjî an jî bila seyda ji me re çend beytan bixwîne. Ez bi xwe ji vî aliyê ve hê di goliktiyê de hatime xesandin ne stranekê tam dizanim ne jî beytekê.

-Welleh, te neheqî nekir. Te karê her kesî sparte xwediyî. Seyda tu beyta xwe amade bike û madem ku em ber bi Stenbolê diçin ez ê ji we re strana Genc Xelîl bibêjim.

Dema ku Mela Hisênî jî pêşniyara Bedirî pesinand û got ku beyta wî amade ye, Hecî Hemîd dest bi stranê kir:

Were lolo, were lolo, were lolo, were lolo... ax

Were lollo, were lolo, were lolo, were lolo, were lolo, were lolo... wayê...

Were lolo, were lolo, were lolo, were lolo, were lolo nemayê;

Ê nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê... wax,

Ez ê ji bona Genc Xelîl lawê apê xwe nemînim li dunyayê.  
De lolo Genc Xelîlo sibe bû,  
Çemê Paşo newala Hopê bişewite  
Ji dilê min û te re newal li pal e  
Dilê min ji bona pismamê min liyan e, liyan e, kalekal e  
Bihîstina min bihîstiye, pismamê min nexweş e nexweşekî jê di bêhal e  
Ez ê rabim destê genc Xelîl lawê apê xwe bigrim leylîf kim yalî mal e,  
Ji êvarê heyânî sibê jê re bibime naz balîf e, balgî bi beral e.  
Bira serê xwe bide ser cotê zendê min e zer badayî,  
Sûretê xwe bide ser cotê zer memikên min ên nîşanî bi xal e.  
Dema tu yê berê xwe bidî welatê xerîb û vê xerîbistanê;  
Ez ê cotê reş guliyê xwe jê kim ji hespê pismamê xwe re bikim dox-hevsar e,  
Xizêma pozê xwe bikime bizmar e;  
Kembera pişta xwe dîsa vê sibengê mal xirabo ji hespê pismamê xwe re bikim nal e.  
Ez ê kembera pişta xwe ji hespê pismamê xwe re bikim nal e,  
Dema tu yê berê xwe didî welatê xerîb û xwerîbistanê, di nava heval û hogiran,  
Ay de bira kesekî mebêje Genc Xelîl kurmanc e, kurmancekî bêpergal e nemayê;  
Ê nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê... wax,  
Ez ê ji bona Genc Xelîl lawê apê we nemînim li dunyayê.  
De lolo Genc Xelîlo sibe bû min sondxwarî;  
Bi sonda qesemê dema tu yê berê xwe bidî welatê xerîb û xerîbistanê  
Gelo vê sibengê ez ê di dû te re tu car û tu zemanî ji xwe re tu malê nakim.  
Ez ê pismamê xwe di hêşiya konê erebî ji xew ra kim,  
Kolozekî devetûkî bînim nava çavan kim, qondireyekî helebî di lingan kim,  
Ebayekî besrayî bînim nava milan kim.  
Eger pîra dê kalî bavê qayîl bûne jixwe qayîl bûne,  
gava ku qayîl nebûn koma bira û pismaman tevan bi qurban kim.  
Xwe berdime welatê xerîb û xerîbayê, welatê di Tirkiyayê,  
Himûs û Ekayê, Musil û Bexdayê, Beyta Şerîf Beytullayê, Stembola şewitî nivê dunyayê,  
Qasekê rûnem li ber kaniyeke vê serayê, cotê şalûl û bilbil, têlî tembûra peyda kim,  
Bînim ser serê pismamê xwe re bi dar de kim, bi surra sibê re, bi azana meleyan re,  
Bi qêrînê dîkan re, bi kilekilên meşkan re, bi lûbelûbên jinebiyan re,  
Bi dengê qîzan û bûkan re, fitînenê nêçîrvanê serê çiyar re,  
Hokînenê şivanê ber keriyar re, norînenê devçiyên ber deveyan re;  
Bi zereqiyên tava serê sibehê re, bi dengê lawên kurdan re, birqînenê di şûran re,  
Bi dengê dengbêjan, bi defê derwêşan, bilûrê bilûrvanan,  
Bi sazên sazbandan, bi dengê şalûl û bilbilan,  
Têlî tembûran qasekê ji kedera dilê xwe yê bimereqê bikeder re,  
Gelo segmanê cindî dîsa ji dilê xwe re ji xew ra kim nemayê;



Ê nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê... wax,  
Ez ê ji bona Genc Xelîl lawê apê xwe nemînim li dunyayê.

Piştî hevoka dawîn a “ez ê ji bona Genc Xelîl lawê apê xwe nemînim li dunyayê” hêsirine germ ji çavên Hecî Hemîd dahatin xwarê, bi çima îşlikê xwe yê milqol şilahî paqij kir û vegeyriya ser Mela Hisênî û got:

-Seydacan, min peywira xwe bi cih anî! De îcar dora te ye!

Mela Hisênî xwest ku beriya beytxwendinê bihîstineke xwe pareve bike; lê pirsî bê ka hevalên wî hay jê hene yan na:

-Hûn dizanin strana Genc Xelîl ji ku hatiye û çima ewqasî bi şewat e?

Bedir milên xwe di wateya nezanînê de bilind kirin û Hecî Hemîdî jî serê xwe çeperast hejand ku “na, nizane”. Li ser vê yekê Mela Hisênî axek kişand û zanyariyên xwe rêz kirin:

-Dibêjin wezîrekî di xewna xwe de dîtiye ku li bajarokê Gencê yê Amedê ciwanekî bi navê Xelîl bûye serfermandarê artêşê û sê bajar vegirtine. Wezîrê ku dil bijandiye fetha welatan meriv şandine pey vî ciwanî. Li gorî nav-nîşanên ku wezîrî dane ciwên li Genca Amedê dibînin. Fermana wezîrî jê re dibêjin û jê dixwazin ku bi wan re biçê; lê ciwan şertekî dide pêşiya wan ku dotmama wî jê re bixwazin. Merivên wezîr diçine xwegîniyê, dotmamê jê re dixwazin û daweta wî dikin. Ciwan heft rojan bi bûkê re dimîne û roja heştan digihêje merivên wezîrî ku artêşa xwe ber bi fethê bimeşîne. Bi rastî jî ciwan di wê fetha xwe sê bajaran bi dest dixîne; lê bi birîneke xedar nexweş dikeve. Artêş fethê serfermandarê xwe radestî kalekî dikin ku lê binêre, hinek pereyan didinê ku derman bike. Dema ku artêşa serkeftî bê serfermandar vedigere dotmama wî diçe pêşiya wan pirsê mêrê xwe dike. Jê re dibêjin ku li filan derê radestî merivekî kirine ku li ber mirinê ye. Jina wî tivdirên xwe digire û li ser şopa wî bi rê dikeve. Di dawiyê de rastî kalekî tê ku dibêje di mala wî de nexweşekî bedhal heye; lewre nikare wan bike mêvan, ditirse ku nexweşiya wî bigihêje wan jî. Dema ku dotmam dikeve hundir, dinêre ku mêrê wê di nava kurmên birînan de ji ser hişê xwe çûye. Demeke dirêj derman dikin, paqij dikin û lê dinêrin. Di wî rewşa wî ya behdal de dotmamê ev stran gotiye û pê mêrê xwe tedawî kiriye, sax-silamet vegeyrandiye malê. Îcar gava vê stranê dibihîzim kurdên ku hertim di ber xelqê de hatine kuştin, avêtin û jibîrkirin tên bîra min û keseba min dişewite.

Her du camêran ne bi guhekî bi deh guhan ev çîrok guhdarî kirin û maf dane Mela Hisênî ku kurd hertim di ber xelqê de bê ser û şûn bûne. Piştî xêleke xurt Mela Hisênî wekî derwêşekî têkeve cizbeyê dest bi xwendina beyteke Ehmedê Xaniyî kir û her du hevalên xwe ji deryaya ramanan derxistin:

Zahidê xelwetnişîn, pabestê kirdarê xwe ye  
Tacirê rihletguzîn derbendê dînarê xwe ye  
Aşiqê dilberhebîn, dildayê dildarê xwe ye  
Vî zemanî, her kesek bêşubhe xemxwarê xwe ye

Bê 'emel tu ji kesî meke hêvî 'eta û hîmmetê  
Bê xerez nakêşitin qet kes ji kes zehmetê  
Kes nehin hilgirit barê te bê ucretê  
Ger çi Îsa bit ku wî fikra kar û barê xwe ye.

Hoşiyar bî da nekî umrê xwe bêhasil telef  
Lew ku nakit fayîde mal û genc û ewlad xelef  
Maceraya Xidir dîwarê yetîmî bû selef  
Vî zamanî her kesek mîmarê dîwarê xwe ye.

Ca nezer ke ibretê pêla ku waqi' bit sewaş  
Ger nebîtin iltifat û mewc û debr û meaş  
Cindîyê rimbaz ê faris naditin canî belaş  
Saeta serbazî hêvî ji serdarê xwe ye.

Xaniya, zayi' meke weqtê xwe ey nadan, 'ebes  
Bêteleb nabî ji weslê behremend, ey bu'l-hewes  
Sani'ê mutleq ku nîn e ihtiyacek wî bi kes  
Lutf û ihsana Wî jî derheq telebkarê xwe ye.

\*\*\*

Elî Ferhad Şanlî ji lojmanên Zanîngeha Yalovayê veqetiya û bi otobûsê çû kebabxaneyê xwe. Li kebabxaneyê heşr-mehşerek hebû ku xwedî û CEOyê şirketa Şanlî Kebapê îro danê nîvro dihate serdanê. Hemû karkerên kebabxaneyê bi baldarî li temtêla xwe dinêrîn ku cil û bergên wan paqij xuya bikin, ji serkarên xwe gotinan nebihîzin. Serkaran karker dihêvotin ku bihustek bêxemî gazeke ziyane bi xwe re tîne, divê îro wekî rojek ji rojên dêlindêzeke fermî bihesibînin; aşvanê aşê mîran bê xulam nabin û divê serkarên xwe nedine şermê. Lêbelê rewş ji bo Dr. Elî Ferhad ne wisa bû; bi kincine rojane û tiraşnebûyî hatibû kargeha xwe ku mêvanên xwe pêşwazî bike.

Dr. Elî Ferhad ji rojên xwe yê şivaniyê dizanibû ku bizin jî seba mexelê xwe yê saetekê bi simûçkan cihê xwe xweş dike, bê himehim û inteint tiştên têkûz bi dest nakevin; lewre hinekî zû hatibû kargehê, wekî ku êgir bi darên hûr hilke karker kiribûn rewşa amadebaşiyê û li wan nîşan dabû ku ava xurtan serhevraz jî diçe. Dema ku derbasî jûra rêveberiyê bû û qehweya wî hate pêşiyê hizir kir ku kevirê havîne biavêje kulîne, vê hatina xwe ya zû û pêşwext veqetîne destkeftinekê; lewre bi çend rêvebiran re rûnişt, rojeva şirketê bi kurtasî nirxand, çend nîşeyên girîng bi wan da girtin û bi derketina wan re bédengiyekê der û dor rapêça. Dema ku nihêrî mêvan hê nehatine ji xwe re got “bizina bi şun de bimîne para gur e, heke hûn zêde dereng bimînin ez ê li benda we nesekinim ku ji we re bibe derseke watedar”; lewre rabû ser piyan, ji paceya şirketê re derve temaşe kir. Lêbelê aşê nezanan Xwedê digerîne, piştî saet û nîvekê ji hatina wî erebeyek li pêşiya avahiyê sekinî û sê mirov jê peya bûn. Ji wan yek nas dikir ku Hecî Hemîd bû; lê yê din nenas bûn û rûyên wan ên qemer nasnameya wan dida der. Lewre ji xwe re got “bila şêr piştî mirovî bişkîne, ne ku rovî devê mirovî dalêse; va ye kurdên rengqemilî hatin, Hecî Hemîd wekî agirê li qurman mayî daye pêşiya hevalên xwe, bi Xwedê kê çi bibêje jî Behra Wanê bi devê segekî nalewite”.

Elî Ferhad fikirî ku aqilê sivik barê giran e û divê li gorî karîzmaya xwe tevbigeriya, ba çawa dihat wisan bêndera xwe bida ber bayî û bi bêhneke fireh bêşûreya xwe veqetandî doşaveke rind; lewre ji jûra xwe veneqetiya û li cihê xwe rûnişt. Bi rênîşandana serkarekî şirketê Hecî Hemîd li pêşiyê, Bedir û Mela Hisên jî li pey wî her sê camêr ketin jûra rêveberiyê ku Elî Ferhad lê rûniştibû. Bi dîtina mêvanan re Elî Ferhad rabû ser xwe, destê Hecî Hemîd girt û çû rûyan; paşê kêfxweşî da her du hevalên wî Bedir û Mela Hisên jî. Hevdîtîne êdî bi laqirdiyan berdewam kir:

-Dibêjin birayekî dîn û yekî hişyar dane mûyekî û neqetandine. Îcar te daye pêşiya van

camêran aniye çî? Hûn ê çî bi min bişêwirin?

-Na heyran em nehatine şêwrê, ez min daye pêşiya mêran û hatime dîwana mîran. Em ê zikê xwe têr bikin û paşê gevezetiyê bikin, -got Hecî Hemîd û nîşan dayê ku beriya xwarin axaftin-maxaftin tune.

Îcar Elî Ferhad bi laqirdiyekê xwest ku bibêje xwarin amade ye:

-Bi min xurto, li min xurto. Ka te zikê xwe têr kir heta ku du meriv jî anîne?

Hecî Hemîd xwe avête ber siha hevalên xwe:

-Heke ji min re tiştê tunebe jî dibe ku tu bidî xatirê mela û hosteyekî û kerî nan bidî me jî. Heke tu tiştêkî û her hevalekî min hopekî bide ez ê têr bixwim.

Elî Ferhad dîsa bi henek û gotineke berepaşkî axivî:

-Meriv bi xatirê xatiran diçe ser dîne misilmanan ne ku kafiran. Madem ku te melayek bi xwe re aniye û merivekî zehmetkêş jî daye kêlekê de fermo, em derbasî maseya xwarinê bibin.

Dr. Elî Ferhad -wekî ku pêşiyê serekê dizan bigire da ku peyrewên wî bidine dû û paşê bizivire dora peyrewan, yeko yeko wan bigire- bi laqirdiyan Hecî Hemîd dida xwihdanê û hevalên wî jî ew diparast. Doktorê civaknasîyê pêşiyê agirê bin kuçikan derdixist û nedihîşt sîtila ser bikele; ji ber ku gava Hecî Hemîd zêde biaxive dibe ku ji armanca xwe bi dûr bikevin; herwiha hizir dikir ku bi vî awayî çavkaniyên hêza wan a axaftinê ku Hecî Hemîd e dê bimiçiqe, ew dê bi dilê mijarê hîn bibe. Lewre li ser xwarinê pirseke wiha pirsî:

-Hurmata min ji ilmê te re heye; lê ez kengê melayekê bibînim Silhedîne Eyûbî tê bîra min û ez qe jê hez nakim. Li gorî te Silhedîn mirovekî çawa ye?

-Heke rastiyê bixwazî ez jî hinekî jê hez nakim; lê wekî ku dinya-alem hurmeta wî digire ez jî qedr didimê, -got Mela Hisênî û zêde dirêj nekir-

-Ji kîjan aliyê ve wî hez nakî, bibexşîne!, -Doktor xwest ku mijarê hinekî veke.-

-Ji aliyê kurdeweriyê ve jê hez nakim, ji aliyê siyasetê ve û ji aliyê miameleya kurdan ve. Dema ku jê re dibêjin “were em dewleta kurdî ava bikin”, dibêje ku ew dê dewleta umetê ava bike û piştî wî umet zorê li milletê wî dike. Belê, lehengekî mezin ê leşkerî bûye; lê beriya mirina xwe dewletê wekî milkê bavê xwe di nava kurên xwe de dabeş dike û saziya dewleta umetê dike rehîne kulfetê xwe; bi gotineke din pêşiyê de maf nade gelê xwe û dibêje umet, paşê dibêje malbat û umetê ji bîr dike, îcar dîrok vê nakokiyê nabexşîne. Kurdekî lorî yê jêhatî dibîne ku dikare hilkişe dîwaran û pir çalak e; wî dixapîne û çend kurdên lorî yên mîna wî hebin dide anîn, merivan dide pişt wan û wekî DAIŞê serê wan lê dixê.

Dr. Elî Ferhad ji vegotin û nirxandinên Mela Hisênî kêfxweş bû bi laqirdiyekê suhbet xweş kir:

-Hecî Hemîd, te melayek neaniye, civaknasek aniye vê derê bira. Melayên wiha kêma in û di nava civakê de hertim eziyetê dibînin. Civak hez dike ku mela bê nirxandin û şîrove bûyerên dîrokî veguhêzin ku barê berpirsiyariyê nekeve ser milên wan.

Bedir -wekî çirçirka ku kirasê xwe biguherîne û dema têkeve tengasiyê dîzîka bireve- xwe bêdeng kir û beşdarî axaftinan nebû; lê Hecî Hemîd dixwest avê şêlî bike ku masiyan bigire, tiştên sosret bibêje ku morala her du zanyaran xera bike û ji rewşê sûd wergire. Lewre nerazîbûnek nîşan da ku her du zanyar ji awirên xwe ve rûpelên dîrokê ronî bikin:

-Me du zanyar anîne ser maseyekê ku hev bikemilînin; îcar her duyan jî êrişî malmezînen kurdan kir. Xwedê ji we razî be tiştine wisa bibêjin ku em li ser tifaqê çêbikin.

-Hecî Hemîd madem te ji me re got zanyar bihêle ku em zanyariya xwe bikin. Ma te em anîne ser maseyekê da ku em bazirganiyê bikin? Bi Xwedê tiştêkî ku bifroşim te tune ye û tenê dikarim pereyê ve xwarina te û hevalan ji te bistînim, -bi devekî ken got û berdewam kir:- îcar te pere hilnedabe ser xwe û piştî xwe dabe min bila hevalên te bi ber te ve bidin.

Elî Ferhadî pêşiyê derî û paşê jî diz girt, bêyî ku riya axaftinê bihêle dawî li axaftinê anî. Hecî Hemîd nihêrî ku bi dizîkan ve hildana agehiyan li cem zanyaran şerm e; lewre hinekî soromoro bû û xwe avête bextê Bedirî:

-Bedircan çima wisa mîna kalê rih-kurkirî bêdeng sekiniyî? Tu jî çend tiştan bibêje, va ye bataryaya min qediya û min nikaribû galegalê xweş bikim.

Elî Ferhadî tê ghişt ku Hecî Hemîd bi welatekî dûr re hevalbendiyê dike û êrişê dibe ser cîranê xwe; lewre wî jî hevî kir ku devnermiya Bedir rewşê sererast bike, bi sayeya dîplomasiya wî kevir ji cihê xwe neleqin. Divê Bedirî ejdehayê her du aliyan bidiziyê û sîmurxek dayîna dewsê ku sedemên nîqaşê ji holê rabûna; lewre dara tûtê nîşan da û lanet li dara biyê anî, niyêt-meremên xwe rasterast negotin:

-Hecî em mêvan in, mêvan beranê malxweyê malê ye; çawa bixwaze wisan ser jê dike. Her du camêr jî di qada xwe de pispor in; divê em ji xwe re guhdarî bikin, nîvê têghiştinê guhdariya baş e.

Piştî ku Hecî Hemîd bi serhejandinekê maf dayê ku “bila be” Bedir vegeriya ser Elî Ferhadî û xwe li nezaniyê daynî, nefsbîçûkî nîşan da û kavirek bi darê ve girêda ku her du pilingan bi carekê de bigire:

-Mamoste, welleh destên malxwe û amadekiriyan neêşin ku ev destexan dane pêşiya me; lê kêmasiyeke me heye ku axaftin qut bû. Gava axaftin qut bibe em ê pariyên devên hev bijmêrin û çavnebariya hev bikin.

Ev pêşniyara ji bo berdwamiya axaftinê Elî Ferhad jî, Mela Hisên û Hecî Hemîd jî şa kir; her sêyan jî bêyî pesinandin dîplomasiya Bedirî eciband. Piştî ku Bedirî her du camêr ji hêrsê vegerandin û hilkişandin ser dikê, Hecî Hemîdê ku rola pêlekanê dilîst ji navê hilda; bi navbeynkariyeke serkeftî ji çem derbas bû, pire hilweşand û axaftina zanyariyê ya her du aliyan berdwam kir.

Mamoste Elî Ferhad piştî vê destpêşxeriyê nexwest ku darê bi bişkoyên sexte bixemlîne, bi dekbazî bihaneyan bide ber axaftinê û naveroka pasteyê biçûk bi parçeyên erzan mezin bike; lewre dîsa vegeriya şûna xwe ya mazûvaniyê ku di mala xwe de nebe mêvan. Mela Hisên jî tê ghiştibû ku bi tevgera Hecî Hemîdî şûna mêvên û mazûvên guheriye; lêwre ji rewşa xweparastin û sistiyê derbazî çalakî û êrîşkariyê bû, vê carê wî pirsî:

-Mamoste, ji aliyê we ve rewşa kurdan çawa dixuye? Wekî civaknasekî temtêla heyî ya kurdan çawa dinirxînin?

-Seydacan, em ji bo pîvandina civakê amarên meydanî bi kar tînin û mixabin rewşa heyî ya kurdan derfetê nade me ku bigihêjin encamên zanistî. Lewma em bi texmînî dikarin bibêjin ku kalîteya civaka kurd a dêrîn bilind bû, lê kapasîteya wê ya pêşvebirinê tunebû; îcar niha rewş berevajî bûye, ango kapasîte heye, lê kalîte tune.

Bedirî nihêrî ku axaftinê bi hinek tarîfên giştî dest pê kir wî jî lê zêde kir:

-Wisan e divê xebat ji bo derxistina kalîteyê were tîrkirin, divê mirov teleya hingivî dayne ber kesayeta zarokê kurd ku bi wan pêlîstokên baldiz re asta pêkhatiya xwe xurt bike.

Elî Ferhadî piştgirî da ramana Bedirî û got:

-Belê divê kesên temenmezin mirov, civak û bajarên xwe biparêzin; lê divê numûneya ku li zarokî tê nîşandan deriyê bajarê neparastî be ku şiyane xwe nîşan bide. Divê hesabê karîzmaya zarokî her dem bernameyan de hebe.

Mela Hisênî jî xwest kêmasiyeke civakê pêşkêş bike û çareseriyê xwe nîşan bide:

-Ji aliyê din ve kalîteya jinên me pir ketiye, nîşana nû êdî hema hema bi kurdî naaxive û ev yek qelşekê di civaka me de çêdike. Pirî caran xem-xeyalên mêrê malê û yên zar-zêçên malê li hev nagirin. Lewre mêr jî piştî demekê lawaz dikeve û ji ber kêmxîretiya wan ji jiyana kurdî sist û sar dibe.

Hecî Hemîdî bi rûyekî şermkirî piyên xwe daxistine nava deryaya ramanan û çareseriyê xwe pêşniyar kir:

-Ji bo ku em bikaribin dijminên xwe têk bibin divê em bikaribin sîxurên reqîbê xwe wekî tovekî aloziyê bişînin nava refên wan. Divê kalîteya têghiştinê ya me û zar-zêçên me wisa bilind be ku xetereyê hê di pêş de fêm bikin û xetereya şandî vegeerînin destkeftinekê.

Elî Ferhadî xwest bi keviyekî di destê xwe de vî dîwarî tamam bike û derbasî aliyê din be:

-Rast e, divê tarîfa dijminî û dijminatiyê eşkere be ku kesayeta kurd -çi jin çi mêr, çi zarok çi gihiştî- qelşên civakê bi xebatên xwe yên wijdanî bidirû, pîne û perçîn bike; herwiha pêşiyê li qanalên ku dixwazin vê qelşê fireh bikin bigire. Bi gotineke kurd û kurmançî divê kesayeta kurd bigihêje wê kalîteyê ku razên kurdan nede destê biyaniyan, bi destan nede û bi lingan li pey nekeve.

Bedirî dixwest ku êdî têkeve mijara komeleyê ya ji bo Mela Hisênî; lê ji ber geşbûna axaftinê nikaribû nîqaşê bibire. Te digot şeytan hewl dide ku vî karê qencyê damîrîne û pêşiyê lê bigire. Lewre pêwistî bi birîndarkirina xwe dît ku têkeve baregeha şeytên; heta ku şeytên bawerî bi wî baniya, divê hinekî îşkence bida xwe û sebr bikira, lawaziyên xwe nîşan bida, paşê çek û pûsatên xwe yên kêr peyda bikirana. Lêbelê êdî şeytên hemû keştiyên xwe yên şer bi hev ve girêdabûn, bi hev ve zincîr kiribûn, nîqaşên her du zanyaran nediqediyên. Hevgirtina şeytên wisan xurt bûbû ku Bedirî nikaribû têk bibira, hemû derfetên wî yên nîqaşkirina mijara sereke têk çûbûn; lewre wisan xuya dikir ku divê bi şun de vekîşiya û vebijêrka revê bi kar baniya. Bedirî ji nişkê ve her du destên xwe bilind kirin û got:

-El-Fatihe!

Her sê camêrên din bi vê dengê bilind ê Bedirî re veciniqîn û şiyar bûn; Mela Hisênê ku hertim ji fatiheyên re destên xwe bilind kirine dest bi xwendinê kir, herwiha pêşiyê Hecî Hemîd û di dawiyê de jî Dr. Elî Ferhadî destên xwe bilind kirin, fatiheyek xwendin û gişt kenian. Dr. Elî Ferhadê ku ji zû ve ye tevgerêke wisan nedîtiye bi lezgîni pirsî:

-Çi bû kî miriye yan jî nikaha kê hate birîn? Ev mewlûd e, şîn e yan şahî ye?

Bedirî bi devekî niv-ken got:

-Gelf camêran, me ewqas rê daye pêşiya xwe û hatine vê derê. Ev nêzikî saetekê ye ku hûn du zanyar li ser hinek mijaran diaxivin. Wiha here em dê qe behsa armanca hatina xwe nekin.

Dr. Elî Ferhad wekî ku hinekî şerm kiribe got:

-Welleh te rast got bira, mijarên hezar salî li ser sifreyeke kebaban nayên nîqaşkirin; de werin em dest bi babeta hatina we bikin. Hûn bi ser çavan re hatine û we çi xwar-vexwar noşî canê we be! De bibêjin bê ka hûn çi alîkariyê ji min feqîrî dixwazin?

Bedirî pêwistî bi pêşgotinekê dît û got:

-Mamoste, em dixwazin li ser navê sehabiyê kurd cenabê Gavanê Kurd -Xwedê jê razî be- komeleyekê vekin ku zarokên kurdan li ber destê wî bixwînin û Hecî Hemîd jî dixwaze bibe sponsorê beşeke damezrandina vê saziyê; lê dibêje ku bila medrese li bajarekî kurdan bê avakirin.

Dr. Elî Ferhad heta hevoka paşîn bi dijwarî sebr û tebat kir û pirsî:

-Deqeyekê bisekine. Niha sehabiyekî kurd heye û navê wî Gavanê Kurd e, ne wisan?

Her sêyan bi hev re gotin "belê" û Dr. Elî Ferhadî hanzûkan ve got:

-Îcar ev zatê bimbarek xelqê kê derê ye?

Mela Hisênî berisva pirsê da:

-Mamoste, bi rastî sê riwayet hene. Şûnwarê ku di rûpelên dîrokî de hatiye tomarkirin Sard e, ango Caban El-Kurdî es-Sardî. Îcar hinek dibêjin Sêrda me ye, hinek dibêjin Sard gundekî li rojhilatê Kurdistanê ye û hinek jî dibêjin bi wateya "erdê sar" e ku ew jî cih û warê kurdên Kafkasê ye.

Dr. Elî Ferhadî êdî bi pirsan dest bi lêkolîna agehiyên berdest kir:

-Ev jî tê wê wateyê ku di navbera salên 590-650î de li Sard û Mekke-Medîneyê jiyaye. Gelo zewiciye û zarok jê nemane?

Mela Hisênî agehiyên xwe pê re pareve kirin:

-Belê, kurekî wî yê bi navê Meymûn b. Caban es-Sardî El-Kurdî heye ku demekê li Medîneyê û demekê jî li Besrayê jiyaye.

Dr. Elî Ferhadî dîsa bi pirsêke babeta axaftinê berfireh kir:

-Meriv dikare li dîroka Besrayê, alimên wê û hatina wî camêrî vekole û bigihêje hinek agehiyan; mixabin erebiya min têrê nake ku lêgerînekê bikim, lê dikarim ji aliyê zanistî ve hinek alîkariyan bidim we. Gelo Gavên hedîs riwayet kirine û kesayeta wî çawa ye?

Mela Hisênî tûrikê xwe vala kir:

-Salixdarên hedîsan derbarê rojbûyîn û mirina wan de tu agehiyê nadin; lê wisan xuya dike ku sehabî Gavanê Sardî û kurê wî yê tabîî Meymûn di navbera salên 600-700î de jiyane. Yekane hedîsa ku Gavên riwayet kiriye derbarê mafên jinan û mijara deynan de ye ku wiha dibêje: “Kurê wî yê Meymûn salix daye ku Gavanê bavê wî gotiye: Min ne tenê carekê, bi qasî deh caran ji Cn. Pêxember eleyhiselamî bihîst ku dibêje: *“Kî bi qelendekî kêr an jî zêde jinekê li xwe mehr bike; lêbelê di dilê wî de dayîna mafê wê tunebe, (li ser vê niyêta nedayîne) bimire û mafê wê nedê di roja qiyametê de ew kes dê wekî zinakarekî derkeve hafa Xwedê. Kî tiştêkî ji yekî deyn bike; lêbelê nexwaze ku wî malî vegevine xwediyê mêl, wî bixapîne û malê wî desteser bike ew kes dê wekî dizekî derkeve hafa Xwedê.”*”

Mamoste Elî Ferhad li pêşberî vê agehiyê dev-vekirî ma û çendekê di hişê xwe de hinek tişt birin-anîn; paşê ji nişkê ve pirsî:

-Gelo vî camêrî çima tenê hedîsek riwayet kiriye; ya ku ez dizanim hinek sehabiyên bi hezaran hedîs riwayet kirine û bi serê xwe ekoleke riwayetan in?

Mela Hisênî derfeta zanyariyeke kûr dît ku bersiveke têr û tijî bide:

-Derheqa Meymûnê Kurd de El-Yemanî nivîskarê “El-Enwar’ul-Kaşîfe”yê wiha gotiye: “Kesî ew nedaye nasandin û min tiştêk jê seh nekiriye. Bavê Meymûnê Kurd hema hema nayê naskirin. Di “Usud’ul-Xaye” û “Îsabe”yê de navê wî wekî Caban derbas dibe û wan jî derbareya wî de tiştêk negotîne. Malikê kurê Dînarî ji Meymûnê Kurd xwestiye ku ji bavê xwe yî ku di heyama Cn. Pêxember eleyhiselamî de jiyaye û hedîs guhdarî kirine de salixan bide. Meymûnî jî wiha gotiye: “Bavê min salixên Cn. Pêxember eleyhiselamî ji me re nedidan. Tirsawî ew bû ku lê zêde bike an jî jê kêr bike. Cn. Pêxember eleyhiselamî wiha gotiye: *‘Kî bi zanatî li ser zimanê min derewekê bike, bila rûniştêka xwe ya agirîn amade bike.’*”

Dr. Elî Ferhad hevoka paşîn a bersivê bi zanyariyeke xwe ya giştî piştrast kir û pêwistî pirseke din jî dît:

-Rast e, tirsawî tevahiya sehabiyên ew bû ku têkevin vê şaşîtiyê û gelek qet hedîs riwayet nekirine. Meymûnê kurê wî jî tiştêk riwayet kiriye gelo?

-Belê, -got Mela Hisênî û qala du hedîsên din kir ku ne riwayetên bavê wî ne- Meymûnî gotiye: Ebû Usmanê Nehdî ji Umerê Xetabî riwayet kiriye ku Cn. Pêxember eleyhiselamî wiha gotiye: *“Ez seba we her durûyekî zana ditirsim; bi hikmetê diaxive û bi zilm û nebaşiyê tevdiqere.”* Hedîsa din jî wiha ye: Ebû Nesîr Meymûnê Kurd ji Ebû Osmanî riwayet kiriye ku Eliyê Ebû Talibî wiha gotiye: Cn. Pêxember eleyhiselamî destê min girtibû; em di hinek kolanên Medîneyê de digeriyan; em rastî baxçeyekî hatin û min got: “Ya Resûlulah ev çi baxçeyekî xweşik e!” Cn. Pêxember Eleyhiselamî li min vegehand: *“Di bihuştê de jê çêtir ji te re heye.”* Paşê em rastî baxçeyekî din hatin û min got: “Ya Resûlulah ev çi baxçeyekî xweşik e!” Cn. Pêxember eleyhiselamî li min vegehand: *“Di bihuştê de jê çêtir ji te re heye.”* Bi vî awayî em rastî bi qasî heft baxçeyan hatin. Min ji bo giştan got: “Çi xweşik e” û Wî jî li min vegehand: *“Di bihuştê de jê çêtir ji te re heye.”* Piştî ku rê ji mirovan vala bû ez hembêz kirim, hilqehilq kir û giriya. Eliyê Ebû Talibî wiha gotiye: Min got: “Ew çi tişt e ku te dide giriya?” Cn. Pêxember eleyhiselamî wiha li min vegehand: *“Di dilê gelek neteweyan de kîn û dexesî hene. Piştî min dê nîşanî te bidin.”* Eliyê Ebû Talibî wiha gotiye: Min got: “Ma ji ber silametbûna dîne min e?” Got: *“Belê, ji ber silametbûna dîne te ye.”*

Dr. Elî Ferhadî êdî dawî li pirsên xwe anîn, giran giran berê xwe da Mela Hisênî û wiha got:

-Seydacan, bi rastî guherandin û nivîsandina dîrokê bi destî dewletan çêdibin. Îcar madem ku te dil heye li ser vî sehabiyî bixebitî û kurdan derxî hafa Cn. Pêxember eleyhiselamî karê te pir e. Pêşiyê divê tu bikaranîna înternetê û komputerê baş hîn bibî; paşê li ser dîroka Keyaniya Lîdyayê hinekî bixwînî û derbasî dîroka îslamê bibî. Ya ku ez dizanim di dewra Cn. Pêxember eleyhiselamî de hemû sehabiyên neereb kole bûne û paşê hatine azadkirin. Îcar divê tu bizanibî ku Gavanê Kurd koleyê kê bûye, wî ev kole ji kê kiriye, kolefiroşê ku ew aniye kî ye û çawa ew aniye? Kolefiroş ew aniye Mekeyê yan Medîneyê? Kengê ew û kurê wî hatine azadkirin? Te qala çûyîna Meymûnê Kurd a li Besrayê kir, îcar ev dema kîjan xelîfeyî bûye? Binemaya Meymûnî kî ye? Qada te ya xebatê ev

e.

Mela Hisênî bersiveke kurt da û sekinî:

-Ez înternet û komputerê bi kar tînim; vê dawiyê gelek bernameyên baş jî hatine amadekirin ku pirtûkxaneyên hêja ne. Îcar dimîne piçek dîrok û lêkolîneke piço piço. Haaa, ez vê yekê jî dizanim: Meymûn koleyê Evdilahê kurê Amir b. Kurêz e. Amirê bavê wî piştî fetha Mekkeyê misilman dibe; lê Evdilah heyama Cn. Osman li Besrayê walî bûye û Xoresan feth kiriye.

-Wisan e çarçove diyar e û maye ku xebateke xweş dest pê bike, -got Dr. Elî Ferhadî û xêleke xurt noqî nava ramanan bû-

Di dawiyê de Dr. Elî Ferhadî serê xwe rakir, li saeta xwe nihêrî û got:

-Gelî birayan hûn heta vê derê bi ser çavan re hatine û êdî dema min a çûyîne hatiye. Îcar Mela Hisên bi texmîna min cihê te yê jiyar û mirinê Sardes e; here wir, komeleya xwe ava bike, yeko-dîdu ji xwe re şakird û feqiyar bibîne û wan perwerde bike. Di nav çalakiyên komeleyê de jî şakird û feqiyar xwe bibe û li Sardesê bigerîne, dîrokeke zindî ya Gavanê Kurd hînî wan bike. Êdî hemû xebatên xwe li ser naskirina vî sehabiyê kurd tîr bike, xetekê ji Sardesê ber bi Mekke, Medîne û Besrayê bikşîne; dîroke ji nû ve vejîne, bêyî ku ji rastiyê dûr bikevî zanyariyên heyî ji bo berjewendiyên kurdan şîrove bike. Di vê navberê de çi alîkariya madî, manewî û zanyarî ji destê min bîn ez dê texsîr nekim. Di destpêkê de bila Hecî Hemîd bibe sponsor û ez ê jî paşê beşdarî we bibim.

Paşê berê xwe da Bedirî û got:

-Biracan, Xwedê ji te razî bibe ku te destê me û vî camêrî gihande hev. Birayekî min î sûtal jî heye; me çiqasî kir û nekir nexwend. Hêvîdar im ku dema we komeleya xwe vekir yekemîn şagirtê we ew be. Ez ê wî bişînim cem we; her çiqas temenê wî ji çilî derbas kiribe jî hê nezewicî û tolaz e, hêvîdar im bi xatirê we bixwîne û em bibin xînamî, -got û kenîya-

Dr. Elî Ferhadî rabû ser piyan Hecî Hemîd hembêz kir, çû rûyê her du hevalên wî û got:

-Hecî, dibe ku ev bereketa hec û towbeya te be ku em rastî karên qenc tîn.

Her çar camêr bi ken û henek ji qatê duyem peya bûne xwarê, Dr. Elî Ferhadî mêvanên xwe bi rê kirin û derbasî lojmanên zanîngehê bû.

\*\*\*

Piştî ku Bedir, Hecî Hemîd û Mela Hisên vegeriyar Salihliyê bi çend rojan karên fermî yê damezrandina Komeleya Gavanê Kurd dest pê kir û amadekirina nivîsgeha komeleyê bi qasî çend mehan kişand. Divê Mela Hisên êdî vegeriya Êlihê û mala xwe bar bikira Salihliyê; bi awayekî cidîtir li ser xebatan bisekîniya; lewre piştî tîkûzkirina nivîsgehê kar û barên rêveberiyê spartine Bedirî û çû.

Di wê navberê de Hecî Hemîd bi telefonê agehî da Dr. Elî Ferhad Şanlî ku komeleyê dest bi xebatên xwe kiriye, mêvanxaneyeye wê jî tîkûz bûye û dikare birayê xwe bişîne xwendinê. Birayê wî yê bi navê Nezîh ku tirkan jê re Kurd Mihemed digot piştî hefteyekê-deh rojan gihiştê Salihliyê rast berê xwe da komeleyê û berêvarekê hate cem Bedirî. Dema ku Nezîh li zengila komeleyê xist keça wî ya mezin Rûkenê derî vekir û xêrhatinî lê kir. Nezîh hinekî li nivîsgehê geriya û hizir kir ku alîkariya Bedirî bike.

Rûkenê êdî bermêr bû, bedew bû jî. Gelekan ji bo zewacê hewl dabû ku bi malbata wê re pêwendiyar daynin. Hinek ciwanan hevaltî bi bira, ap û pismamên wê re, hinekan bi hevalên wê yê keç re, hinekan bi ser dê-xwişkên xwe re pêwendî girêdabûn û zewac pêşkêş kiribûn; lê her demê pîrsgirêkek derketibû. Li ser torên medyaya civakî gelek dost, nas û hevalên wê hebûn; gelekan bi eşkeretî û hinekan bi niçandinê mijar anîbûn ser zewacê; lê wê bi peyveke kurt gotibû: "na". Bavê wê yê Bedir carekê pêşniyar kirê ku digel wî here nivîsgeha komeleyê û pê re bixebite; qe nebe ji vê tenêmayîna li malê rizgar bibe. Wê jî bêyî hemdê xwe pejirandibû ku gura bavê xwe bike û çûbû xebatê. Rûkenê di roja pêşîn a xebata xwe de alîkarî da Bedirî, kombarsên nivîsgeha nû tessele kirin, bernameyên wan vesaz kirin û kêmasiyên wan temam kirin ku nêzikî berêvarê şagirtê

Mela Hisênî yê Nezhîh jî hate serdana wan. Nezhîh silav da Bedirî, rewşa wî pirsî û bi hevokerê kurt silav da Rûkenê jî: “Merheba ji te re jî xwişkê, karê we bi xêr be.” Nezhîh dît ku Bedir bi sererastkirina nivîsgehê re mijûl e, wî jî dest bi alîkariyê kir. Di vê navberê de pêwîst bû ku projektora nivîsgehê li ser kombersê bê ceribandî û Bedir tika ji Nezhîh kir ku vî karî bike. Li gorî her duyan di karê kombers, amûrên hejmarî û bernameyan de Nezhîh ji Bedir û Rûkenê şarezatir xuya dikir.

Dema ku Nezhîh projektor diceriband, Rûken bi ser re sekinîbû û hînî rêbaza xebitandinê dibû. Nezhîh fişa projektorê dirêjî wê kir û berê wî li kombersê axivî:

-Rûkencan, ji kerema xwe re fişê bigihîne prîzê.

Rûkenê bêyî axaftin fişa kombersê gihande prîzê; lê peyva “can” derzînkê dilê wê lerizand. Piştî qedandina hinek karên wê rojê Rûkenê ji bavê û Nezhîh pirsî bê ka dilê wan bi vexwarina çayekê heye yan na. Her duyan jî pêşniyara wê di cih de dîtin û bi tevahî li hêwana nivîsgehê rûniştin, çayek vexwarin. Piştî çayê dilxwazên nivîsgehê karê xwe yê nîvcomayî berdewam kirin û Nezhîh bi xatirxwestinekê her du li wê derê hiştin, çû mêvanxaneyê li qatê jorîn ku çenteyên xwe daynê. Nezhîh nasiya xwe da şagirtên nû, çenteyê xwe danî, nimêja xwe ya berêvarê kir û piştî çend deqeyan dîsa dakete xwarê, bav û keç di nava kar û xebatê de xeriqî dîtin; bi hatina wî re her duyan jî bêhnvedanek tercîh kirin, ji vir û wê derê axivîn. Di nava axaftinê de gotin hate ser wateyên navan; Nezhîhê ku ji her duyan zêdetir dixwend û lêgerîn dikirin derheqa navê xwe de jî çend tişt gotin. Rûken bi bihîstina van agehiyan hinekî kêfxweş bû; lê dilê wê fênanî endamêkî qerimî tevnedigeriya ku di bin ronahiya van agehiyan de bimeşe. Lewre bi xwe jî li ser înternetê li wateya peyva “nezhîh” geriya û êdî qanî bû ku Nezhîh rast dibêje. Nezhîh jî nişkê ve pirsî:

-Xwişka Rûken heke mafê navlêkirinê aydî te bûya te dê çi nav li xwe bikira?

Rûkenê li çavê bavê nihêrî û bersiv da:

-Min ê navê pîrika xwe ya Hacer li xwe bikira, lê te?

-Min ê jî navê Birûsk li xwe bikira û xelqê dê ji min re bigota Birûskê Şêx Zakir, -bi devekî ken got û berdewam kir: - Hacer navê jina Brahîm eleyhiselamî ya duyem e ku di eslê xwe de koleyê Nûbayê bûye. Dema ku heta temenkî dirêj zarokên Saraya jina wî nabin, bi xwe Hacerê ji mêrê xwe re dixwaze. Lêbelê paşê Sara jî ducanî dibe, di navbera wan de rikeberiyek derdikeve û Hacerê diqewirîne; lewre Brahîm eleyhiselam wê dibe, li Mekeyê bi cih dike.

Nezhîh piştî agehdarkirinê ji Bedirî pirsî:

-Keko, li gorî te tiştê herî balkêş ê di jiyana Hacerê de çi ye?

-Qinaeta wê ye, bi min.

-Bi min ji wê kûrtir feraseta wê ye. Ji ber ku dema Brahîm eleyhiselam wê dihêle û diçe; lê ew bi riya ji cihê xwe naleqe. Dema ku av û xwarina wan diqede kurê xwe li şûnê dihêle; derdikeve ser çiyayên Sefa û Merweyê. Wê bi feraseta xwe dizanibûye ku ev cih ne şûnwarekî asayî ye ku pêxemberekî Xwedê wê datîne wir; Lewre qet cihê xwe şaş nekiriye, hertim li wê xalê sekiniye; heta ku ava Zemzemê peyda bûye, Brahîm eleyhiselam veqeriyaye û Mala Xwedê li wî cihê ava kiriye.

Peyva “Mala Xwedê” dilê Nezhîh yê qerimî lerizand û ew bire rojên ciwaniya wî ku cara yekem keçeke biçûk bi hişê xwe yê zarokatiyê jê pirsîbû: “Apê Nezhîh maleke te heye yan na?” Wî jî li hemberî wê pirsî wê bi awayekî şaş û mehtel mabû û gotibû: “Keça rindik mala min bi xwe tune; ez hê nezewicîme, lewre li mala bavê xwe dimînim.” Piştî wê axaftinê bi çend mehan bavê Nezhîh yê gundî Şêx Zakir bi xatirê hevaltiya kurê xwe çûbû serdana bavê wê, li dikana wî rûniştibû, derheqa Nezhîh de gotibû ku dixwaze wî bizewicîne, heke keçên wî hebin bila yekê bide kurê wî; lêbelê bavê wê lêborîna xwe xwestibû ku keça wî ya mezin pênc-şeş salî ye û ji zewacê re dest nade.

Wê êvarê Rûken kete ramanekê kûr, dîsa çû ser axaftina şagirtê Mela Hisênî û çîroka Hacerê. Bi telefona xwe lêgerînek li ser înternetê kir û rastî riwayetekê hat. Li gorî zanyariyên heyî ev riwayet ji aliyê Îbn Ebasî ve hatibû ragihandin ku Buxariyî neqil kiriye. Rûkenê dizanibû ku Sehîha Buxariyî pirtûka hera muteber a hedîsan e; lewre dest bi xwendinê kir: “*Jina pêşin a ku şala*



piştê girêdaye diya Îsmail e. Da ku şopa xwe ji Sarayê veşêre, Hacerê şaleke piştê girêdaye. Îbrahîm hê di dema mêjandina Îsmailî de, ew û kurê wê yê Îsmail anîne hinda Mala Xwedê; danîne ber dareke mezin a ku li jora Mescid'ul-Heramê ye, li fêza Zemzemê. Wê heyamê li Mekeyê kesek nedijiya, avek jî lê peyda nedibû û ew li wir bi cih kirine. Hebaneke ku tê de zad û yeke din a ku tê de av hebûye ji wan re hiştiye; vegeyriyaye û çûye. Diya Îsmailî pey Îbrahîmî ketiye û pirsîye: “Îbrahîmo! Tu me li vê deşta ku ne mirovek ne jî tiştek lê heye dihêlî û bi ku ve diçî?” Diya Îsmailî çend caran bi ser de dubare kiriye jî Îbrahîmî qet li rûyê wê nenihêriye? Diya Îsmailî dîsa jê pirsîye: “Xwedê wisan fermanî te kiriye?” Gotiye: “Belê.” Wê jî: “Wisan be Xwedê bi tu awayî sipartîyan winda nake.” gotiye û vegeyriyaye. Dema ku Îbrahîm gihiştiye çiyayî; jin û kurê edî pê ve nehatine xuyan, berê xwe daye aliyê Mala Xwedê, destên xwe bilind kirine û bi van peyvên han dua kiriye: “Xwedayê min! Min beşeke zuriyeta xwe hinda Mala Te ya Pîroz a ku li deşteke bê çandinî ye bi cih kir, da ku nimêjê bikin. Wisan bike ku di nava xelqê de ji bo wan dilgermiyek çêbibe, da ku ber bi wan ve biherikin. Ji fêkiyan debarekî bide wan da ku sipasiya xwe arasteyî Te bikin.” Heta ku avdank vala bûye diya Îsmailî hertim Îsmail dimêjand û ji vê avê vedixwar. Diya Îsmailî edî tî bûbû û kurê wê jî tî bûbû. Dinihêrî ku gede dibehice, dipirpîte û natebite. Xwe ranegirt ku zarokê xwe di vê temtêlê de bibîne, dît ku Girê Safayê çiyayê herî nêzik î li kêleka wê ye. Hilkişiyayê, paşê berê xwe da deştê; da ku heke kesek hebe bibîne, lebelê kesek nedît. Ji Safayê peya bû, wexta ku gihişte deştê pêşa dêreyê xwe qat kir. Paşê jî bi reva mirovê zorpêketî reviya, heta ku ji deştê derbas bû. Paşê hate çiyayê Merweyê; derkete ser çiyê û nihêrî gelo kesekî dibîne yan na; lê kesek nedît. Bi vî awayî heft caran wisan kir. Îbn Ebas ragihandiye ku Cn. Pêxember ‘eleyhiselamî gotiye: “Ji ber vê yekê xelq di navbera her du çiyayan de reviyaye.”

Wê şevê Rûken gelekî li ser navê Hacerê, Brahîm û Îsmayîlê xwe fikirî; herwiha li ser Sarayê jî fikirî; lê di dawiyê de biryara xwe da: “Ne pêwîst e ku mêrê min yekî kal û bi navê Brahîm be, ez jina wî ya diduyan bim, ji zarokan tenê kurekî min hebe, ez û hêwiya xwe bibezine hev, mêrê min li şûnwarekî bêkes û nenas min dayne û here, bê av û xwarin bimînîm, bikevim lêgerînan û kurê min avê bibîne, li wê derê Mala Xwedê bê çêkirin...”

Rûken sibetirê dîsa digel bavê xwe hate nivîsgehê, xebitî û berêvarê xwişka wê ya Nûrê jî hate serdana wê, ew pîroz kir û demeke dirêj her du xwişk ji xwe re axivîn. Nezîh jî dîsa hate serdana Bedirî, nihêrî ku ne li wir e; xatirê xwe ji wan xwest û derket; lê beriya çûyîne dest avête bêrika xwe, pênuşeke kesk derxist, dirêjî Rûkenê kir û got:

-Bibexşîne ku ji bo destpêxêriyê diyariyeke mezin nadime te. Bextê te wekî dara maziye kesk be, karê te hertim serkeftî be!

Rûkenê sipasiya wî kir û bi laqirdîkî got:

-Diyarî mezin e; lê xwezila rengê wê hêşîn bûya.

-Hêşîn rengê şîn, girî û hesretê ye; lewre min ji bo te tercîh nekir.

-Nizanim çima; lê ez hem ji rengê hêşîn hez dikim hem jî ji hesretê.

Nezîh wekî ku wate nedabe sedema keser û hesreta wê, li bedewiya wê mêze kir, gotinên Bedirî yê derbarê wê de ku ji zewacê re dibêje “na” anîn bîra xwe; lê bersiveke rast nedît û got:

-Hêşîn rengê xweş e, hesret jî mirovî dipijîne; ez jî ji xem û keseran hez dikim, ev ne şerm e.

-Te wekî helbestvanan axiviyî kekê Nezîh.

-Bi rastî ez carinan bi navê “Birûskê Şêx Zakir” helbestan dinivîsim; lê jiyana min bi kurdî ye. Format û formulên hişê min bi vî zimanî hatine raçandin.

\*\*\*

Roj bi roj axaftinên Nezîh û Rûkenê dirêj dibûn. Cara pêşîn bi silaveke kurt, pişt re bi hêvotîneke kurt “Rûkencan” xîmê pireya axaftinê di navbera her duyan de hatibû avêtin; bi her peyvê re beşeke vê pireyê dihate avakirin û dikete xizmetê. Rojekê dîsa Nezîh hate nivîsgeha û dîsa Bedir nedît; keça wî ya Rûken kar û bar bi rê ve dibirin. Silav da, bav pirsî û nihêrî ku hatina bavê

wê dûr e; lewre munasib dît ku xatir bixwaze û derkeve. Rûken ji nava keçên heval rabû, heta hindê hat, bi xwe pêşniyar kir ku piçekê rûne, dibe ku karê bavê wê zû biqede û lez vegere. Nezîhî di pêşniyara wê de tu kêmasî nedît û xêlekê rûnişt. Rûkenê jê pîrsî bê ka ew dê ji xwe re kargehekê an jî nivîsgehekê veke ku werin serdana wî; wî jî bi bersiveke kurt got:

-Kar, kargeh, nivîsgeh li benda min in; lê min şîrkek peyda nekiriye. Pêşyan gotiye: “Beriya ku malê bikirî, cînarekî baş bibîne”.

Peyva “mal”ê Nezîhî dîsa bir bîranînên wî yên zarokatiyê ku keça biçûk dipîrsî “maleke te heye?”; lê bi lez û bez ji nava bîranînan derket. Rûkenê li ser vê kesera wî ya bêhevalî û bêcînariyê dua lê kir:

-Hêvîdar im ku Xwedê, rizqekî helal û cînarekî baş bide te keko?

-Sipas, lê malê helal ketiye devê gur xwişkê. Tu dizanî bazirganiya cîhanê ketiye asteke nû û êdî şirketên mezin ên cîhanê kar û barên xwe li ser înternetê bi rê ve dibin. Rê û rêçikên zanistî ketine xizmetê, marqeyên van şirketan li her devera cîhanê ji aliyê zagonên navneteweyî ve tên parastin. Her wiha ev şirket bi peymanên gerdûnî ji desthilatdariyan xurttir in. Mirov dikare bibêje ku hinekên wan xizmetine baş jî ji koma mirovahiyê re dikin. Ev şirket piştî ku navenda xwe dadimezrînî û rêbazên xebata xwe diedilînin derbasî deverên nêzik û dûr dibin da ku hevpişkên xwe re têkevin reqabetê.

-Rast e; lê te hê kargehek venekiriye û tu hesabê çî dikî.

-Çend sal beriya niha hin şirketên kurdan jî bi çend hilberînên xwe ve derketin holê û xwestin ku bi qasî taqeta xwe ya heyî di vê dîlana reqabetê de xwe bihejînin. Lê Roma Reş mafê patentê neda wan û neketin bazara kurdên bakurî. Gelo çima Rom nahêle bila kurd jî têkevin bazarê? Em dikarin hin sedemên veşartî nîşan bidin: Rom teyrekî goştur e. Hemû çivîk bi çêreya xwezayê zikên xwe têr dikin, lê teyrê goştur zikê xwe bi goşt û hestiyên hemcinsên xwe têr dike. Mafê jiyanê nade wan û heke bide jî xwe li wan ditelîne da ku bêhtir qelew bibin û çêjekê ji daqurtandina wan wergire.

Her çiqas keça kurdekî bû jî Rûkenê baş kurdî nizanibû; li axaftin û siyaseta bi kurdî germ nedibû; heke Nezîhî bixwesta pêwendiya wî digel wê baş be diviyabû bi tirkî pê re biaxiviya. Lewre rûniştina bi Rûkenê re ew aciz dikir; herwiha hinekî erîşkar jî dibû. Nêzîhî her çiqas hewl da ku bi zimanekî tund neaxive û hinekî kubar be jî gotinên wî mîna mîrkutan bi teqeteq bûn:

-Rom xwediyê milkekî serxur e. Hemû milkên heyî bi kêrî avadankirina cîhanê tên, lê milkê romiyên ji bo serbirîna hatiye berhevkirin. Giyotîn li Fransayê derkete ser kar û neheqên wî welatî aşt kirin, lê şûrê tatarî di erdnîgariya misilmanan de derkete ser kar û piştgirî da neheqan. Ev bedrewîştî jî derdekî wisan e ku dermanê wê jî guherandina berê şûrê wan e da ku ji bilî întiharên hîtlerî tu riyê nas nekin.

Rûkenê êdî dixwest ji axaftina Nezîhî ya tund tu tiştî nebihîze; lewre bi telefona xwe lîst, wekî ku bi yekî re diaxive ji hêwana kargehê ber bi jûra rêveberiyê ya camekan çû. Axaftina xwe ya bi telefonê wisa dirêj kir, te digot ku naxwaze were hêwanê, heta ku Nezîhî niyeta derketinê bike, bi wateya xatirxwestinê jê re destê xwe bihejîne û ew jî li pişt camekanê destê xwe ba ke ku “bi ser çavan re hatî”. Lê tiştêkî wisan nebû; di vê sekna xwe ya tenê de ji xwe re axivî: “Rom axayekî spîxur e. Wekî ku pêşiyên kurdan gotine “axayê spîxur bê xulam dimîne” îro binemala Mala Osmên bêxulam maye. Wê binemalê heyamekê umet teslîm girt, ji ber heman egerên spîxuriyê niha patika stûyê xwe dixwirîne, êdî bi xweziyên duhî ve dijî û wekî her muflisekî rûpelên deftera deynan bi ser hev de diqelibîne. Lewre ketiye pey bidestxistina deyn û dûyên ku par, pêrar û betirpêrar ên ku bi dek û dolaban dabû ser navika gelên bindest. Romiyên mal û milkê xwe hiştin û ber bi Mezopotamyayê hatin. Her mîrkokekî wan bi saya serê kurdan wekî şervanan hatin hesibandin û rîya talankirina cîhanê li ber çavên wan ên korevîşkî hate vekirin. Piştî hatin û bicihbûnê debara jiyana xwe bi mîrkujiyê ve girêdan. Heke mîrkujî ji dest wan bê girtin bazara wan kesad e. Lewre divê şahdamara wan a ku bi ked û xwîna gelan qamir û qalind bûye bi şûrê dadweriyê bê qutkirin, serweta sererd û binerd a gelan ji dest wan bê girtin da ku mirovahî bi serfiraziyê bijî.”

Rûkenê axaftina xwe qedand; lê wekî ku karê wê li ser kombarsê hebe xwe mijûl kir, di bin

çavan ve li Nezhîhî nihêrî ku bêhnefişkan li cixareyê dixwe, dest di nava por de gijika serê xwe vedirû. Tirsek kete dilê Rûkenê ku hatina hinda Nezhîhî dê rewşê diwartir bike, ew dê ji berê zêdetir êrişkar be. Bi rastî jî Nezhîhî ji hêrsan kumê xwe didirand, diranên xwe vediçirikandin û lê bû ku bibêje: “Tu dê werî hinda min ku ez kerba xwe ya qîreqîrê bişkênim; yan na ez dê herim û careke din mijarên nîqaşbar ji te re venekim.” Piştî çar-pênc deqeyên li ser kombersê Rûken ji cihê xwe rabû, bejna xwe ya rihankî milmiland û hat; lê ji bo ku berê axaftinê biguherîne li pêşberî wî rûnişt. Vê carê dixwest ku hinekî Nezhîhî nas bike; ne bi çavên bavê xwe yên dostaniyê, lê bi çavên xwe yên hevdem û çavdêr ve wî baş binirxîne.

Nezhîhî jî ev mebesta wê fêhm kiribû; dema Rûken hat û rûnişt, bi tikayeke ku heta niha jê nekiribû qehweyek xwest:

-Ez qehweyê li ser agirê daxistî çêdikim; ka dema te heye ku hinekî rawestî?

-Tiştê nabe, bila rê be dila dût be. Bibexşîne ku aciziyê didim te, lê nizamim çima piştî wê axaftina me ya beriya telefona te û çûyîna te ya li jûra camekan, tevgera min hinekî tevlihevî bû, -got û dilê xwe de axivî: “Xwedê kiriye Rûken kurdî û berdehamiya vê gotina pêşyan nizane ku wiha ye: 'bila keç be bila pîr be, bila av tê de hebe bila newala kûr be'”.

Rûkenê ji bo fikirîn û nirxandinê gotibû ku “ez qehweyê li ser agirê daxistî çêdikim”; wekî ku bixwaze hinekî baş biryarê bide: “Gelo dema qehweya xwe vedixwe kek Nezhîhî dê çi bibêje? Çima qehweyê ji min dixwaze? Heta niha gava min vexwenda çayekê pêşniyara min qebûl nedikir û bi destê xwe çaya xwe hildida, îcar çima ji min qehweyê dixwaze? Ne merivekî niyêtxerab e, lê biryara wî ya niha çi ye ku tiştê nekirî û nedîtî ji min dixwaze?”

Dema ku Rûken çû ber dezgehê mitbexkî yê li koşeyê hêwanê, cezweyê tijî av da ser êgir, agirê binî daxist Nezhîhî hê hê jî di nava nîqaşa xwe ya takekesî de bû: “Xwişkê Rom xwediyê milkekî serxur e. Kîjan gelê ku ketiye ber lepên Mala Osmên perwerdehiya xiyaretê ya li dijî gelê xwe ditiye. Devşirmeyên osmanî rasterast gelên xwe qir kirine û di pêşbirkeke gladyatorî de tecawizên nedîtî hêjayî maka xwe dîtine. Ev devşirmeyên ku serweta bav û kalên xwe radestî pencên Mala Osmên û binemala wan kirine sexbêriya hemû kirêtiyan kirine û piraniya wan jî dîsa di pêşbirkên gladyatorî de têk çûne. Wisan e ev malê bê xêr û ber serxur e, serxur. Dermanê vî derdî jî vegera li bal esl û nijada xwe ye, sexbêriya mal û milkê bav û kalên xwe û parastina vê serweta sererd û binerd a gel e.”

Dema ku Rûkenê qehwe anî û pêşkêşî Nezhîhî kir, her duyan jî tasewasên xwe avêtin û bi hêviyê ku careke din venegerine tundî û tûjiyê dest bi axaftinekê kir:

-Kekê Nezhîhî, te qala helbestên xwe dikir. Îcar bi van mijûlahiyên xwe yên bi kurdî re dixwazî bibî navdarekî kurd gelo, an mebesteke te ya din heye ku ji kesî re nabêjî.

Nezhîhî bi feraseta wê ya mijarguherandinê kêfxweşbûyî got:

-Na welleh, tenê armanceke min heye ku xizmetekê ji çand û zimanê gelê xwe re bikim. Dema ku ez helbestan dinivîsim, mirovatiya min xurt dibe; ber bi hest û ramanên bilind ve difirim. Helbest ji bo min rev ji Iblîsî ye, ji iblistiyê ye, hesteke pîroz e.

-Dizanim ku helbest li gorî daxwazan nayên nivîsandin; lê hêvîdar im ku ji bo min jî helbestekê binivîsî.

Nezhîhî dizanibû ku Rûken ji bilî pirtûkên dînî û peyamên telefonan tiştê naxwîne; lê dîsa jî pirsî:

-Bila mijar çi be?

-Bila mijareke xemgîniyê be ku carinan ji xwe re lê dinêrim.

-Keçê, mirov ewqas razemeniyê li xemê nake; xem tiştê mecbûrî ye. Tu çima qijikan xwedî dikî û berdidî çavên xwe?

-Welleh hema wisa?

-Dixwazî tu bi xwe helbestekê binivîse û ez binirxînim.

-Ez ê bi tirkî binivîsim.

-Bi Xwedê, ya min bûye meseleya namûsê, qe hişê min tev li hev neke, ez ê dema xwe nedime tiştê wisa.

-De baş e, wisan e ez ê helbesteke Seyid Qutb bi alîkariya heval-hogiran wergerînim kurdî.

Nezîhî soz dayê ku helbesta wê ya wergerandî binirxîne; dibe ku careke din neyê serdana wê. Ji ber ku ew dê hinekî bi xwe û helbestên xwe re mijûl bibe; heta Mela Hisên were çend pirtûkên ku bi xwe re anîne biqedîne. Piştî vê daxwaz û sozdanê Rûkenê jimareya telefona wî hilda ku helbesta wergerandî bi peyamkî jê re bişîne. Nezîhî xatir xwest û derkete mêvanxaneya komeleyê û wê şevê noqî nava xwendinê bû; herwiha wê şevê Rûken jî li ser helbesteke Seyid Qutbî ya bi navê “Hubel, Hubel” xebitî, li ser înternetê ji çend hevalên xwe alîkarî wergirt û wergerande kurdî. Nîvê şevê yê dereng bû tûtêtûta hatina peyamekê û Nezîh rahişte telefona xwe. Rûkenê helbest wiha wergerandibû:

Hubel ... Hubel

Hubel, Hubel! Hêmaya bêrûmetî û derewê...  
Piştî ku bi destê mêrxasan hate binevatkirin,  
îro di dilqê tixayan de vegeriya bal me.  
Bosiyên dikêşe bevilê xwe û di agirê çîrokên durutiyê de dişewite.  
Di kemendên dîlan de girêdayî ye, bi zincîrên zillet û xwefiroşiyê.  
Cihê daxê ye ku pûtek e û vê koma mirovan diajo.

Hubel, Hubel! Hêmaya bêrûmetî, nezanî û derewê...  
Hevalo ji vê komê nepirse  
bê ka parêzî, vege û daxwarin ji bo kê ye.  
Destava xwe ji wan bişo. Ji ber ku ew keriyekî beranan in.  
Xwedayê wan pûtek e û Apê Sam ji wan re hîlbijartiyê,  
dolaran li xwe dikin da ku giramiyekê ji xwe re peyde bikin.  
Hewldana wî keriyê xêvîkî ye... Peh çî qehreman in ew (!).

Hubel, Hubel! Hêmaya xiyane, bêrûmetî, nezanî û derewê...  
Belavkerên buhtanan ji pesnê aciz nebûn  
û naveroka angaştê wan di peyamên pêxemberan de nîn e.  
Tu dibêjî qey milyaket e ew; ronahî li xwe pêçaye û ji navenda esmên daketiye.  
Tu dibêjî cîhangir e ew; zanayekî îlhamgir e,  
qasidek e, zanist bi xwe ye û mamoste ye.  
Cihê daxê ye ku cureyekî nezaniyê mirovan dikeribîne.

Hubel, Hubel! Hêmaya xiyane, xwefiroşî û derewê...  
Jê re nirxên sexte hatine damezrandin û xêvikan jî ew pejirandine.  
Lêbelê azadê mêrxas tîfî rûyê derewa aşkera kiriye û ew qewitandiyê,  
Her çiqas di van heyaman de jimara azadan kêmbûye jî  
bila ewqasî têkevin zindanên tirsna, lêbelê bila baş tebat bikin.  
Her çiqas serpêhatiya hera hovane bê serê wan jî,  
ji her sitemkarekî re dawiyek heye...  
Hubel, Hubel! Ji her afirandiyê re dawiyek heye...  
Hubel, Hubel!

Piştî şandina helbestê Rûkenê hizir kir, gelo çima helbesteke helbestvanê misrî ji Nezîhî hinart; çima di dilê xwe de Brahîmekî pûtşikên digere, çima wekî Hacerê li xemê digere û xemê hembêz dike, bandora wî navê ku li xwe kir çima wê ber bi qedera Hacerê diajo? Gelo mirov navê xwe biguherîne kesayeta mirovî jî dê biguhere, çî pêwendiya wê bi Brahîm û Hacera wî re heye, gelo giyanekî wan ê hevpar heye?

Rûkenê bersiva pirsên xwe nedîtin, kesekî ku van babetan jê re veke jî li dora wê tunebû. Êdî Nezîh jî çûbû mêvanxaneyê ku destê wê nedigîştê; lewre ji xwe re got: “Te ewqasî xem dixwest, ha ji te re xem!”

\*\*\*

Nezîh wê şevê biryarek da ku êdî bi ber bayê kesî nekeve û ji xwe re pêşerojekê amade bike. Helbesta Rûkenê qala bahozên di hundirê wî de nedikir, bedewiya wê bala wî nedikişand û hişê wî yê kurdî ew bi ber bi weşanxaneyên Stenbolê dibirin. Gelo beriya ku Mela Hisên were divê Nezîh Salihliyê veqetiya û biçûya Stenbolê; ji xwe re xaniyek kirê bikira û têketa nava lêgerînên xwe yan bisekiniya heta ku mirazê birayê xwe bi cih bianiya? Di nava van xem-xeyalan de ji xew re çû.

Sibetirê peyayî komeleyê bû ku Bedir û Rûkenê nivîsgeh sererast dikirin, pirtûk li gorî babetan datanîn refan, amûrên deng û dîmenan tesele dikirin û didane xebitandin. Dema ku Nezîh kete hundir Rûken gelekî kêfxweş bû, rabû ser piyan, destê xwe dirêj kirê ku çakêtê wî hilde:

-Kek Nezîh tu bi xêr hatiyî, ka em çakêtê te daliqînin û te bidine xebatê. Çayê dixwazî yan qehweyê?

-Nezîh nehatiye xebatê xwişkê ew dê xatir ji we bixwaze û here?

-Te helbesta min dît, çawa bû, te eciband?

-Xwişkê ez î rêwî me û dema min a axaftinê tune ye ku rûnim û binirxînim. Tenê dikarim vî sozî bidime te ku ez dê bersivekê bidim te.

Nezîhî mifteyên dolab û jûra xwe radestî rêveberiya komeleyê kirin û ber bi dêrî çû; Rûken heta ber dêrî li pey wî hat û bi xeyd jê re got:

-Kek Nezîh, tu qe tiştêkî naecibînî; ne wekî birayên xwe dixwînî ne jî dest diavêjî karekî.

-Xwişkê, min ji te re gotibû ku gava cînarekî qenc bibînim ez dê jî mîna her bendeyê Xwedê xîmê jiyaneke ji xwe re biavêjim.

-Ez bibim cînarê te?

-Ka tu ne amade yî.

-Tenê du şahid û melayek pêwîst dîkin.

-Hema wisan?

-Hema wisan.

-Wisan e em herine mizgeftê, du şahidan û melayekî peyda bikin, -got û kenîya Nezîh-.

-Ew kar aydî min in; derkeve mêvanxaneyê û li benda telefona min be.

Nezîh derkete mêvanxaneyê, li ser vê bûyera bi lez û bez nefikirî, du rikat nimêj kirin, hinekî Quran xwend û bi telefona xwe kete înternetê. Dema ku Nezîhî înterneta xwe çalak kir rastî peyama birayê xwe Dr. Elî Ferhadî hat ku digot: “Tu çi dikî li wan deran?” û wî jî bersiv da ku “Li Salihliyê ye, biryar daye ku here Hewlêrê û ji xwe re kargehekê xwarinan veke”. Li ser vê yekê kekê wî peyameke kurt jê re nivîsbû:

-Nezîhcan, bismillahekê bikşîne û bixwîne. Ez nabêjim filanê bêvanê bixwîne, hema çi li ber te dikeve bixwîne, paşê jî li zanîngehekê qeyda xwe çêbike û dîsa bixwîne. Xwedê tu afirandiyî ku vê gerdûnê bixwînî, wî tu ji piçêke xwînê çêkiriyî, êdî bixwîne. Binêre Xwedê çiqasî merd e ku derfetên gerê dane te û tu bajar bi bajar, welat bi welat digerî. Êdî tewekeliya xwe bi Xwedê bîne, pênuşekê bide destê xwe û ji vê rewşê rizgar be. Dîplomayeke te ya fermî jî tune ye û wekî nezanan xuya dikî, malê dinyayê qirêja destan e ku ew jî li ba me heye. Em giştê dê bimirin û hesabê xwe bidin. Te peyama min dît, de rabe destnimêjekê bigire, du rikat nimêj bike û têkeve riya qenc. Dîsa nefizire û nereve. Heke na, ez dê gijika porê te verûm. Îcar dixwazî gazî heval-hogirên xwe bike ku bila alîkariya te bikin û ez dê jî gazî bira-pismaman bikim ku derseke watedar bidine te. Guh nede kesî, bixwîne û ji riya rast averê nebe. Heke tu serê xwe li ber fermana Xwedê xwar bikî, tu dê binêrî ku em jî stûyê xwe li ber te xwar dîkin.

Nezîh nexwest vê tikaya birayê bi şun de vegeirî û bersiv dayê:

-Baş e, ez dê xwendina destpêkî wergirim, herime Kurdistanê û di zanîngehekê de qeyda xwe çêkim. Di vê navberê de ez dê ji xwe re kargeheke xwarinên kurdî vekim û êdî li ser piyên xwe

bisekinim; lê pirsgirêkek heye ku keça Bedirî min ji xwe re dixwaze, -got û nîşaneyeke kenê danî dawiya peyamê-.

Dr. Elî Ferhad bi vê nûçeyê kêfxweş bû ku birayê wî dê bibe mal-hal û li cihekî mixê xwe biçikilîne; demildest karê dawetê hate têkûzkirin û bûk-zava gihiştin hev.

\*\*\*

-Tu çi dora min diçî û têyî? De rabe, mîna mêrê xelqê dest biavêje karekî, -got Rûkenê û rexneya wî kir-; lê bersiva wî amade bû:

-Karê min tu yî, ez hemû xebat û kariyera xwe li ser te ava dikim.

Rûkenê bersiveke ku nedipa ji Nezhî wergirtibû û got:

-Tu dibêjî ez bêîş-bêemel im; hatime û bi te re ketime devjeniyê. Ez ê rabim, der û dorê bidime hev; hema te nihêrî evdekî Xwedê derê me vekir.

-Were ez îşkê bidime te; bi navê Xwedê ez ê îro hemû îşên malê bi ber te ve bikim.

-Xwedê jê raziyo, te çi îşê bidî min? Îşê şevê li şevê, îşê rojê li rojê ye.

-Ka te hefteyek berê digot ez ê tu carî li ber te ranebim, îtîrazê ji ferhenga xwe derxim.

-Ez li ser sozê xwe me.

-Heke şaş nebim, te gotibû ez li ber te dengê xwe jî bilind nakim.

-Erê min wisan jî got; lê min belengazê nizanibû ku bîra te dezgehê dewletê ye û tu tişt tê de winda nabe.

-De wisan e hesabê xwe baş bike û bide dû min, -got berê xwe da jûra razanê-. Rûkena mehtelmayî bi neçarî pirsî:

-Nava vê nivroyê û teze çardeh roj bi ser daweta me re derbas bûne. Welleh, billeh ji aliyê me yan jî ji aliyê we hinek dê werin serdanê, zeyîfî-meyîtiyê; hişê xwe bide serê xwe ez qurban. Ma şev ketine zikê felekê?

Zavayê dehrojî Nezhî bi devekî ken got:

-Kincan dernexî jî dibe, ez ê bixebitim ne tu.

Bûka teze lêva xwe gez kir û got:

-Ez ehmeqa Xwedê nizanim çima îtîraza te dikim, çima li ber te radibim û çima dengê xwe bilind dikim? Ez kerr im, kor im û lal im; tu dê çi bikî bike!

Zavayê teze telefona xwe vekir, kete dosyeyeke nivîsê, hevoked li ser dosyeyê dirêj kir, tomar kir, şande e-posteya bûka teze û got:

-Ev demeke dirêj e ku ez nivîsanan tomar dikim. Min ê şeva pêşîn li te nîşan bida; lê paşê min wisa biryar da ku bihêlim rojêke din. Îro dinêrim ku tu dixwazî ez hinekî ji malê derkevim û tu jî êdî bi karên malê rabî; lewre dixwazim tu vê yekê bibînî. Ka mînderekê û balgiyekî dayne, ez ê serê xwe bidime ser çonga te û tu jî ji min re bixwîne.

-Te tomar kiribe niha tu dizanî te çi nivîsiye; bihêle ku kêfê ji diyariya xwe wergirim.

-Baş e, -got û serê xwe danî ser çonga Rûkenê-.

Rûkenê bi dengî dest bi xwendinê kir û hinekî şun de deng lê qiriya, biriya û kete halê ne tu halan.

Rojnivîska mêrê gelekî balkêş bû: "Bi Xwedê, min ji bo te tomar kirine. Îro fikirîm ku diyariyekê ji berdilka dilê xwe re binvîsim; lê hewesa min tunebû. Lewre min biryar da ku qe nebe xewnên xwe tomar bikim û her xewneke ku min dildara xwe tê de dîtiye li van rûpelan tomar bikim. Carekê min di xewna xwe ya yekem de dît ku li mala we ya kevn tu bi ava xortimeke kesk xwe dişoyî. Tiştê balkêş: te ava destşoka we bi kar nedianî, xortim ji derve dihate destşokê û ez li derveyî destşokê bûm. Di xewneke din min tu li Eyûba Stenbolê dîtî, te şalekî doxînsist li xwe kiribû, navika te xuya dikir, te li tirba Eyûbê Ensarî dinihêrî, piştta te li min bû. Carekê jî min tu li Agiriyê dîtî, ez û tu li firoşgeheke kincan bûn. Te cil û bergên hilawestî sererast dikirin, bi texmîna min tu li wir dixebitiyî û min xatir ji te dixwest. Min li çavên te dinêrî bê ka ji ber çûyîna min hêsir jê tên yan na? Min ferq kir ku tu bi zanatî li aliyê min nanihêrî ji bo ku hêsirên te nebînim. Min

çend carakan bangî te kir ku ez diçim, paşê te li aliyê min nihêrî, tu nedigiriyayî; tu dikeniyayî û te ji min re digot ku çima ez digirîm. Dema ku ez hişyar bûm bi rastî jî hêsir ji çavên min dihatin. Îcar di xewnekê de jî min tu li Rihayê dîtî. Em her du ji otobuseke rêwiyan peya bûn, kincên hêşîn li te bûn, min bi dengêkî gazî te kir ku li benda min bisekinî, tu nesekiniyî, tu wekî ku nebihîstiyê tevgeriyayî û te riya xwe domand. Min çenteyê xwe ji bagajê hilda û xwest ku ji pêşgîrê bi deriyê bagajê ve daliqandî yekê hildim; lê ajovanî ji dest min girt û neda. Birayekî min digot ku çima ez pêşgîrê ji ereban dixwazim, li aliyê Îranê pêşgîr erzantir in û kalîteya wan jî ewqasî ne xerab e. Min dîsa gazî te kir û te vê carê te ez bihîstim; ez û tu digel hev diçûn heman navnîşanê. Herwiha min dît ku tu li nav cimaetê jinan rûniştîyî, pîrejinek ji cimaetê rabû û gote min ku te qebûl kiriye. Min dît ku tu li nava daristanekê yî û bûkaniyeke çîl-spî li ser te ye, piştî te li min bû û te bêyî alîkariya min bûkanî ji xwe dixist. Herwisa min dît ku tu li bajarê me yî, li qûntara çiyayê li fêza me hinek malên ji xweliyê hene û tu di yekê de rûniştîyî. Te ji apê xwe re seba min digot ku “jê re bibêjin bila were tiştêk nake”. Dîsa min dît ku ez û tu li ser nivînekê bi hev re dilîzin.

Nezîh serî li ser çonga Rûkenê ji xewre çûbû û êdî hay ji xwendina wê tunebû. Demeke xurt wisa raza û Rûkenê ew hişyar nekir; lê paşê çî da hişê xwe her Xwedê bizanibe, ramûsanek li ser eniya wî danî û Nezîh ji xewê rakir. Dema ku mêrê wê çavên xwe vekirin û mizdan Rûkenê jê pirsî:

-Te dîsa xewna xwe de ez dîtîm? Êdî min rastiyê de bibîne mêrik!

Nezîhî “hi hi” got û Rûkenê jî him bi porê wî lîst him jî axivî:

-Tê bîra te gelo, te pênuşek diyariyî min kiribû? Îcar rabe, bîaqîlo rabe! Xwedê jî ez diyariyî te kirime dilpako! Dinya-alem dê bibîne ku tu ne dîn û bêhiş î. Xwedê dizane ku tu di riya rast de yî; lê gelek kes ji te fehm nakin. Guh nede tiraneyên erzan ên ku fesad û nebaş belav dikin. Rabe ser xwe û ji bo armanca xwe ya mezin bixebite; nekes û pozbilind çavnebariya te dikin. Tu li pey çîrokan neketiyî û serbilindiya te dê pozê wan dax ke. Kesên ku dexesiyê li te dikin ji bostanên xwe nexwin, baxê wan bişewite û serê sibehêkê bi hawaran gazî hev bikin ku ayîkê te ji wan re nemaye. Ji ber ku Xwedê gelek tişt dane te ku li ba hinekan tune ye tu êdî jî bo xwe tiştêkî nafikirî. Rabe ser hemdê xwe, destê keflan di bêrîkan de ye û ji bo armancên xwe sermayekê bide hev. Sermayeya te zanîn e û nezan gişt karmendên te ne; rabe, mafê her kesî lê belav bike. Êdî dema te hatiye ku ber bi welatê Cn. Yûnis eleyhiselam herî. Rabe, amadehiyên xwe yên ber bi Kurdistanê bibîne.

Nezîh rabû dest û rûyê xwe şûstin; cil û bergên xwe yên derveyî li xwe kirin û çû komeleyê ku dersên xwe ji Mela Hisênî bigire. Di riya ber bi komeleyê de ramanek bi ber hişê wî re derbas bû ku hêza helbestî ya Rûkenê bi pêş ve bibe û bi telefona destan peyamek jê re şand ku îro heta êvarê helbestekê ji bo zarokan binivîse. Berêvarê bi tûtetûta telefonê re Nezîhî serê xwe ji ser mewlûda kurmançî rakir û li naverokê nihêrî ku aydî Rûkenê ye. Li gorî gotina wê Rûkenê helbesta xwe bi alîkariya hinekên kurdîzan kemilandibû û jê re şandibû:

### **Komara Elokana**

-diyariya sersalê ji bo zarokên kurd-

Hebû û tunebû.

Li welatê bej û deryayê dûgelek hebû

û jê re digotin: Komara Elokana.

Li vî welatî

navên pînikan li gorî tîpên alfabejê lê danîbûn

û parfûmên zîrçê lê dihatin firotin.

Li wê derê

hêkên genî pîroz û karên genefisî zagon bûn.

Her wiha li wê derê

tenê qirtevirta elokana dihate bihîstin

û rojekê

roviyekî dorankurmî çav berda milkê elokana.

Lewre niçande guran û fitande kûçikan.  
Gur û kûçik girijîne hev  
û efsûna dengê elokan betal bû.  
Lewre elokan dengên xwe birîn;  
guhên xwe dan kewtekewt, zûrezûr û nûzenûzan.  
Bi vî awayî asayişa elokan berkemal bû.  
Her wiha bêdengiya elokan  
erêkirina serdestiya roviyî bû.

Şevêk ji şevan,  
ji şevên zivistanê  
-roja ku Eysa Pêxember hatibû dinê  
û filehan elok dikirin qurban-  
roviyî navê xwe danî misilman  
û êriş bir ser cûcîkên tawisan.  
Birastî roviyî dixwest ku dilê elokan şa bike  
û destnîşan bike  
ku ew ê di vê sersalê de nebin qurbanî.  
Sibeha wê şeva zivistanê  
giyanewerekî bi navê "Mirovê Çiyayî" derketibû nêçîrê  
û rastî pûrta tawisan a rengrengî hat.  
Mirovê Çiyayî heyfa xwe bi kuştina cûcîkan anî;  
rahişte tîfinga xwe û tola komkujiya tawisan hilanî.  
Bi teqîna guleyê re gur revî  
û kûçîkî zincîra bendetiyê li stûyê xwe danî.  
Paşê mirov hate ber pînika elokan û got:  
-"Di rûyê we de roviyî qira tawisan anî;  
lê êdî hûn hetanî Newrozê xurê min in."  
Di wan şevên zivistanê yên dirêj de  
mirovê çiyayî rojê elokek ser jê kir,  
bi noşîcan xwar û hestî avêtin ber segê zincîrkirî.

Sêv weşyan ji daran  
rehmet li gora dê û bavên guhdaran.

Nezîh demeke xurt li ser kûrahiya helbestê ramiya, tiştin dihatin bîra wî, wekî ku ev ramanên wî bi xwe ne xuya dikir; lewre ji hêza jina xwe kete şîkê ku wê nenivîsîbe û ji cihinan girtibe. Bi çend peyvên naveroka helbestê legerînek li ser înternetê kir; lê negihişte encamekê. Hişê wî tevlihevî bû û bi destûra Mela Hisênî vegeriya malê. Çawan di dêrî de kete hundir û silav da jê pirsî:

-Pitê, ew çi helbesteke xurt û balkêş bû? Te çawan li hev anî û kê ji te re sererast kir?

Rûkenê bi rehetî got:

-Ez qurban, ez li ku helbestnivîsîn li ku? Min ji lînûskeke te ya helbestan berhev kir, derbasî ser peyamê kir û şand. Îcar bibêje te çawan ev helbesta xurt û balkêş nivîsand ku mezin bi dijarî fêm dikin?

-Helbestvan dîn in keçê, te xwarin amade kiriye ne wisan? Va ye bêhneke xweş ji aşxaneyê te tê.

Rûken lînûska helbestên Nezîhî di dêst de hat mitbexê û got:

-Ez ê niha helbestekê bixwînim û gava qediya bibêje 'amîn' û em dest bi xwarinê bikin.



## Senaryoya Fîmekê

Ger derhênerek bûma  
min ê filmeke wiha bikşanda:  
Helbestvanekî kurd  
havînekê  
tevî komeke çiyager  
derdikeve lûtkeya Korekê.  
Dema ku çiyager dadikevin xwarê  
ew xwe egle dike û li wir dimîne.  
Mebesta wî ew e:  
li bin alaya Kurdistanê ya mezin  
hemû alayên kurdan ên biçûk biçikîne.  
Dikeve çadira xwe  
û ji termosê avê îskanek av dadigire;  
lêbelê ji nişkê ve best lê radibin,  
ava termosê bi rijdî digire,  
firekê li ava xwe dixê,  
û heyfa wî pê tê.  
Helbestekê dinivîse;  
lê nikare ristan biqedîne.  
Ji çadirê banzdide derve;  
lê bêhna wî diçike û nikare hilma xwe bistîne.  
Lewre qefesa xwe vedike,  
êdî bi germê nahese ji kerban.  
Ber bi bakur li Çiyayê Agiriyê û Elegezê dinêre,  
Komara Agiriyê û Kurdistanê Sor tîn bîrê,  
Payîzava û Laçînê êdî xuya nakin.  
Dua dike bi neçarî:  
Xwedao careke din berê me nede Çiyayê Agiriyê bi zar û zêçan!  
Me biêwirîne li gund û bajaran wekî mirovan!  
Xwedao careke din berê me nede welatên tarawgehên!  
Me ji hêz û rêza me mehrûm neke!  
Berê xwe dide rojhilatê  
Keleha Dimdimê û Mehabad xuya nakin  
Lavayî dike bi neçarî:  
Rebî bi kêfxweşiyê demkurt me şa neke!  
Rebî bi serxweşiyê demdirêj dijminan li me raneke!  
Berê xwe dide rojavayê  
û Deryaya Spî xuya dike.  
Şikir dike bi kêfxweşî.  
Di wê navberê de hevalên wî digihêjinê hinda wî  
û dipirsin bê ka çima li vir maye.  
Bersiv dide bi dilnizmî:  
Li serê vî çiyayê bilind qêriyam  
û min gazî Xwedê kir:  
Rebî mirov wekî mirîşkan tîn serjêkirin bi destê mirovan  
Rebî dewlet şer dikin li ser bacên kerxane û piyangoyan  
Rebî erd û esmanên Te tîra me gişkan dikin  
Rebî bibihîze qajewaja zarokên li zindanan tecawizkirî  
Rebî bibihîze hawara jin û keçên peymalekirî

Rebî bibîne sebra şêremêrên li qefesan zincîrkirî  
Rebî bibihîze qîrçeqîrça li ser bajarên wêrankirî  
Tu bidî xatirê yekîtiya Xwe ku me yek bikî.

-Amîn, sed carî amîn! Keçê te dikaribû piştî xwarinê jî bixwenda, -got Nezîhî û kevçiyek hilda û xwarin tevda-

Rûkenê bi beşereke xweş bersiv dayê:

-Baş e, piştî xwarinê ez ê dubare bikim.

Her du jî kenîyan bi îştahêkî fireh vepeliyan ber xwarinê.

\*\*\*

Nîvê şevê Rûkenê gazî Nezîhî kir:

-Mêrik rabe, avekê li xwe bike! Bes e ku te orxan-betanî li xwe alandin! Rabe çend rikat nimêj bike, hinekî Quranê bixwîne û pirtûkên xwe dubare bike. Şeva zîz ji bo xwendinê baş e û nava rojê karên dinyayê mirovî rehet nahêlin. Xew him serbirr e him rizqbirr e. Rabe qenciyekekê li min û xwe bike.

Nezîhî çavên xwe vekirin û jê pirsî:

-Keçê, tu bi hemdê xwe yî? Şîreta ku li min dikî çima bi xwe nakî?

-Baş e, va ye ez te hişyar dikim; heke tu rabî ez dê jî çav bidime te. Îcar ez naxwazim tu bibî mêrê li pêy jinê, rabe bide pêşiyê, tu mêr î mêr, -got Rûkenê, kenîya, xwe guhaste ser aliyê din û hewl da piçêke din jî razê.

Nezîhî betanî ji ser avête xwarê û got:

-Hûn hertim dibêjin wekhevî, de were em bi wekheviyê karekî bikin ha!

-Weylê Xwedê hiştî, te çima wisan li min kir?, -got Rûkenê û ber bi destşokê çû; paşê li xwe zivirî, destê Nezîhî girt, ji bazayê peya kir û bi wateya "fermo bide pêş" rê nîşan dayê.

Nezîhî pêşiyê çû destşokê, paşê derbasî serşokê bû; lê Rûkenê pêşiyê destên xwe şûştin, bi ser agirekî daxistî çayek da ser êgir, paşê derbasî destşokê bû û li benda derketina mêrî ma ku ew jî avekê bi ser xwe de bike.

Piştî serşuştin û çend rikat nimêjan, Nezîhî û Rûken li ser maseya mitbexê rûniştin, çay û pasteyek xwarin, her duyan bi qasî saetekê tiştin xwendin û dîsa razan.

Sibehê hê Nezîhî ji malê derneketibû ku Dr. Elî Ferhad bi telefonê pê re axivî û demeke dirêj qala çûyîna xwe ya forûmekê kir. Li gorî vegotina wî civaknasê kurd li bajarekî biyanî beşdarî semînereke profesorekî biyanî bûbû ku mijara axaftina wî li ser "Destpêşxêrî û Çanda Destpêşxêriyê" bû. Vî profesore aboriyê di gotara xwe ya pêşkêşkirî de qala destpêşxêrên Anatolyayê dikir, pergala Exîtiyê ya dewra Mala Osmên dinirxand, li ser bazirganiyê pend û şîret didan û bal dikişande ser girîngiya marqeyan. Tekane civaknasê kurd ê li vê semînerê Dr. Elî Ferhad Şanlî, bi bihîstina gotinên vî profesorî di navbera saetekê de bi qasî hezar salî mezin bû û kariyera wî ya zanistî bi qasî çend qatan ji ordinaryûstiyê bilindtir bûbû.

Dr. Elî Ferhad bi gotara vî profesorî hest, helwest û tevgera desthilatdaran a li dijî marqeyên kurdî pîvabûn. Wê hingê tê ghiştibû bê ka çima desthilatdar ewqasî ji marqeyê kurdî ditirsin, dikevin fikaran, astengiyan didine pêşiyê û dest bi hincetên kirêt dikin. Di serê sêrî de ji xwe re got: "Bi min sedemine bêtehemuliyê di vê mijarê de hene: Heke marqeyên kurdî belav bibin, nîvê kara marqeyên biyanî wê di ro de here. Wê hingê şirketên biyanî divê li gorî mezaxtina kurdan amadekariyan bikin. Heke desthilatdar patêntê bidine marqeyên kurdî dê kesadiya bazara kurdî ji holê rabe û marqeyên kurdî wê bi marqeyên cîhanî re têkevin reqabeteke navxweyî û navneteweyî."

Dr. Elî Ferhad ji xwe kete şikê, ji nav û paşnavê xwe kete şikê; ji xwendin, dîtî û bihîstinên xwe kete şikê; heta di dîn û mezheba xwe de jî kete şikê; lê bi sebreke nedîtî beşdarî tevahiya gotar, pirs û axaftinan bû. Dema ku ji salona konferansê veqetiyê gelek belavokên li ser aborî û destpêşxêriya aborî jî bi xwe re birin balafirgehê. Li balafirgehê siwar bû, ji aliyekî ve rêwîtiya wî ya ber bi bajarê wî dest pê kir, ji aliyê din ve dîrokê ew ber bi rojên hatina biyaniyan a li welatê wî

ve bir. Heta ku Dr. Elî Ferhad gihişt mala xwe ya li Yalovayê piraniya zanyariyên xwe yê heyî di ber çavan re derbas kirin; ji wan zanyariyan hinek guherandin, hinek avêtin û li şûna avêtiyan hinekên din ji xwe re peyda kirin.

Di riya ber bi Yalovayê de pêşiyê ji navê xwe kete şikê: Çima dê-bavên min ji min re dibêjin Elî Ferhad û çima di fermiyetê de Ali Ferhat dinivîsin? Çima navê wî danîne Elî Ferhad û gava vegere Ali Ferhat çi tê serê wî? Bi paşnava wî çima “şanlı”yek pê ve girêdane ku ew bi xwe neviyê serhildêrekî kurd e û kalikê wî hatiye dardakirin? Çima her tişt di qalibê tirkîtiyê de hatiye rokirin ku nasnameya wî ya kurdî ewqasî hatiye tepeserkirin?

Piştî ku gihişte Stenbolê, Dr. Elî Ferhad çûyîna bi otobêsê tercîh kir ku demekê tenê bifikire, têkiliya xwe ji jiyana rastîn bibire. Rûnişteka wî li aliyê korîdora otobêsê bû û di nava ramanên têkel de ji xew re çûbû ku bi niçandina rêhevalê xwe yê li kêlekê hişyar bûbû. Moleyeke nîv-saetê hatibû dayîn ku rêwî pêwistiyên xwe bibînin û ew jî edetê nasan peya bû. Pêşiyê ber bi destşokê çû û bi qasî du deqeyan di dorê de sekinî û kete hundir. Li ser mîza mezin tiştine sosret hatine bîrê: “Hemû dagirkerên kevn û teze dema ku dest avêtine mal û milkên dagirkiriyên qe nebe parçeyek ji bermayiya xwe avêtine ber gelên dagirkirî. Heçî ku desthilatdarên me ne g\*yê xwe jî hêjayî bindestên xwe nedîtine; lê g\*yên wan bindestan bi wan dane xwarin, qelem û şûr kişandine ser çanda wan, zimanên wan hilqetandine, rûmeta wan di bin nal û zerîpoşan de pirçiqandine û ew di xendeqan de bi agir û asîtê helandine.”

Piştî destşokê edetê kesên ku li maleke cemaetan xwendine, hertim nimêj kirine û ji pêşengê wê cemaetê re dua kirine destnimêjek girt; berê xwe da mizgefta biçûk a rawestgehê, nimêjeke seferî kir û nîvro û esir gihandine hev. Kalemêrekî tirk ku digel wî nimêja nîvro dikir zûr bûbû li Dr. Elî Ferhadî dinihêrî, li bejn-bala wî ya paqij û simbêla wî ya zirav mêze dikir, hêdfika û bi tirkîyeke nazik jê pirsî:

-Bira, heke pirs ne şerm be, te du rikat du rikat bi qasî çar rikatan nimêj kir; lê di her du rikatekê de te selam da. Li gorî kîjan mezhebê wisan dikin? Dilê xwe meke, min mereq kir.

-Apê delal bi texmîna min li gorî her çar mezhebên heq jî nimêja seferî heye û min jî wisan kir; nimêja nîvro ya seferî du rikat e û ya esrê jî wisan e; gava seferî nimêj bikî dikarî her duyan bidî ser hev û bi carekê de biqedînî.

Dr. Elî Ferhad di van gotinên xwe de kete şikê, ji bo çareserkirina vê mijarê jî di hevoka xwe ya paşîn de zû bi zû axivî û derket. Dîsa zanyariyên xwe nirxandin: “Çima gelo çar mezhebên heq? A ku dizanim di sedsala pêşîn a belavbûna îslamê de mezheb tunebûn, îcar çima 'çar'?” Dema ku biçûk bû bavê wî sireke meseleya 'çar'ê jê re gotibû: “Dîwarên Keibeyê çar in, xelîfeyên îslamê çar in, mezhebên heq çar in”. Ji bo zarokekî ev zanyarî agehiyeke pîroz bû; lê piştî ewqas salên xwendinê diviyabû delîlên xurt hebûna ku mêjîyê wî qanî bikirana. Divê zanyariyên xwe yê dînî jî tesele bikirana û di bêjîngeke zanistî re derbas bikirana. Ji xwe re got “karê te zehf e doktor” û derbasî xwaringehê bû; bala xwe da xurekan, hişê wî ji dîtbariya wan a reng-guherî nebirî û kete şikê ku kevn bin; lewre nîv nanê tisî, mastek û saleteyek hilda, heqê wan da û bi tena serê xwe li maseyekê rûnişt. Saleteya xwe bi nên xwar û bi ser de jî mast berda xwarê. Hê derneketibû derve bi anonsê hate bangkirin ku otobêsa Yalovayê bi rê dikeve û divê rêwî demildest lê siwar bibin.

Dr. Elî Ferhad bismillahek kişand û li otobêsê siwar bû; silaveke bi awayê xwendayan da mirovê navsere yê li kêleka xwe û rûnişt. Di dilê xwe de wisan dua dikir ku ev rêheval bi wî re pêwendiyên beredayî daynene ku mijarên xwe yê xweînkarkirinê biqedîne; lewre bi rûyekî tirs û qure li mêrikî nihêrî, mêrikî jî qet guh nedayê û vê yekê derfeta hizirkirinê jê re afirand.

Îcar Elî Ferhad çima kete vê rewşê? Bûyer gelekî hêsan bû; lê reh û rîşên wê wisan kûr bûn ku mirov ji mirovtiyê derdixistin. Di forûma civaknasiya navneteweyî de li ser navê Zanîngeha Şîrazê jî akademîsyenek hatibû ku bi navê profesor Keyûmersê Xalîqî li asta Îranê gelekî navdar bû. Camêrî li zanîngeheke Komara Îslamî ya Îranê hîndekarî dikir û bi awayekî xwezayî pergala aboriyê ya welatê xwe diparast. Derfetek çêbû ku Dr. Elî Ferhad û profesor Xalîqî bi hev re bibin

nas û bi hev re taştiyekê li otêla hevpar bixwin. Xaliqî bi awayekî rehet û bi inglîziyeke fesîh digot ku bi xwe xelqê Loristanê ye, ji eşîra Mamesinî ye û ji aliyê nijadî ve lorî ye; pergala aboriya îslamî ya li Îranê hevrikekî aboriya cîhanî ye ku li ser “rizqê helal” ava bûye û ji bilî wan hemû misilman “heramxur” in, divê demildest derbasî aboriya îslamî bibin. Elî Ferhadê ku di nava cimaetên misilman de mezinbûyî dil nekir ku parastina pergala xwe bike, pesna faydeyên faîzê bide, derhatên ku ji qezencên nemeşrû tîrî bidestxistin îslamî bihesibîne. Mirov dikare bibêje ku kêfa wî jî bi rexneyên vî akademîsyenê îslamî re hatibû ku tetbîqata wê di nava jiyana xwe de kiribû; lêbelê tiştêkî dilê wî diêşand. Ev akademîsyen lorî bû, ji eşîra Mamesiniyan bû ku rehên Elî Ferhadê wanî jî digihiştine wir. Dihate bîrê ku kalikê wî yê rehmetî carinan alîkariya diya wî ya heft-zarokî dikir; carinan li zarokan dinihêrî ku bûka wî karên malê bike, wî jî gopalê xwe hildida, dihate hinda zarokên hûr, ji wan re bi zimanekî biyanî lorî digotin. Her çiqas bavê Elî Ferhad di nava kurmancan de mezin bûbû, wekî gundiyekekî kurmanc tevdiageriya jî doktor bi xwe li bajêr hatibû cîhanê, bi kurmaniyeke nivco û tirkî-ingilîziyeke akademîk diaxivî; lê kalikê wî yê rehmetî tenê kurmancî û lorî dizanibû, piştî nifşa wî lorî ji holê rabûbû.

Profesor Xaliqî bi lorî û îslamîtiya xwe forsa xwe diavêt; lê belengazê Dr. Elî Ferhad nikaribû bibêje ku ew jî kurd û lorî, mamesinî û misilman e. Xaliqî carinan gelekî tûj diaxivî û digot alema îslamê heramxur e; bi baca kerxane, meyxane, kûçikxane û faîzê ku tev jî haram in zikê xwe têr dike. Dr. Elî Ferhad filmên Cuneyt Arkin ên bi rola Battal Gazi dianîn bîra xwe ku “bîzansa qehbik” birayê Battalî dibir, wekî neyarekî perwerde dikir û dişande ser wî. Xaliqiyê şîî pesna pergala û nijada xwe dida; Şanliyê sunî ne dikaribû parastina nijad û pergala xwe bike ne jî dikaribû rastiya xwe bi dilrehetî vebêje; lewre wekî ajaleke di qiloçan de kurmî serê xwe li dîwar, dar û beran dida. Di her tiştî de ketibû şikê; divê her tiştê ku lê hatiye nîşandan darizanda, carinan mehkûm bikira, carinan azad bikira û carinan bişanda temyîz û lêkolînê.

Di nava axaftina her du akademîsyenan de mijar hate ser pisgirêka kurdan jî; vê carê jî profesorî şîrazî dest bi mizemîzê kir, pêşiyê xwest parastinekê bike; lê ji ber ku dizanibû hevpişeyê wî xelqê Wana kurdnişîn e bi serbestî axivî:

-Bircan, dema ku ewropî û paşê jî amerîkiyan mîsyoner, dîplomat û leşker şandine ser gelên din ziman û çanda wan jî vejandine; da ku teşqeleyan nebînin. Her çiqas wan dagirkeran ev çandên herêmî biçûk, xurafî û çewt didîtîbin jî ji bo berjewendiyên xwe yê dîvedirêj bi awayekî zanistî ev çand dahûrandin. De bînin bîra xwe bê ka Osmanî, Sefewî û Qeceran di 800-900 sal temenê xwe yî kultêketî de çi qedr dane hebûna gelên din? Bersiv: Qe. Îro kurdnasî deyndarê rojhilatnasên ewropî û amerîkî ye; lewre gelek rewşenbîrên kurd xweziya xwe bi van dagirkeran tînin, bi min ev jî şaşiyê zarokê du şaşiyên e: Şaşiya misilmanan û derfetperestiya rojavayîyan. Rast e ev sexbêriya ewropî û amerîkiyan ji bo berjewendiyên wan bi xwe bû; herwiha bertekeke dagirkeriyê ya li dijî desthilatdariyên heyî bû jî. Dagirkeran ji bo pêşvebirina çandên bindest pir berdêl û bergind dane; beriya ku çapemeniya kurd a neteweyî derkeve holê mîsyoner, dîplomat û rojhilatnasan bazara zimanê kurdî geş kirine, danezanên xwe yê bi zimanê kurdî bi rê û rêçikên nûjen di pirtûk, kovar û rojnameyên periyodîk de weşandine. Arşîvên The Kurdistan Missionary şahid û guwahên van xebatên girîng in.

Xaliqî bi zimanê xwe yî rewşenbîrî jî ew tîk biribû; lewre Elî Ferhad bi pîrsekê xwestibû jê tiştinan hîn bibe û nezaniya xwe veşêre:

-Mamoste, heke bazara kurdî piştgiriye ji marqeyên kurdî wergire û rabe ser piyan gelo ew dê bikaribe zûtir piyeyan di navbera kurdên derveyî sînorên heyî de ava bike û ber bi xweseriyeke aborî ve here, ji zagonên paytextan rizgar bibe?

-Bi min kurd hînî hilberînê bibin dê ji koçberî, mexdûrî û penaberîyan xelas bibin. Dê herin ser karên xwe yê li nava bajarên xwe. Herwiha gelek qadên xizmetan ên valabûyî dê ji karmendên xwecihî re bimîne. Li vir pîrsgirêk ne “kîjan polîtîka bikêrhatî ye”; mijar kûr e û mirov dikare navekî wiha lê bike “kîjan polîtîka ji desthilatdariyê re bikêrhatî ye”.

Van axaftinan, van dîtinan, van bihîstînan aborînasê kurd Dr. Elî Ferhad Şanlî serobino kiribû; berê wî dabûn Yalovayê; lê bêrika wî tijî pîrsên bêbersiv kiribûn ku diviyabû heta dawiya

temenê xwe li ser bixebite, herwiha deriyan li ser piştê bihêle ku li pey wî jî xebat bêne meşandin. Piştê vê forûmê dilê wî wisan dikişande Loristanê, eşîr û zaravayê wî ku diviyabû bernamêyekê ji bo van hestên xwe jî amade bike; kesera dilê xwe yê bêarmanc bişkîne, rûgeheke nû bide cîhana xwe ya badilhewa çûyî.

Piştî guhdarîkirina vê bûyerê Nezhîhî ji kekê xwe yê bêmehe pirsî:

-Keko bi rastî te baş kiriye ku beşdarî vê forûmê bûyî. Îcar di hişê min de jî hebû ku biçim Kurdistanê, bixwînim û kargeheke xwarinan a bi navê Kurdish Kebab vekim; piştî ku vê marqeyê tomar bikim ez dê bikaribim li gelek welatên ereb û ewropayî şaxên marqeya xwe bifroşim an jî bi xwe ji dûr ve bimeşînim.

Dr. Elî Ferhadî xwest ku piştgiriya bide ramana birayê xwe:

-Pêşniyar û ramanekê baş e; ne dûrî aqilan e. Marqeyên biyanî yên navdar jî eynî wisan kirine û piştî xebatên bi salan êdî li her dera cîhanê şaxên wan hene.

Li ser vê yekê Nezhîhî got ku ew dê piştî demeke kurt derbasî Stenbolê bibe, li kurseke navê xwe binivîse, hînî soranî bibe û ber bi xeyalên xwe ve bimeşe. Kekê wî bertek li ramana wî nîşan neda û tenê pirsî:

-Tu dê bûkê jî bi xwe re bibî yan na?

-Helbet di sêrî de ez dê nebim wir û ji dê-bavên wê neqetînim. Ez dê li rewşa kursê binêrim, heke zêde bikêşe ez dê lê binêrim; lê gava bi demkurt be ez dê li cem hinek hevalan bimînim û her hefte carekê herim-werim.

-Tu dizanî biracan, tu êdî ne di temenê hêvotinê de yî; lê ji bîr neke ku tu teze zewiciyî û mafên jina te li ser te hene, -got Dr. Elî Ferhadî û bi xatirxwestinê telefon bi ser de girt-.

Dema ku Nezhîhî jî telefona xwe girt û kire bêrika xwe Rûken li ber derê hêwanê bi ser re sekinîbû û got:

-Va ye te planeke din jî kiriye ku haya min jê tune; wey bêbexto tu dê bi ku de herî û bûka desthenne li benda xwe bihêlî?, -got, kenîya û berdewamî da axaftina xwe:- Mêrik ji min nekeve şikê bê ka ez razî me yan na, ez li pişt te sekinîme û dibêjim ber bi xeyalên xwe ve here. Êdî te daye ser riyekê divê berdewam bikî.

-Malî ava, ez ê jî vê qenciya te hertim bişêkirînim, -got û ber bi dêrî meşiya ku êdî derkeve-.

Rûken heta ber dêrî hat, çakê wî girt ku li xwe bike, Nezhîhî sipasiya wê kir û got:

-Madem tu nikarî helbestan binivîsî, qe nebe kurteçîrokekê binivîse. Bila mijara çîrokê Mem û Zîn be; lê bila kesekî biyanî lêkolînekê li ser bike. Tu dikarî ji înternetê sûd wergirî û gelek beşan tenê wergerîni, hinek motîfên kurdî bi kar bîni, gotinên pêşiyar biavêjî navê û hinek agehiyan jî derbarê lêkolînerî de bidî.

-Ka xwe lê daynim, dibe ku bikaribim; lê pirsgirê ew e ku min ê îro hinekî bixwenda. Nizanim çima; lêbelê îro îştahê min î ecêb ji bo xwendinê heye û min ê çîroka Ristemê Zalî bixwenda.

-Tu dikarî wiha jî bikî: hinekî çîrokê bixwîne û dema ku tu aciz bûyî hinekî jî binivîse. Bila ji çar-pênc rûpelan derbas nebe, ez tenê dixwazim ku tu hînî xwendin-nivîsandina baş bibî. Zêde zehmet nede xwe, agehiyan ji înternetê berhev ke û tenê baş bi hev ve girêde.

-De ka, -got Rûkenê, mêr bi rê kir û vegeriya hêwanê-.

Rûken hinekî rûnişt, plana xwe ya rojê danî: ew dê pêşiyê rabûya fera-fotik biavêtana feraşoyê, kincên qirêj biavêtana cilşoyê, avê li destşok û serşokê bireşanda, di vê navberê de jî çîrokek di serê xwe de bisêwiranda û paşê dest bi xwendina xwe bikira. Rûkenê di navîna saetekê de hemû karên plankirî tamam kirin û derbasî xala paşîn bû ku xwendina çîrokê ye; bi îştahê fireh heta nîvro bênavber xwend û nîvroyê navberê dayê. Rabû çû destşokê, derbasî serşokê bû destnimêjek girt û paşê vegeriya mitbexê; ji xwe re qehweyek çêkir, dema vexwarinê li ser çîroknivîsinê hinekî xwend û dest bi amadekirina firavîneke yekkesî kir. Nezhîhî piranî nîvro nedihate malê û firavîna xwe ligel Mela Hisênî li komeleyê dixwar; lewre Rûkenê xurekekî sivik ji bo xwe amade kir û vê carê dest bi çîroka xwe kir. Demeke serê xwe bilindkirinê û fikirînê, Rûkenê anî bîra xwe ku nimêja nîvroyê nekiriye û bi lez rabû nimêjê. Piştî nimêjê bi bêhneke fireh li ser çîroka xwe

rûnişt; lê nihêrî ku nivîsandina wê ne baş e û gelek şaşiyên dike, herwiha rastnivîsa wê naşibihe pirtûka ku dixwend. Lewre biryar da ku bi tirkî binivîse û gava Nezhî were, jê re devkî bi kurdî bibêje.

Piştî nimêja mexrebê Nezhî vegeriya malê, li zengila dêrî xist; bi vebûna dêrî re silav da, kel-melên di destê xwe de dirêjî Rûkenê kirin û bendikên solên xwe vekirin. Pêşiyê derbasî jûra razanê bû, kincên nava malê li xwe kirin û hate hêwanê. Bi devekî ken got:

-Bi texmîna min te nikaribû binivîsiya; lewma te tiştêk ji min re neşand. Dibe ku min çar-pênc caran jî e-poste û hesabên xwe yê civakî kontrol kirin; lê tiştêk nehat û min got qey Rûkenê ji bîr kiriye.

-Na, min ji bîr nekiriye; lê min çîrok bi tirkî nivîsî û ez ê devkî bi kurdî ji te re vebêjim. Bi vî awayî ji min re hêsatir e.

-Çima te nikaribû bi kurdî binivîsiya? Min ê sererast bikira û rewşa wê bida hev.

-Îcar ji te re kar derket, divê tu rastnivîsê û hinek rêbazan hînî min bikî. Beriya ku herî Kurdistanê divê tu vê kêmasiya min ji holê rakî. Di xwendinê de pirsgirêka min tuneye, lê dema nivîsinê hinekî dijwar e.

-Baş e, bila vê carê wisan be. Ji îşev pê de ez ê hinekî bi te re eleqedar bim. De guhê min li te ye, vebêje.

-Dixwazî em pêşiyê xwarinê bixwin û li ser çayê ji te re vebêjim, -got Rûkenê û ber bi mitbexê çû ku destexanê amade bike.

Piştî şivê Rûkenê çayek danî navbera xwe û mêrî; îskan tijî kirin, bi çavan dest bi xwendinê kir û bi dev vegot:

### **Qulapanî**

*Roja 1ê Îlona 1939an ji bo Lehistanê, ango Polonyayê rojêke reş bû. Digotin ku hêzên faşîstî yê hitlerî û komunîstî yê sovyetî ketine nava xaka welêt û serdanpê dagir kiriye. Faşîst û komunîstan der û dor wisa girtibûn ku derfeta revê nedabûn kesî; herwiha heke bireviyana jî wê bireviyana ku derê? Lê Zygmunt û Anatol reviyân.*

*Bajarê Wroslawê di destê hitleriyên de bû û Serheng Mayer zarokên porzer û çavşîn li kampeke taybet didane berhevkerin Li vê kampê pêşiyê zarok hînî almanî dikirin û paşê dişandin nava Almaniyayê. Êdî li wir di nava malbateke alman de wekî almanekî mezin dibûn. Bi vî awayî gelheya almanan zêde dikirin. Navê kampê “Olîmpiyada Şopgeran” bû; lê gelê herêmê di nava xwe de jê re digotin “Olîmpiyada Faşîstî”. Du birayên çûr û çavkesber Zygmunt û Anatol jî anîbûn Wroslawê; ew ne xelqê bajêr bûn, ji gundekî Krakovê anîbûn vê derê. Zygmuntê hevde salî ji xwendinê û Anatolê panzde salî ji çalakiyan hez dikir. Rojêkê di darsa werzişê de qulopanî bi zarok û ciwanan dane avêtin û qulopaniyên Anatolî pir kêfa rahênerî anîbû; lê kêfxweşiya xwe bi zimaneke leşkerî û kenekî nepen derbiribû:*

*-Anatol, em ê te bişînin Berlînê; ew der paytext e û cihê azmûnan e. Ka bila fermandarên min balîstîka qulopaniyên te binihêrin, bê ka tu dê bibî qehremanê cîhanê yan na?*

*Vê gotinê hêviyeke tirsnak kiribû dilê Anatolî, ji ber ku çûyîna wî dihate wateya veqetîna ji kekê wî. Herwiha Zygmuntî jî ji xwendinê xwe yê curecureyî baş dizanibû ku dagirker malbatan parçe dikin, wekî gurê ku dikeve ser cendekê nêçîra xwe. Ew ji qirkirinê, ji hovîtiyê têr nabin; divê hertim bixwin, parçe bikin, hestûyan ji wawîkan re bihêlin.*

*Di nava van fikr û ramanan de bi hev şewirîn û biryar dan ku birevin, heta li ku çûye birevin... Gava hatin girtin, jixwe êdî îradeya wan pere nake; lê piştî girtinê jî dê danexwin, li ber xwe bidin û ...*

*Li ser vê biryara serhişk, ji Wroslawê ketine riyeke nediyar û berê xwe dane rojê. Lêbelê ji aliyê hişmendî û tivdarekan ve Zygmunt ji Anatolî serxwetir bû. Lewre hinek nan, çend qutî konserve, du qurtoyên avê, du şerbikên bi qulp, du kêrên mezin û diduyên cêban, du pens û çend*

paçik kibrît peyda kirin. Her du birayên dildar, pêwistiyên riya nediyar li hev pareve kirin û berê berbangê dest bi meşê kirin. Bi rastî ew di riyan de nedîçûn û ji dûr ve riya şoşê dişopandin. Bi ser Katowice û Krakovê re heta Rzeszowê hatibûn; lê şênîyan digotin ku heke ber bi rojê herin ew dê bikevin nava sînorê Ûkraynaya Sovyetê. Li gorî zanyariyên Zygmuntî her çiqas ber bi başûr ve biçûna ew dê bigihîştana welatên germ; lewre ji Rzeszowê berê xwe dane riya başûrî bi ser bajarokên Iskrzynia û Duklayê re gihîştin Tylawayê. Lêbelê şênîyên Tylawayê jî digotin ku piştî çend kîlometroyan êdî sînorê welêt diqede.

Li vir her du birayan biryar dan ku êdî sînoran nas nekin û ber bi başûr ve bimeşin, ji ber ku encama dagirkeriyê tunebûn bû. Hêvî tenê li dervayî dagirkeriyê hebû û şanseki rizgariya wan li wir bû. Diviyabû her duyan di navbera rîska tunebûnê û hêviya xelasbûnê de hilibijartinek bikira, daristan bi daristan biçûna heta ku bigihîştana welatekî germ. Piştî çend mehan bi ser Slovakya, Romanya, Sirbistan û Bulgaristanê re gihîştibûn Yûnanistanê; lê sermaya payîzê her ku diçû girantir dibû; lewre divê zû bi zû bigihîştana erdekî germ û lê bisitiriyana. Li nêzikî Sûfliya Yûnanistanê derbasî bejahiya Trakyayê bûn; lê piştî çend kîlometroyan ew hatin girtin; bi qasî deh rojekî li Ipsalayê hatin rawestandî. Gava diyar bû ku radestkirî lehistanî ne, ew şandin Polonezkoya Stenbolê da ku binihêrin bê ka bi rastî jî lehistanî ne, yan na.

Polonezkoy, ango gundê lehistaniyan li Beykoza Stenbolê ye û berê navê wê Adampol bûye. Piraniya lehistaniyên heyama Osmaniyê li vê derê hatine bicihkirin û her du bira jî li vê derê êwirîn. Zygmunt û Anatol êdî ji xwe re cihekî ewle dîtibûn û dest bi xebatê kiribûn, zewicibûn, bûbûn bavê zarokan. Piştî 27 salan, ango sala 1967an ji hatina xwe her du birayan biryar da ku ji xwe re erseyekê bikin, bi keda xwe ya salan erseyeke fireh kirin; lê xwediyê erseyê tapû nedida. Cengizê Laz -bi hinceta ku dewlet mafê tapûyê nade lehistaniyan û divê heta derketina qanûnekê sebr bikin- dil hebû ku pereyên her du birayan bixwe û li ser tapûyê jî rûne. Lewre piştî fîrotana erseyê û hilgirtina pereyan li aliyê Lewendê ji xwe re avahiyek standibû, mala xwe bar kiribû wir.

Zygmunt û Anatolî şopa wî gerandin û di dawiyê de li taxeke lazan ew dîtin; lê bi zorê û qanûnê standina tapûyê ne mumkin bû, divê sebr bikirana. Piştî salekê ji vê bûyerê qanûnekê kete fermiyetê ku mafê tapûhildanê dida lehistaniyan; lê dîsa Cengizê Laz bi hincetên hîç û pûç heta sala 1970î her du bira ji wî alî birin û anîn; guhastina milkiyeta erdê egle kir. Qesbende digot heke bibin misilman û navên misilmanan hildin, karmendên dewletê dê zûtirkê karê wan biqedînin; ew dê jî wekî diyarî ji kîsê xwe neqla zimetê çêbike.

Zygmunt û Anatolî reva xwe ya ji dagirkeriyê anîn bîra xwe û li riyeke dîtir digeriyan. Divê hinek pere bidana mafyayekî û bi darê zorê tapûya xwe bîstandana; jixwe astengiyeke ku pêşî li wan bibiriya jî nemabû. Li mafyayên ku bi bihayekî erzan dixebitîn geriyan û navê Idrîsê Kurd dihate kişandin. Bi pîrs û lêgerînê şûna wî peyda kirin û doza xwe jê re vegotin û her du aliyan li ser nîrxekî maqûl li hev kir.

Piştî lihevkerîyê û standina qismekî pereyan Idrîsê Kurd xwarinekê jî da her du birayan û ew şandin. Dilên her du birayan pirtepiirt bû ku mafya jî pereyên wan bixwe, wekî ku lazî tapûya wan xwar. Lê wisa nebû, piştî hefteyekê Cengizê Laz çû cem her du birayan, xwe avîte bextê wan ku bi lez û bez tapûya xwe hildin ser navên xwe. Şaş û mehtel mayî her du bira çûne tomargehekê, milkiyeta erseyê derbasî zimeta xwe kir, çûne rêvebiriya tapûyan û karên xwe gişt qedandin. Dema wê yekê hatibû ku pereyê mayîn jî bidin Idrîsê Kurd; lê ji mirovên wî daxwaz kirin ku bi destên xwe radestî wî bikin, sipasiyeke taybet pêşkêş bikin.

Mirovên Idrîsê Kurd her du bira biribûn meyxaneyeke li Aksarayê, li wê derê pere radestî wî kiribûn, xwarineke xurt pêşkêş wî û merivên wî kiribûn. Li ser maseyê suhbeta Idrîs, Zygmunt û

Anatolî geş bûbû. Idrîsî qala hatina xwe ya ji Qersê, rewşa welatê xwe, pêwistiya karê xwe kiribû. Her du birayan jî qala reva xwe û êwirîna xwe ya li Stenbolê kiribû.

Di dawiyê de Idrîs qismekî pereyan bexişande birayan û dikir ku rabe; lê destê xwe da ser milê Zygmuntî û pirsî:

-Îcar tu çima reviyayî? Ma tu li welatê xwe bimayî baştir nebû?

Zygmuntî hêdika serê xwe bilind kir û got:

-Reva min jî dişibihe reva te, tu ji Qersê hatî û piştî çend salên belengaziyê gihiştî asteke wisa ku gelek kes ji te re dibêjin “bavo” û karên ku berpirsên vî welatî nikarin bikin tu dikî. Wekî ku tu bûyî hêvî ji bo me, wê çaxê rev jî hêvîya rizgariya me bû.

Idrîs beşeve hat, li bin simbêlan ve kenîya û got:

-Ew bavên “li ser erdê” ne û ez jî bavê “li bin erdê” me. Lê ji bîr neke ku her gav bavekî li ser erdê dikare meqama me ya li bin erdê bi merzelekî li ser navê me tapû bike. De baş e ku hûn sitirîn, bi xatirê we, haaa bereket li kîs û keysa we be!

\*\*\*

Navê Idrîsê Kurd ji aliyê malbatên her du birayan ve bi başî dihate kişandin û Nadejdaya keça Zygmuntî paşnavê wî yê Kurd pir meraq dikir; lê ji ber çî sedemê be nepirsîbû bê ka kurd kî ne. Bi rastî hînî pirsnekirinê nebûbû; ji ber ku navê wê yê tirkî Dilek Kurtulan bû; di nava malbat û gund de kesî qîma xwe bi vî navê qulebî nedianî, ew hertim Nadejda, ango “hêvî” bû. Lê piştî du-sê salan baxvanekî kurd ji bo paletiyê demkî hatibû cem wan û ji wan re dixebitî. Li gorî gotina baxvên, wî li dibistaneke kevneşopî ya kurdî xwendîye, hinek helbestên helbestvanê kurd ji ber dizane û piraniya kurdên Tirkiyayê li rojhilat û başûrê rojhilatê welêt dijîn. Nadejdayê xwe negirt û pirsî:

-Ma li derveyî Tirkiyayê jî kurd hene?

Baxvên li dora xwe nihêrî û got:

-Belê, bihîstina ku min bihîstîye li Êris, Îran, Iraq û Sûriyayê jî hene.

Nadejdayê ji vê bersiva kurt têr nebûbû; lê ji nihêrîna baxvên a dor û berê fêm kiribû ku mijara pirsê ne tiştekî ewle ye, divê meriv dev jê berde an jî li cihekî ewle biaxive. Rojekê Nadejdayê derfeta axaftinê dîtibû û hinek helbestên kurdî digel wergera wan a tirkî jê guhdarî kiribûn. Lê çîroka Mem û Zînê, bi taybetî jî encamê dilê wê gelekî êşandibû.

Sala 1975an Nadejda bûbû mamosteya fîzîkê û diviyabû pêşiyê li bajarekî rojhilatî peywirê bike. Piştî ku du salan li bajarê Cizîrê mabû û hinekî hînî kurdî bûbû, bi becajişê çûbû Bazîdê. Bi rastî xwestibû ku here wî bajarê ku çîroka Mem û Zînê lê hatibû tomarkin; berhemeke bêhempa jê hatibû afirandin.

1979an dema ku li Bazîdê bû, şoreşeke îslamî li Îranê pêk hatibû û piştî salekê jî li Tirkiyayê cûntaya leşkerî dest danîbû ser desthilatdariyê. Li gorî ku ji ciwanên kurd dibihîst her du tevgeran, şoreş û derbeyê kurd kiribûne hedef; lê ew dê li ber van zordestiyan danexwin. Alozî li kuçe û kolanan hebûn, leşkeran der û dor pêçabûn. Nadejdayê reva bav û apê xwe anî bîra xwe, lê ew dê bi ku de û bi kê re bireviya.

Rojekê di nava van fikaran de hate polê, ji xwendekaran xwest ku pirtûkên xwe vekin. Dest bi şîrovekirina waneyê kir; lê baldariya wê li ser ciwanekî bû ku çavên wî yê şkestî li mamosteyê nedinihêrîn, tenê şîrove zû zûka dinivîsîn. Mijara “hêz”ê gelekî bala xwendekarî kişandibû, her gotineke mamosteyê tomar dikir. Êdî çavên Nadejdayê yê kesber ji ser xwendekarî ranedibûn û ciwanî piştî waneyê silav da mamosteyê:

-Mamoste, dinihêrim ku di nava xwendekaran de hertim çavên te li ser min in. Îcar ez di xwe



de ketim şikê, gelo şaşiyêke min hêrsa te aniye, yan gotineke çewt ji aliyê min de ghiştîye te?

-Nexêr, bi rastî baldariya te bala min dikêşe. Wisa dewam bike, hêvîdar im ku tu dê serkeftî bî.

Ciwanê pola dawîn Serhed bi dilekî kul got:

-Sipas mamoste, hêvîdar im hêjayî zehmetê we bim, -û kete ramanên kûr, zivirî nav hevalên xwe; lê mehdeyê wî serobino bûbû-

Êvarê bêmehe li ser sifreyê rûnişt û di ramanêke kûr de noqbûyî xwarina li pêşiya xwe dixwar. Ev tevgera wî bala diyê kişand û ji bin ve jê pirsî:

-Îro kîjan dersê te hebûn lawo?

-Du saet fîzîk hebûn; zimanê tirkî, bîrkarî, jînnasî û biyolojî jî yek saet bûn.

-Fîzîk dersa pêşîn bû?

-Na, dersa paşîn bû, lê hinekî zor bû.

-Lewma wisa westiyayî û bêmehe yî, ne wisa?

Serhedî kevçiyê xwe hêdîka danî û berê xwe da diya xwe ku ji tirsên xwe re çareyekê bibîne:

-Dayê, mamosteya fîzîkê jineke ciwan e. Heval gişt qesbende pirsî jê dikin ku bidin axaftin; lê ez bi baldarî dersa wê guhdarî dikim. Nizanim, bi rastî ditirsim ku tirkperest be û ji serketina min aciz be. Çend mamosteyên tirknijad hatine vir, îlam ji xwendekarên serketî aciz bûne. Çareyek divê.

-Tu xema wê yekê nexwe, ez û bavê te em ê germîgermî sibehê werin dibistanê û wê nas bikin, rewşa te hîn bibin, nê-meremên wê bipîvin.

Serhedî bi kêfeke nedîtî xwarina xwe ya nîvcomayî berdewam kir û çû odeya xwe ya xebatê.

Sibetirê dê-bav hatin dibistanê, mamosteya fîzîkê dît, piştî hevnasîn û çend pirsên derbarê Serhedî de ew vexwendin malê ku berêvarekê bibe mêvana wan. Nadejdayê bi rûyekî sar pejirand ku roja şemiyê nîvro were mêvandariyê û axaftina xwe li wir bidomînin; lê niha divê bikeve dersê û xatir ji hev xwestin.

Roja şemiyê Dilşaya diya Serhedî li nêzikî jîngeha mamosteyan sekinî û bi banga melayî re Nadejda ji avahiyê derket. Dilşayê carekê li dora xwe nihêrî û xût berê xwe da mamosteyê; beriya ku bikevine çarşiyê silav dayê û got:

-De kerem bike, em bi vê riyê herin.

Dilşa û Nadejda di rê de ji vir û wir axivîn û dema ghiştine baxçeyê fireh ê malê, sûra dorê ya hinekî bilind û darên mêweyan hest û rehetiyêke bêdawî lê peyda bû. Dilşayê bi kurmancî keçeke deh-duwanzde salî hêvot û jê re got:

-Keçê gazî Serhed bike bila bi mamosteya xwe re eleqedar be, heta ku min çay amade kir.

Bi vê axaftina kurmancî re êdî Nadejda lê bû ku bifire û ji keçikê re got:

Ji min re jî şimikekê û cilikekê bîne ku ez hinekî li bin daran rûnim, min bêriya dar û baxçeyan kiriye.

Dilşa zivirî ser Nadejdayê, hinekî dilmayî got:

-Keçê tu çiqasî zalim î, te çima ewqas rê ez bi tirkîyeke şkestî dame axaftin, te çima rengê xwe belû nekir, de kerem bike ez ê werim.

-Ez ne kurd im haaa, ez bi xwe hîn bûme; herwiha ne tirk im jî.

Dilşa lê zivirî ku tiştê bibêjê, lê şikberiya Serhed a maqûl, derbeya leşkerî ya pêkhatî û biyanîtiya wê ya nediya hatin bîrê; wateyek neda tevgera wê ya sivik û tenê got:

-Li rehetiya xwe binêre, a niha tîm.

Keçikê ji mamosteyê re şimik anîn, xwar bû û bi destekî danî ber piyan; cilika piçûk a li binçengê raxiste bin dareke qeysiyê ya bilind û sîdar. Çend deqe şun de Serhed hat, merhebatî da

mamosteyê li ser çîmen rûnişt û dîsa axaftin vegeriya tirkî. Dema ku diyê siniya îskanan û tebeqçeya şêkir danîn navberê, tevî axaftinê nebû û vegeriya taxima çaydankê jî anî. Bi qasî deh deqeyan li wan guhdarî kir û Nadejdayê nişkê ve got:

-Metê bi texmîna min, te got ku vê mamosteya tirk rik kutaye kurê min yan jî çav berdayê loma te gazî min kir, ne wisa?

-Welleh çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê veşêrim hema wisan e.

-Îcar em ji serî de hildin: Ez ji ku kurdî dizanim ku ne kurd im? Bi rastî beriya ku ez werim vir, ez li Cizîrê bûm. Mirovên wê derê gelekî xwîngerm in, xwendekarên min ên keç carinan ez gazî ser banan dikirim û em berêvaran rûdiniştin, diaxivîn. Dawiya hefteyan em diçûne seyrangehên wan ên rengîn û comerd, a wisa ez hînî kurdî bûm; lê kurdiya min ji bo axaftinên rojane ye. Ez bi xwe ne tirk im jî, malbavana min ji Lehistanê hatine û li Stenbolê bi cih bûne. Tu li navê min ê tirkî nenihêre, ez lehistanî me.

-Dibe ku tu tirk bibûyayî tu dê ewqasî bi rehetî nehatiyayî malê, te yê ji jorê de li me binihêriya, sipasî bikira û fermî tevbigeriya.

-Îcar mijara nihêrîna min a li kurê te û baldariya min a li ser wî jî... Ka Serhed li vir e şerm dikim.

Serhed îskana li destê xwe di nîvî de hişt û kerr rabû, bi gavên giran meşiya ku çend tiştan bibihîze; lê diyê got:

-Lawo alîkariya Zelalê bike ku piştî nîv saetê xwarina amadekirî bînin; bila selete û tiştên pêwîst ew bîne, lê qoşxaneyê tu bîne.

Dema ku Serhed êpêcekî dûr ket, Dilşa li benda axaftina Nadejdayê ma; bi rûyekî sar û mereqdar sekinî, lê mêvana wê qala wê mijara şermê nekir û wiha dest bi axaftinê kir:

-Li Cizîrê hewa ji vir germtir e, jiyana civakî berêvaran geş dibe û têkilî nêziktir in. Zimanekî wan î tûj heye; lê dilên hev naşkênin. Haaa vê yekê jî bibêjim, kesek di bin mineta gotina kesekî de namîne, îlam bersivêkê didine hev. Dem mîna şerabên wan ên xweş dibihure. Hey dinihêrî ku nîvê şevê ye û hewa hênîk bûye. Êdî dema razanê ye û her kes li ser banan radizê.

Dilşayê nexwest ku ji mijara Serhed dûr bikeve û got:

-Welleh mamoste em gundî û eşîrî ne. Lê êdî me Bazîd ji xwe re hêlîn girtiye û li vir hewa hênîk e. Li vê derê jin ne bi rojê ne jî bi şevê tu carî li derve ranazên; lê mêr carinan nava rojê di bin siya daran de radizên. Jinên me nizanin bê ka çêja şeraban çawa ye; hema wisa dizanin ku heram e û merivan serxweş dike.

Wekî ku ji vê gotina xwe poşman bibe, Dilşayê bi zimanekî henekî wiha berê gotinê zivirand:

-Keçê, ew welat gelekî germ in; ma nabîni stranên wan gişt li ser jin, şerab û taximê sîng û beran in? Welatê me yê jorîn sar e; stranên me gişt li ser mêrxasiyê û şeran in. Ma nanihêrî Serhedê min çi qasî hêmin û rûsar e? Heçî ku bavê wî ye, eynî mîna vî çiyayê han ê Agiriyê hertim serî bi dûman e...

Li vê beşa axaftinê Nadejdayê xwest ku jê bipirse bê ka çawa mêrê xwe nas kiriye, çawa zewicîne û hinek tiştên jinane...; lê çiviyê wê sist bûbûn; biyanîtiya xwe û eşîrtiya mazûvanê anîn bîra xwe û galegal wergerande ser zimanekî perwerdekariyê:

-Heçî ku Serhed e, ciwanekî cuda ye; tevahiya xwendekarên kurîn bi min re dikevin laqirdiyan û ew bi cidiyeteke ku ne hêjayî temenê wî ye dersê dişopîne, çavên wî tim şkestî ne. Derûniya wî gelekî mereq dikim.

-Rast e, Serhed ciwanekî eşîrî ye û hinekî jî dîndar e, lewma wisa dûr disekine.

-Li ser dîn tişteke xwendiyê?

-Li cem melayê gund heta mewlûdê xwend û piştî ku me beriya sê salan koçî bajêr kir jî havînan li dibistaneke kevneşopî ya kurdî xwend; lê êdî ji bo zanîngehê xwe amade dike, hema tu bibêjî ku xwendina xwe hişk kiriye.

Nadejda bi peyvên “mewlûd” û “hişkkirin”ê serwext nebûbû; lê wisa texmîn dikir ku xwendina wî ya erebî û kurdî baş e. Her du jinan gelek mijar hildan û danîn; hey nihêrîn ku hêdî hêdî xwarin tê ser sifreyê. Êdî dev ji axaftinê berdan û amadehiya xwarinê kirin. Li ser sifreyê, Nadejdayê ji nişkê ve pirsî:

-Serhed, diya te got ku te dibistan xwendiyê. Ma te Mem û Zîn jî xwendiyê?

Serhedê belengaz soromoro bû û ev pirsê derheqa mijareke eşqê de mêjiyê wî çelqand:

-Min dibaceya wê xwendiyê, lê neketime nava serpêhatiyê.

-Li ba te heye? Ji bîr nekî ku piştî xwarinê bînî û hinekî ji min re bixwînî.

-Baş e mamoste.

Piştî xwarinê bi qasî niv saetan Dilşayê zebeş da anînê û Nadejdayê jî Dîwana Mem û Zînê. Serhed tevahiya Dîbaceyê bi meqamkî jê re xwend û got:

-Mamoste, bibexşîne, ji min heta vir e. Ji wê pê de min nexwendiyê; lewre bi meqamkî nikarim bixwînim, lê dikarim rasterast geh bi şaşî geh bi rastî ji te re bixwînim; ji ber ku wateyên gelek peyvên edebî nizanîm.

Nadejdayê bi baldariyeke neditî guhdarî dikir, peyvên nenas jê dipirsîn; carinan bersiv werdigirt û carinan jî bi ser re gav dikirin. Bi banga nimêja esrê re dev ji xwendin û şîrovekirinê berdan; êdî dema çûyîne bû.

Ji riya taxê heta nava bajêr, Nadejdayê rewş, gotin û tevgerên mazûvana xwe pîvandî, nîrxandin û bi jinên Cizîrê re berawird kirin. Dilşayê jî hewl dida ku bigihêje sedemên vê xwîngermî, rastbêjî dîlnizmiya mêvanê.

\*\*\*

Dema ku Nadejda zivirî jîngehê êdî heyama rofirînê bû. Beriya vegera xwe, li pastexaneyê yekane ya bajêr piştî şîrînahiyekê çayek vexwaribû û cixareyek kişandibû. Di nava dûmana cixareya xwe de li ser berdewamiya Mem û Zînê fikirîbû. Gelo bi Serhedî re bizewiciya, ew li zanîngehê bida xwendin û bişanda dibistana kurdî da ku bigihêje naveroka pirtûkê? Gelo bi melayekî ciwan re bizewiciya û bi riyeke kurt bigihîştê armanca xwe? Gelo li vir bima û hêdî hêdî nas û dost çêkirana, bêyî ku bi zewacekê ve were girêdan mereqa xwe zelal bikira?

Dema ku gulma paşîn li binika cixareyê xist û di xwelîdankê de damirand, pê hesiya ku çavên garson û çend mîrên rûniştî li ser wê ne. Ji ber ku di vî bajarê biçûk de rûniştina li van deran ne edetê asayî bû. Hanzûka rabû ser xwe, heqê xwarin û vexwarina xwe da û ber bi xanûmanê mamosteyan ve meşiya.

Li ser kolanê çend cendirme bi hev re digeriyan, pêşiya ciwanan dibirîn û nasnameyên wan tessele dikirin. Li koşeyekê çend polêsên bi cil û bergên fermî sekinibûn û li rûyên hatî-çûyîyan temaşe dikirin. Di siwareyekê de du mirovên ku nedişibîne bazîdiyan rûniştibûn, ajokarî bi bînefişk cixare dikişand û di destê yekê de amûreke ragihandinê ya bêtêl hebû. Wisa xuya dikir ku her du jî bi dîtina vê bejn û bala stenbolî kêfxweş bûbûn; çiqasî dixwestin ji siwareyê peya bibin û bi qesda pirsîna nasnameyê çend giliyan jê hildin ku şûna wê tesbît bikin.

Nadejda bi gavên lezgîn gihiştibû jûra xwe, beriya ku çenteyê xwe dayîne çendekî piştî xwe spartibû dêrî û paşê hatibû ser hişê xwe yê rojane. Cil û bergên xwe yên derveyî bi yên navmaleyê re guherandibûn û deverûyî xwe avêtibû ser textebendê nivînê. Bi qasî çend kêliyan bêdeng û bêraman rawestiya û wergeriya ser piştê. Çavên xwe kutane arîgê kilskirî, di hişê xwe de gerand ku

rabe ser xwe û fenerê pêxe. Lê beriya ku rabe ser xwe, di ber xwe de wiha nehvirand:

-Ax bavo, we li pêşberî olîmpiyada faşîstî çend qulopaniyên balîstî avêtin û hatin derketin Stenbolê. We pîrsgirêkeke xwe bi kurdekî da çareserkirin û vê tékiliyê ez anîm, derxistim welatê wan. Min li cem wan beşeke dîwana eşqê xwend û nizanim ev eşqa nîvcomayî dê min bi ku ve biajo?

Piştî ku pilteya fenerê pêxist, hate ber paceya ku li Çiyayê Agiriyê dinihêrî. Gotina Dilşayê ya ku mêrê xwe dişibihande vî çiyayê pîroz hate bîrê û di ber xwe de kenîya. Vê carê berdewamiya nehvirandina xwe di dilê xwe de wiha derbas kir: "... ev eşqa nîvcomayî dê min bi ku ve biajo? Dê min biajo hînbûna vê civakê û wêjeya wan. Serhed ê jî mezin bibe, li şûna bavê xwe yî mîna vî çiyayî bigire û Zelal ê jî mîna Agiriya Biçûk hevalpişta wî be. Heçî ku ez im wekî Dilşayê gotî:

Tevn û teşî çi pêşe ye?

Qulopanî çiqasî xweş e."

Piştî ku Rûkenê kurteçîroka xwe qedand li çaya pêşiya xwe nihêrî ku sar bûye; rabû, îskana xwe valayî lavaboyê kir, piçek av bi ser çaya rijandî de berda ku kevîrê wê zer nebe, dîsa vejeriya hêwanê û îskaneke nû ji xwe re tijî kir. Nezîhî jê pîrsî:

-Min gelek mereq kir bê ka te çawa ev çîrok hûna û armanca te ya veşartî çi ye?

-Ji destpêkê de bibêjim: Min navê wê qulopanî danî ku demekê wezîrekî tirk çûbû Erzeromê û kalemêrekî jê re gotibû "Wezîrê min, ez zehf ji te hez dikim." û bersiva wezîrî wiha bû: "Ez ê çawa bizanibim ku tu bi rastî ji min hez dikî? Ka qulopaniyekê bike!" Gelo vî kalemêrî qulopanî bikira dê asta hezkirina xwe nîşanî wezîrî bida bi texmîna te? Em bibêjin ku dikaribû qulopanî bikira û kir jî, gelo vî wezîrî dê hezkiriyê xwe çawan xelat bikira?

Nezîh demekê sekinî û paşê bi ken bersiv da:

-Wî deh qulopanî bikirana jî dê tenê destê xwe li pişta wî bixista û bigota maşallah tu hê xurt î, te çi xwariye ku wisa xurt mayî?

Rûkenê him gotina mêrî nîrxand hem jî berdewamî da pîrsên xwe:

-Te dît, wê dîsa bi pirsekê hêviya wî kalemêrî bişkanda û bixwesta ku agehiyekê jê birûçkîne. Îcar em werin ser mijara Polonyayê: dema ku me li dibistana amadehiyê dixwend min spartekek li ser dagirkirina Polonyayê amade kir û hinek agehiyên min hebûn; lewre min bi qasî zanîna xwe ev pêşek çîlovîlo kir.

-Baş e, şibihandînek di navbera dagirkirina Polonyayê ya salên 40î û Peymana Qesra Şîrînê de heye, -got Nezîhî û li benda berdewamiya nîrxandina wê rawestiya-

Rûkenê nihêrî ku Nezîhî naaxive û bi texmîna ku li benda wê ye nîrxandina xwe domand:

-Îcar diyar e ku her du bira Zygmunt û Anatol bi çalakiyên xwe bala dagirkeran dikêşin; lewre li gorî çemk û feraseta dagirkeriyê divê ev gul û sosinên xweşik ji ax û warên xwe bèn qetandin, ji ber ku pere dikin jî bèn firotan an jî diyarîkirin. Rahêner jî wisan dike û dixwaze van gulan biqurçimîne, dayne guldankekê, hinek av berde ser û pêşkêşî kiriyarekî bike; lê hesabê bendeyan û Xwedê li hev nagirin, Xwedê pifî ruhê wan ê azad dike ku bifirin, bi kul û rencê digihêjin cihekî ewle û dest bi jiyaneke keddariyê dikin.

Nezîhî li vê derê mereqeke xwe veneşart û pîrsî:

-Îcar çima erseyê xwe bê pîrsgirêk nikarin wergirin?

-Ji ber ku li her derê rewşa penaberan wisan e; ew tenê dikarin bijîn-bixwin-vexwin-razên, bi gotineke din bi zikekî têr û bi yekî birçî serê xwe bikin qulikekeke ku nîşanî wan dane, lê nikarin bibin xwedî milk û hertim kirêkar in.

Nezîhî niyêta çûyîna xwe ya li Kurdistanê di hişê xwe re derbas kir: "Gelo ez dê nikaribim li wê derê ji xwe re mal û dikanekê bi binecihî bikirim?" û nişkê ve ji Rûkenê pîrsî bê ka karê şagirtê mafyayên mezin Idrîsê Kurd di vê çîrokê de çi ye û çima qala rewşenbîrekî kurd nekiriye? Rûkenê kenîya û got ku ew dekorek e û sedema wê jî wiha eşkere kir:

-Mafyayên mezin, cimaetên berbelavbûyî û şirketên gewre li ser pişta dewletan bihêz û xurt dibin; îcar tenê dimîne ku şagirtê wan jî destûrekê ji xwe re bistîne, li gorî cîhana mafyayê ya tundkar-tedhîşkar divê dîplomaya hêza xwe pêşkêş bike, bi çend bûyeran navê xwe ragihîne û

têkeve ezmûnan, ezmûneke wî jî ev penaber in.

Nezîh ji cihê xwe rabû, destê Rûkenê girt û rakire piyan; hinekî bi porê wê re lîst, paşê pêşniyar kirê ku nîqaş û nîrxandinên xwe sibetirê bidomînin, niha nimêjên xwe bikin û razên.

Li ser nivînê Nezîhî çavên xwe kutabû arîgan û li xalekê dinihêrî ku Rûkenê jê pirsî:

-Nezîh, ez gorî, heta niha min ji te nepirsî û dixwazim pîrsekê ji te bikim.

Bêyî ku çavên xwe ji wê xalê dişopîne rake Nezîhî bersiv da:

-Fermo, kulîlka min diduyan bipirse? Lê tu carî ji min nepirse bê ka ez ji te hez dikim yan na? Sedema wê jî nepirse!

Rûkenê zimanê xwe gez kir û pê re nekete nîqaşê û pirsî:

-Tu çima heta vî temenî nezewiciyî; mal-milkê te jî şikir heye, hîn ciwan xuya dikî, her çiqas te zanîngeh nexwendibe jî bi têra xwe zana yî?

Nezîhî xwe wergerand aliyê jinê, destê xwe bire nava keziya wê, tiliyên xwe ji nav ra birin û hişkehişk girt. Rûkenê hew zanibû ku dê lê bide, dijûnekê jê re bibêje û jê bixeyide; lê Nezîhî tiştêkî wisa nekir, ji bo ku bala wê bikşîne ser gotinên xwe jê pirsî:

-Ji dil dipirsî? Heke vê mijarê wekî benîştêkî dicûyî û dema ku pûç be tu dê biavêjî qe min nede axaftinê.

-Na, ez gorî, bi dil û can dixwazim, -got Rûkenê serê xwe da sîngê wî yê pirçomirço, pirçek bi diranên xwe girt û kaş kir-

Nezîhî destê xwe hêdîka ber bi lêvên wê bir û got:

-Ax, keçê te laşê min êşand; lê bila bêşe ku yadgariyeke vê pirçaşkirina te jî di hişê min de bimîne. Îcar em werin ser pîrsa te: ez î ciwan bûm, komeke me ya hevalan hebû, me ji xwe re pirtûk dixwendin û xeyalên gelekî paqij dikirin. Di vê navberê de min dibistana amadehiyê dixwend û bûme dildarê keçekê.

-Ma pîr bedew bû? -Rûkenê pirsî û dexesiya xwe eşkere kir-

-Li gorî hevalên xwe ewqasî ne bedew bû; lê min jê hez kiribû û îcar nizanim çima min jê hez dikir jî? Piştî demekê ez ji bo gerê çûme welatekî û çendekê nehatim. Hevalekî min -î ku ne ji koma me ya xwendinê- peyamek şand ku dildara min mêr kiriye û bila li karê xwe binêrim, li ser wê hesaban nekim. Min jî wisan kir; min gera xwe berdewam kir, dilê xwe ji gerê rehet kir û paşê vegeyam. Hevalekî min î nêzik ku huqûqeke me hebû û hurmeta min digirt serpêhatiya şûkirina dildara min wiha kurteve kir: Dema ku tu çûyî, hevnasînek di navbera bijîjkekî kurdnijad û koma we de çêdibe; ji bo meqama wî ya bijîjkiyê hevalên we gelek teqleyan diavêjin û di dawiyê de bavê dildara te qanî dikin ku keça xwe bide wî. Bi rastî dilê van hevalan hebûye ku peredar û meqamdarekî bigihêjînin xwe destê xwe xurt kin; lêbelê wekî encama her xiyaretê zava bûkê hildide, diçe û tenê betlaneyan de tê serdana wan. Bi kurt û kurmancî fîra mirîşkê heta ber derê kadîne bûye; lê xwediyê mirîşkê bi kêrekê li bendê bûye ku serê wê jê bike.

Rûken ji bo vê evîndariya dilsoj hinekî aciz dibe û mereqeke xwe derdibe:

-Dema ku tu vegeyayî te çi kir?

-Qe.

-Çawa qe? Tu hîn bûyî ku hevalên te dildara te daye mêr û xiyaretî li yadgara te kiriye. Îcar tu hatî û dîsa bi wan re rûniştî û te xwe bênamûsiyê danî?, -got Rûkenê, ramûsanek li rûyê wî yê bi hêsiyan şilbûyî da û li xwe mikur hat-. Ezîzê min, bibexşîne, pizik di zimanê min de derkeve ku min dilê te şkand.

-Te rast got, hiştûn û dengnekirin cureyekî bênamûsiyê ye; ji xwe hedîs jî wisa dibêje: “Kesê ku li hemberî zilmê raneweste û têkoşinê nede şeytanê bêziman e.”

-Wisan e te bi awayekî tiştêkî kiriye.

-Belê, min mijar vekola, telefonî keçikê kir û pirsî; wê jî got ku “êdî ev rûpel hate girtin, careke din li min negere û ji kesî re jî nebêje ku tu bi min re axiviyî; tiştê çû mede dû”. Min gura wê kir, neda dû; lê bi xwe tam sêzdeh salan sekinîm ku li min vegere. Min ji xwe re got: “Dibe ku mêrê wê bimire, yan jî navbera wan xera bibe û wê berde”.

-Heke vegeriya te dê qebûl bikira û dîsa wekî ku tiştê nebûye pê re bizewiciyayî?

-Belê, heke di nava wî sêzdeh salî de vegeriya min ê bêpirsgirêk qebûl bikira; lê paşê min biryar da ku êdî vegere jî ev zewac dê nebe.

-Çima sêzde sal û çima ew biryar?

-Bi rastî ez dereng bi xwe hesiyam, ez wisan xemgîn bûm ku piştî sêzde salan bi ser xwe de hatim. Îcar tu dizanî çawan bû? Rojekê min li cihekî xwend ku Cn. Îsmayîl eleyhiselam soz daye yekî ku li derekê hev bibînin; lê gelek sal derbas dibin ku mêrik nayê û ew hertim hatiye civanê, dema ku pêwistiyeke wî çêbûye jî kesek daniye şûna xwe. Paşê mêrik rojekê ji wir re dibihure û dibîne pêxemberê Xwedê hê li wê derê ye û bexşandinê jê dixwaze ku li ser sozê xwe nesekiniye. Loma nasaveke Cn. Îsmayîl eleyhiselam jî sadiq e, ango rastgo ye û Xwedê bi Xwe ev nav lê kiriye. Min belengazê Xwedê ji wî jî derbastir kir, wisa texmîn dikim, -got Nezîhî û hewl da ku êdî razê; lewre li ser aliyê xwe yê rastê wergeriya, kete xeweke kûr-.

\*\*\*

Nêzikî berbangê Rûken ji xewê hişyar bû û gazî Nezîhî kir ku rabe û avekê bi ser xwe de bike:

-Nezîh, hema hema berbang e, avekê bi ser xwe de nakî?

-Temam, bang hatiye xwendin û sibe zelal bûye?, -got Nezîhî û çarşev li xwe aland, her du destên xwe kirin bin balgiyî-

-Na, hê ji bangê re niv saet maye; delalê min rabe, lingê şeytên bişkîne û ji nava nivînan derkeve, avekê bi ser xwe de bike û gazî min jî bike.

-Îcar çima hertim ez didim pêşiyê? -got Nezîhî û dîsa xwe melisand; lê Rûkenê ew gidgidand û han dayê-

-Delalê min Xwedê serê te daye tu bidî pêşiyê, paşî ji te re qedexe ye, de tu dizanî.

Nezîh wergeriya aliyê wê, kenekî xweşik pê girt û got:

-Ji Xwedê re şikir ku karê pêşiyê daye min û divê beriya bangê vî karê xwe bikim, -got û kete henekan-

Piştî henekan êdî xewa Rûkenê jî reviya, ji nava nivînan rabû, ji Nezîhî kiras û derpiyên paqij ji dolabê hildan, danî ser kujiyêke bazayê; wê gavê cara yekem bû ghiştibû baweriyekê ku cil û bergên paqij mehdeyê mirovî vedikin, wî zindî û têkoşer dikin, wî bi giyanekî nû berdidin nava eş û janên jiyane. Ji ber ku gava alarma saeta kar û xebatê lêxist, êdî dijwarî dest pê dikin, her du piyên mirovî dikevin soleke teng. Mirovê ku baweriyêke wî tunebe, di nava çiqas mal-milkî de be jî nikare dilê zarokê şad bike, jiyana kesekî xweş bike û tenê ji bo berjewendiyên xwe difikire. Ji ber ku ew guh nade dû wijdana xwe jiyana wî wekî dojehekê derbas dibe, çiqasî bifikire û bipîve jî, birû û bijangên xwe rake-daxe jî, rûyê xwe tehl-tirş bike jî, dîsa qure û pozbilind dibe û nikare bigihêje rastiye. Helbet mirovê bawermend ne remlavêj û cadûbazek e, nikare ji derdê her kesî re dermanekî bibîne; her kêşeyê bi hokûs-pokûsekê çareser bike; lê ew dikare fêm bike, dojecha dilê mirovan bi aveke hênîk sivik bike. Dema ku Rûken ghişt wê baweriyê ku paqijî mirovî zindî dike, ev ramana xwe berfireh kir û li ser gelek şeweyên paqijiyê hizir kir, paqijî-qirêjî berawird kirin.

Nezîh di destekî de pêşgîreke biçûk porê xwe ziwa kir û bi destekî jî pêşgîra mezin dişidand; li ser vê tevgera wî Rûken keniya û tinazeyên xwe pê kirin:

-Doxîna xwe hişk bigire, gava bikeve tu dê gunehkar bibî.

-Ez ê te gez bikim ha! Dema misîne alimekî dişkê digirî, jina wî ya mîna te qerfok dipirse bê ka çima ji bo misînekî ewqasî li ber xwe dikeve; alim dibêjê ku ji zaroktiya wî xencî vî misîni tu bendeyê Xwedê cihên wî yên şermê nedîtine. Biaqila min, madem ku min daye ser riya aliman divê bişibihim wan.

Rûkenê dest bi stûyê wî re bir û bêfila xwe li bêfila wî xist, dîsa laqirdiyek kir:

-Bide dû aliman, gayê nav golikan! Bi texmîna min golik mineta xwe ji gayê malê nagirin ne wisan?

-Jixwe divê zarok bêminet û azad mezin bibin, piştî ghiştinê hêdî hêdî berpirsiyarî li wan bê barkirin. Wisan nebe di demeke kin de tevahiya zarokan wekî sewzeyên hormonî gir dibin û doza mafên girbûna xwe dikin; di rastiye de çemk û feraseta wan hê jî zarok e. Tu çima tiraneyan bi min dikî îro?

Rûken tirsîya ku dilê Nezîhî bişkîne, ji ber bêxemiya xwe têkeve nava gurmîja êgir, heta ku bi xwe bihese nozdeh cara bibirije. Bi rastî Nezîh jî gava hêrsa wî were dilê wî vedigere dojehekê, dojeheke wisan bi zêrevanan parastî ku milê kê bigirin bêpiyarî diavêjin nava holepîtan; lewre dev ji henekan berda, lêva xwe gez kir, ji dilê xwe yê sext re kete şerekî dijwar. Ji xwe re got, divê ez pirtûka destê wî bikêşim, pêbawer bim û dudiliyê nekim. Pirs û henekên zêde ji baweriya mirovî re nerind in; divê mirov ji her tiştî nepirse, birfina pakbûyî neherişîne û xwêyê bernedê. Jixwe Xwedê daye vî mêrikî û bi ser de rijandiye; madem ku dev ji berhevkarîya zêdetir berdaye û ji xwe re tîp bi tîp hîn dibe, divê mirov bi xap û teleyan pêşiyê li wî nebire. Alim hertim xwe leşkerê Xwedê dihesibînin û mirovan hişyar dikin, ji bo ku jiyane têkûztir bikin.

Nezîh jî nihêrî ku Rûken gelekî tirsîyaye bi ber dilê wê ve hat:

-Em bendeyên Xwedê ne, wekî şev û rojê ne; carinan ji hedê xwe derbas dibin û dilên hev dişkênin. A girîng ew e ku em zû ji çewtiya xwe vegerin û tiştê lewitî paqij bikin. Ji bo mirovan tiştê herî dijwar xwerexnekirin û xwekemilandin e, bi gotineke din berpirsiyarî ye. Divê mirov bizanibe ku her dem û li her derê berpirsiyar e. Ji bo wê gotina xwe li ber xwe nekeve, ji Xwedê re şikir em her du jî bawermend in, ji bo hev qenciyê dixwazin; lê amûrên me cihê ne û divê em hev neêşînin.

Piştî ku Rûken jî ji serşokê derket pêşgîr li por alandî û bornoz lixwekirî çû mitbexê, çayek da ser êgir û vegeziya, cil û bergên xwe li xwe kirin. Porê xwe hinekî ziwa kir, dîsa vegeziya mitbexê, çay dem kir û porê xwe nîvziwakirî şikinand; paşê du îskanên çayê û yeke avê li ser siniyê rêz kirin, hate hêwanê ku Nezîhî tesbîhata nimêja xwe dikir. Rûken vegeziya jûra biçûk a ku wekî pirtûkxaneyekê dixebitandin, lénûsk û pênuşek hilda, hate hêwanê, çay tijî kirin û bi xwe jî nimêja xwe ya berbangê kir.

Dema jin û mêr li ser çayê hatine ba hev Nezîhî pirtûkek dixwend, Rûkenê jî qe nexwest bala wî bikşîne û li fêza rûpelê wêneyê dilekî tîrlêketî xêz kir. Paşê her duyan çayek digel kateyekê xwarin, piştî dersa xwe ya pêşîn a kurdî dîsa vegeziyan nava nivînan û heta ku rojê penc veda erdê razan.

Ji nişkê ve veciniqîn, her duyan jî bihîstin ku him li dêrî didin him jî li zengilî. Nezîh rabû, reviya ber dêrî û ji qulikê re li derve nihêrî ku bavê wî Şêx Zakir û xezûrê wî Bedir li ber dêrî ne, dengê mirovekî jî ji pişt ve tê. “Ya bi xêr” got û derî vekir ku kesê nediyar jî Mela Hisên e. Meriv hildane hêwanê, çû destê bavê û rûyê xwezûr; dest da destê seydayê xwe û xêrhatîniya tevahiyan kir.

Şêx Zakir bi bejna xwe ya telhîn û dirêj li hêwanê rûnişt, bi destê yê rihdana xwe ya çîl-qerqaş xwirand û gopalê di destê xwe yê çepê danî kêleka xwe; Bedir û Mela Hisên li qenepeyekê rûniştin. Dema ku Rûken hat, çû destê xezûr û bavê, ji Mela Hisênî re jî got “Seyda bi ser çavan re hatî” Nezîh li piyan bû û ji nişkê ve Şêx Zakir got “kurê min destşoka wê kîjan e” û Rûkenê da pêşiyê, destşok lê nîşan da, şimika wî rast kir û got “fermo”. Şêx Zakir piştî derketina ji destşokê berê xwe da mitbexê, çû cem bûkê, xêleke xurt li ba rûnişt, hal-xatirê wê pirsîn û laqirdiyek kir:

-Wan salên han Nezîh hevaleyê jê re gotibû “kuro tu çima nazewicî ma fişengê te qediyane?”, ji Xwedê re şikir va ye ew jî zewicî û êdî tivinga wî jî fişengan diavêje; lê nizanim li armancê dide yan beytû diçin?

Rûken soromoro bû, bersiv neda û hindik mabû ku qehweya li destê xwe birijîne; piştî qehweya xezûrî sê qehwe jî birin hêwanê û dîsa vegeziya cem mitbex. Şêx Zakir qehweya xwe vexwar û derbasî hêwanê bû; her sê camêrên li hêwanê jî qehweyên xwe qedandibûn û sohbet dikirin. Şêx Zakir dest bi axaftinê kir:

-Kurê min di nava lez-beza dawet û dîlanê de me derfeta sohbetê nedît ku biaxivin. Xwedê

hebîn e, armanc û bernameya te ya piştî zewacê çi ne? -got û li benda axaftina kurê xwe ma:-

-Bavo, rûyê min bi ber piyên te be, hema min van rojan xwe daye xwendinê û dixwazim herime Kurdistanê; him bixwînim him jî marqeyekê ji xwe re tomar bikim, -got Nezîhî û zêde dirêj nekir-.

-Xwedê xêr bike kurê min, ez ji karên te zêde fehm nakim; lê hê ku dixwîni tefsîreke Quranê ya biçûk jî bixwîne û bila têkiliya te bi Xwedê re hebe. Înşaallah tu dê paşê tefsîrên mezin jî bixwîni; lê pêşiyê bizanibe ku Xwedê ji te re çi dibêje û paşê jî binêre bê ka Pêxemberê Xwedê eleyhiselat û weselam çi kiriye. Malê dinyayê qirêja destan e.

Şêx Zakir gopalê xwe da destê xwe û rabû ser xwe, ji Bedir û Mela Hisênî re got:

-De em rabin!

Nezîhî lavayî bavê kir ku îşev bibe mêvanê wî; lê Şêx Zakir bi dengê qalind tekez kir:

-Kurê min Xwedê mala te ava û tijî bûk-zava bike; karê me heye.

-Ez benî, karê we çi ye? Te ewqas rê daye ber xwe û hatiyî vir û nebî mêvan qe dibe?

-Dibe û baş jî dibe. Îcar te got karê we çi ye? Em ê digel mela û xezûrê te herin bajarê Sardê.

Welleh ev projeya komeleyê ciwaniya min û rojên min ên silûskê anîn bîra min; ez îşev li vir im, bernameyeke me ya tesewifi li komeleyê heye, tu û bûk jî mêvanên min. Ha ji bîr nekim ku bibêjim: îşev silûska me piştî nimêja şevê dest pê dike, heke tu û bûk dikarin xewa xwe ya îşev biherimînin fermo beşdarî me bibin.

Bedirî tiştê negot; lê Mela Hisênî hewl da ku sedema betalkirina dersa îro jê re şîrove bike:

-Nezîhcan, îro betlaneya te ye; lê hêvî dikim ku bi xanima xwe re derbas bikî. Min ji feqî û şagirtan re jî gotiye ku dersên xwe dubare bikin; paşê derkevin û hinekî ji xwe re bigerin. Em ê digel Şêx bernameyeke baş ji êvarê re amade bikin.

Bi xatirxwestinê re hatin-çûyîna mêvanan bû xewneke şevê; lê Nezîhî û Rûkenê li bernameyeke taybet li hev kir: dê heta nîvro li ser kurdî bixebitîyana, piştî nimêja nîvro derketana parkekê hinekî bêhn vedana, berêvarê vegeyriyana malê, nimêj bikirana û dest bi şanonivîsînê bikirana. Nezîhî dixwest ku hêza Rûkenê ya pexşan-nivîsandinê bi hevokên kurt xurt bike û feraseta wê ya kurdî biguhêze nivîskî-devkî.

Nezîhî û Rûkenê pêşiyê dest bi rêzimana kurdî kir, beşa destpêkê ya taybetiyên zimanê kurdî qedand û hewl dan ku şanoyek binivîsin. Li gorî axaftina wan divê helbestvanekî suhatî û xeyidî dîsa vegeandana helbest-nivîsandinê ji bo xatirê zarokan:

### **VEGERA HELBESTVÊN**

*PÊŞKÊŞVANÊ KURDISTANTV'YÊ: Gelî temaşevanên hêja, her wekî hûn jî dizanin em her hefte nivîskarekî kurdî dikin mêvanê xwe û li ser edebiyata kurdî bi wî re hevdişînekê li dar dixin. Mêvanê me yê vê heftiyê jî helbestvan û nivîskarê navdar Qelenderê Nêço ye. Qelenderê Nêço niha li Îspanyayê dijî û dev ji edebiyatê berdaye. Televîzyona me bi riya telefonê xwe gihande wî û sozê hevdişîneke wergirt. Li ser vê yekê nûçegihanê me yê Barselonayê Rizgarê Xido bû mêvanê mala wî. Li wê derê li ser navê me jê pirsî û wî jî bersiv da pirsên me. Fermo, hevdişîna me ya bi Qelenderê Nêço re temaşe bikin!*

*RIZGARÊ XIDO: Apê Qelender, li ser navê KurdistanTVyê ez sipasiyên xwe pêşkêşî cenabê te dikim. Te demêke dirêj xizmeta edebiyata kurdî kir û paşê ji ber çavan wînda bûyî. -Ji bo ciwanên me yên ku te nas nakin- gelo tu dikarî xwe bidî naskirin.*

*QELENDERÊ NÊÇO: Ez jî sipasiyên xwe pêşkêşî KURDISTANTV'yê dikim ku ez hêjayî vê bernameyê dîtîme. Belê, ez Qelenderê Nêçoyê Keleşkî me û di sala ku Şerê Kir dest pê kiriye de li Payîzavayê hatime dinyayê. Niha Romê navê gundê me daniye Çiftlik. Berê gundê paytextê Komara Çiyayê Agiriyê bûye. Piştî ku şer diqede mala me tê Bazîdê û ez li vir mezin dibim. Bazîda kevn li hinda Keleha Behlûl Paşê bû û ez hetanî bîst saletîya xwe li wê derê mam. Paşê ez zewicîm û min mala xwe anî Bazîda niha. Erê birayo, ez niha jî li devreyî welatê xwe û li vî biyanistanê me.*

*RIZGARÊ XIDO: Apê Qelender, te kengê dest bi nivîsandinê kir; kîjan berhemên te hene û te çima dest ji nivîsandinê berda?*



*QELENDERÊ NÊÇO: Dema ez xort bûm min dest bi nivîsandîne kir. Bi rastî wexta ku min di Medreseya Bazîde de dixwend ez rastî helbestên Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî hatim. Min jî wê hingê bi uslûba wan dest bi gotina helbestan kir. Paşê min hinek pirtûkên şerîetê xwendin û min jî çend heb pirtûk nivîsîn. Di salên şêstî de ez tevî malbata xwe hatim başarê Şamê. Piştî mirîna Mîr Celadetî jî ez hatim welatê Katalonyayê, vî bajarê Barselonayê û hê hê jî li vir im.*

*RIZGARÊ XIDO: Apê Qelender, me digot niha tu li vir cil û bergên kurdî li xwe dikî. Lê me dît ku te kincên ewropî li xwe kirine. Heke tu van kincan li Kurdistanê li xwe bikî her kes dê bi te bikene. Ma li vê derê kurd tunene?*

*QELENDERÊ NÊÇO: Kurd hene; lê hindik in. Tu dizanî ez çima ez hatime vir. Welatê Katalonyayê tu carî serweriya îspaniyayê qebûl nekiriye û gelên vî welatî serxwebûna xwe xwestine. Lewre kêfa min bi vî gelê serbilind re tê. Ji aliyekî din ve katalonî ji me hez dikin.*

*RIZGARÊ XIDO: Bi texmîna min dema tu hatî vî derê Mîr Celadet Bedirxan hê sax bû. Gelo tu dikarî hinekî behsa wî jî bikî?*

*QELENDERÊ NÊÇO: Dema ez çûm taxa kurdan cara pêşîn cînarekî min ez hildam û birim cem rehetî Celadet. Min cara pêşîn li wê derê alfabe ya kurdî ya latînî dît û ji wê rojê şûn de êdî min dest bi nivîsandîne berda û xwe da xwendîne.*

*(Di vî navberê de lîstikvanê ku Mîr Celadet Bedirxan temsîl dike derdikeve ser dikê û wiha dibêje:*

*“Her wekî me çend caran gotiye yekîtiya milletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tete pê. Di yekîtiya zimên de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e. Yanî ji bona nivîsandîna zimanê miletekî gotî zana û xwendewarên wî milletî bi tevayî ji bo zimanê xwe elfabeyekê bibijêrin û di wî zimanî de çand zarava hebin jî gotî ev zarava hemî bi wê elfabayê bêne nivîsandin. Ji hejmara pêşîn ve xuya ye ku armanca Hawarê ya pêşîn û bingehîn ev e: “Di her tiştî de yekîti”*

*RIZGARÊ XIDO: Apê Qelender em cardin vegerin Bazîde. Gelo tu dikarî hinekî behsa Bazîda kevn bikî?*

*QELENDERÊ NÊÇO: Belê, ez hê zarok bûm hatim Bazîda Kevn. Mala me nêzikî gundê Zengezûr bû û li taxa me pîrejineke bi navê Meta Şerbet hebû û êvaran li dora tendûrê ji me re çîrok digotin. Çîroka Komara Elokana hê di bîra min de ye.*

*(Di vî navberê de lîstikvana ku Meta Şerbetê temsîl dike derdikeve ser dikê û vî çîrokê vedibêje:*

**“Komara Elokana**

*-diyariya sersalê ji bo zarokên kurd-*

*Hebû û tunebû.*

*Li welatê bej û deryayê dûgelek hebû*

*û jê re digotin: Komara Elokana.*

*Li vî welatî*

*navên pînikan li gorî tîpên alfabayê lê danîbûn*

*û parfûmên zîrçê lê dihatin fîrotin.*

*Li wê derê*

*hêkên genî pîroz û karên genefisî zagon bûn.*

*Her wiha li wê derê*

*tenê qirtevirta elokana dihate bihîstin*

*û rojekê*

*roviyekî dorankurmî çav berda milkê elokana.*

*Lewre niçande guran û fîtande kûçikan.*

*Gur û kûçik girijîne hev*

*û efsûna dengê elokana betal bû.*

*Lewre elokana dengên xwe birîn;*

*guhên xwe dan kewtekewt, zûrezûr û nûzenûzan.*

*Bi vî awayî asayîşa elokana berkemal bû.*

*Her wiha bêdengiya elokana*

*erêkirina serdestiya roviyî bû.*

Şevêk ji şevan,  
ji şevên zivistanê  
-roja ku Eysa Pêxember hatibû dinê  
û filehan elok dikirin qurban-  
roviyî navê xwe danî misilman  
û êriş bir ser cûcîkên tawisan.  
Birastî roviyî dixwest ku dilê elokan şa bike  
û destnîşan bike  
ku ew ê di vê sersalê de nebin qurbanî.  
Sibeha wê şeva zivistanê  
giyanewerekî bi navê "Mirovê Çiyayî" derketibû nêçîrê  
û rastî pûrta tawisan a rengrengî hat.  
Mirovê Çiyayî heyfa xwe bi kuştina cûcîkan anî;  
rahişte tîfînga xwe û tola komkujiya tawisan hilanî.  
Bi teqîna guleyê re gur revî  
û kûçîkî zincîra bendetiyê li stûyê xwe danî.  
Paşê mirov hate ber pînika elokan û got:  
- "Di rûyê we de roviyî qira tawisan anî;  
lê êdî hûn hetanî Newrozê xurê min in."  
Di wan şevên zivistanê yên dirêj de  
mirovê çiyayî rojê elokek ser jê kir,  
bi noşîcan xwar û hestî avêtin ber segê zincîrkirî.  
Sêv weşiyar ji daran  
rehmet li gora dê û bavên guhdaran.")

RIZGARÊ XIDO: Qe ji xortaniya te çi tê bîra te? Çi ferq di navbera xortaniya te û xortaniya îroyîn de hene?

QELENDERÊ NÊÇO: Belê, ji dema xortaniyê dawet û govend di bîra min de mane. Bi texmîna min ew dawet û lîstikên berê êdî neman. Xort û xamayên niha li ber muzîkê dilîzin. Di dema me de stranbêjên dîlanan hebûn, yekî distra û yekî lê vedigerand. Mêr diketin serê govendê, govend hetanî nivî ji mêran pêk dihat û yên mayî jin û keçan govend digerandin.  
(Di vê navberê de hinek ciwan derdikevin ser dikê û govendekê digerînin.)

RIZGARÊ XIDO: Apo bi qasî ku ez dizanim tu ji kilamên dengbêjiyê pîr hez dikî. Di dema te de kîjan kilam û kîjan dengbêj navdar bûn?

QELENDERÊ NÊÇO: Baş e, di dema min de dengbêjekî xort hebû û jê re digotin Keremê Kor. Bi rastî ne kor bû; lê çavên wî şaş bûn. Kilam diavêtin ser xelqê. Her kes ditirsiya ku Kerem kilamekê biavêje ser wî; lewma dilê wî nedişikandin û ew razî dikirin. Min kilama Gênc Xelîl pîr hez dikir; hê hê jî jê hez dikim. Lê di vê dawiyê de Marif jî kilameke xweş avêtiye ser kambaxiya rewşa Seîdê Pîran û şahidiya dîrokê kiriye.

(Di vê navberê de dengbêjek derdikeve ser dikê û kilama "Mîrê Min" distrê.)

RIZGARÊ XIDO: Hez dikî em hinekî qala edebiyata kurdî bikin. Bi texmîna min dema ku tu çuyî Binxetê Seydayê Cigerxwîn, Apê Osman Sebrî, Qedrîcan û Nûredîn Zaza jî li wê derê bûn. Rewşa edebiyata kurdî di çaxa wan de çawa bû?

QELENDERÊ NÊÇO: Pîr xweş bû ew heyam. Bi rastî ew kesên ku te qala wan kir xebatên gelek mezin kirin. Di wê tenêtiyê de, di wê tunetiyê de, di wê tirsê de, di wan komkujiyan de bilindkirina navê kurdaiyê rûmeteke pîr mezin bû. Em him mîratxurê keda wan in him jî deyndarên xebatên wan in.

RIZGARÊ XIDO: Apê Qelender, qe xeber û nûçeyên Kurdistanê ji te re tên? Li vê derê tu kîjan pirtûkên derheqa kurdan de dixwînî?

QELENDERÊ NÊÇO: Mixabin pirtûkên kurdî li vir nayên fîrotin. Heke hinek dost û hevalên mînanî te tên vê derê ji min re pirtûk, kovar û rojnameyan tînin. Wan rojên han min pirtûkeke

wergerandî xwend. Behsa gelek tiştan kiribû. Ez wekî te xortek bibûma min ê gotinên wî bi lez û bez bi cih bianîna.

(Di vê navberê de lîstikvanek derdikeve ser dikê û wiha dibêje:

“Ev çendîn sal in ku çanda kurdan rastî qedexe û cezayan tê. Loma çanda wan a dewlemend her diçe tê rûçikandin û tazî dimîne. Divê hemû kurdên zana dest bidin hev û nimûneyên çanda xwe berhev bikin. Çîrokan, stranan, nîfiran, urf-edetan, dilokan, tiştonekan, peyvan û biwêjan derbasî ser kaxezê bikin. Şahidên ku qetliyam dîtine guhdarî bikin û gotinên wan derbasî rûpelên dîrokê bikin. Piştî 20-30 salî êdî ew şahid dê bimirin û kesekî ku behsa van tiştan bike namîne. De gidî xîretkêşino neseकिन, zeman xedar e, dijmin cebar e.”)

**RIZGARÊ XIDO:** Apê Qelender, niha telefonê ji min re hat ku dibêje zarok û ciwanên kurd li ser înternetê li benda te ne ku ji wan re helbestan bixwîni.

**QELENDERÊ NÊÇO:** Êtîmo dilê min van tiştan ranake êdî. Silavên min ji zarokên kurd û Kurdistanê re bibêje. Roj roja xîretê ye. Divê ez vegerime nava zarok û ciwanan û li ba wan helbestan bixwînim ne ku li vê tarawgehê!

Nezîh û Rûkenê ji înternetê hinek agehî berhev kirin, helbesta Nezîhî ya ku Rûkenê di nava arşîva wî de dîtibû jî bi kar anî, hinek nav û agehîyên erdnîgariyê jî bi cih kirin û bi vî awayî xebata xwe ya hevpar derxistin holê. Nezîh û Rûken bi vê ceribandîna gelekî kêfxweş bûbûn ku bi tevahî çêjeke nedîtî ji zimanê kurdî hildabûn. Êdî dema nimêja nîvro hatibû, diviyabû rabûna nimêja xwe bikirana; Rûkenê dê navrojeke sivik amade bikira û Nezîhî jî dê hinekî Quran bixewenda û ji ber bikira.

\*\*\*

Piştî nimêjê Rûken rahişte karên xwarinê û Nezîh jî bismillahek kişand, dest bi jiberkirina Sûreya Mesedê kir ku digot: “Bila bişkên destên Ebû Lehebî û nemîne ew bi xwe jî! Mal û keda wî ya berhevkirî nehate hawara wî. Ew dê di nava agirekî gur de bibe qeşqûlk, jina wî jî kapekî lihevaliyayî di stûyî de dê êzingan ji bo gurrkirinê bîne.” Vê sûreyê gelekî bala wî kişande ser dilnexwestiyên azadî û serfiraziya kurdan. Gelo milletên hind-ewropî yên dût û nêzîk çima kurdan radeştî gelên din dikin? Vê pirsîyarê gelekî dilê wî êşand; lê dîsa jî ev sûreya kurt ji ber kir û fikirî ku Xwedê sebrekî dide ber dilê wî.

Dema ku bêhna xwarinê ya xweş ji aşxaneyê Rûkenê hat ji cihê xwe rabû, hate kulîne, tîkeyek goşt kir nava parçeyekî nên û berê xwe da jûra xwendinê; kaxezek hilda, li pênuşekê geriya û ew jî dît, çavê xwe li sûreyên Quranê gerand û sûreya Tekwîrê hilbijart, bismillahek kişand, li ser terzê wê dest bi helbestekê kir û bi vî awayî ayet daxistin nava jiyana xwe. Dema ku Nezîhî sûreya “nixamtin”ê ya bi navê Tekwîrê veguheste zimanekî helbestkî rast berê xwe da Rûkenê, çû kulîne ku rewşa xurêk çî ye; Rûkenê him bi kevçiyekê qasik tevdiada him jî li kaxeza nivîsê ya di destê Nezîhî de nihêrî û got:

-Te dîsa edebiyat veçirçirandiyê; de ka bixwîne bê ka te çî gotiye û peyama te çî ye?

Nezîhî bêyî ku bibêje ev sûreya Tekwîrê ye û bi zimanekî helbestî guhestiye kurmançî nivîsa xwe jê re xwend:

### ***Nixamtin, kod û krîpto***

*Gava roj hate pêçandinê û herikî, wekî holekê kişiya û çû  
gava stêrk damirîn, ji hev vereşiyar û daketin xwarê,  
gava çiya hejiyan, ji zêmîn raqetiyar û bûn leylan,  
gava dest ji malê civiyayî hate berdan, têtjika dehmehî ji pizdanê raqetiya,  
gava hêştir û navgînên barkirî bêserkar, bêxwedî û bê malxwe man,  
gava ajalên hov û dirinde, mirovên kovî û vederkirî hatin civandin,  
gava derya fûriyan, bi ser hev da keliyan û tevî hev bûn,  
gava giyan bi hev re zo bûn, her yekî parçeyê xwe dît û kemilîn*

*gava ji jina saxî saxî çalkirî û keça tezebûyî hate pirsîn:  
ji ber çi gunehî hatiye kuştin, tepeserkirin û çalkirin;  
gava rûpelên lînûskan û hesabên tomarkirî vebûn,  
gava rûyê esmanan ji dûmanê xuya bû û hate maliştin,  
gava agirê dojhê hate hilkirin, roj bi pêtên êgir hate vêxistin,  
gava bihişt nêzikî merivan bû, her kesî dil bijandê,  
a wê hingê:*

*êdî her giyanek dizane çi li bendê ye, her kesek dizane ka çi amade kiriye,  
Xwedê bi stêrkan sond xwariye; lê gelean xwediyê stêrkê ji bîr kiriye,  
Xwedê bi sipêdeyê sond xwariye; lê gelean jiyaneke şereş tercîh kiriye,  
Ev Quran peyama qasidê qenc e; qencyê dike û tenê gazî qencîkariyê dike,  
Ew qasîd hêz û hêviya xwe tenê ji qudreta Xwedê hildide,  
Ew Xwedayê ku bi ferman e û hezkiriyê bawermendan e,  
Baldar be, ev pêxemberê ku hevaltiyê bi we re dike ne dîn û şet e,  
Vî pêxemberî li esmanê geş Xwedê û milyaketên wî dîtine,  
Ew ne temahkarê veşartina tiştên nehîni ye, karên nepen nake,  
Gotinên wî naşibihin şeytanê naletkirî û hevalbendên wî,  
Hûn ber bi ku dimeşin, armanca we ya ji vê jiyanê çi ye?  
Ev Quran hişyariyek e ji bo gel û neteweyên cîhanê ye, ji bo Neteweyên Yekbûyî  
Herwiha ji bo her çi kesê ku dixwaze li ser riya rast bimeşe.  
Lê hûn bi xwe nikarin bixwazin, heta ku Xwedêya alemê nexweze.*

Rûkenê xwe ranegirt û bi qedîna nivîsê re got:

-Ez benî ev çi helbesteke ewqasî xweş e! Te çawa ewqasî kûr lê xistiye û ewqas wateyên giran lê bar kirine. Diyar e ku dilê te mîna beroşa li ser êgir e û bi qilpeqilp dikele.

Nezîhî jî xwe negirt, kenîya û bersiv dayê:

-Na, gula min, ew ne helbest e; ew bi zimanekî helbestî ragihandina naveroka sûreya Tekwîrê ye. De êdî tu hesab bike ku bi erebî wateya sûreyê çiqasî xurt e!

Rûkenê bi rûyekî xeyidî û bêmehe axivî:

-Erê çeçelo! Ne bavê min bavtî kir ez hînî Quranê kirim ne jî te bi xwendina xwe tîpek hînî min kir, ne min di berxtiyê têr şîr vexwar ne jî di kavirtiyê de têr giya. Îcar tu carinan dibêjî “jîn pir hesreta zimanê tirkî ne” û bi texmîna min gotina te hinekî kelevajî ye. Ji ber ku we mêran hertim ji xwe re cih û warên xwendinê peyda kirine û em jî bi neçarî hînî bermayeyên li ser sergoyan bûne. Seg dizek bibe hinekî jî eyba xwediyê ye.

Wekî ku tevşoyek li eniyê bikeve û xwîn bi ser de birije Nezîhî li rûyê Rûkenê nihêrî:

-Bîbika çavên min, tu bixwazî Xweda dê bide te jî; em qismê mêran gava tiştêkî dixwazin li pey dikevin. Em derfetên xwe ji bo armancên xwe dimezêxin; jiyana me hinekî bi sextî, dijwarî û kedkariyê havênê xwe digire.

-Îcar sûc û gunehê me çi ye?

-Bismillahekê bikşîne, pesna Xwedê bide ku her tişt afirandiye, bi rê ve dibe, çêreyê hêşîn dike û paşê wê çêreyê dike pûşkî hişk-hola. Xwedê hez bike ez ê hînî te bikim, tu dê jî hîn bibî û ji ber bikî. Helbet Xwedê her tiştê eşkere-nepen dizane û çarenûsa me di destê wî de ye; lêbelê heta ku ez sax bibim ez dê alîkariya te bikim û çetinahiyan li ber piyên te yên nazenîn asan bikim.

-Baş e, gelekî razî me; lê gava hişyarî pêwîst bike min hişyar bike. Heke hinekî min bitirsînî dibe ku ji hişyariyên te sûd wergirim. Wek kesayet ez ji hişyariyan hez nakim, gelekî xwezayî me û nahêlim qamçî li min bikevin; lê dîsa jî tu min baş bişopîne.

-Jixwe mirovê ku ji hişyariyê fêhm neke û jê bireve, agir dê bikeve dilê wî û ew agir dê wî ber bi çavkaniya êgir û dojhê biajo. Xwedê neke em têkevin rewşeke wisa ku navbera me bibe agir, bikevin rewşeke nemir-nejiyê. Ji aliyekî din ve Cn. Elî gotiye “tîrs mezintirînê gunehan e” û divê mirov jidil bibe, ne bi kotekî hîn bibe.

Rûken wekî ku jê re bibêje “Xwedê te şad bike ku tu min dilşad dikî” ber bi mêrî ve hat; xwe avête hembêzê; Xwedê, pêxember û nimêj anîn bîra xwe. Di dilê xwe de fikirî ku jiyana cîhanî xweş e; lê axiret û aqibet baştir û cazibtir e, qencî û bedewiya wê cîhana nedîtî ji pirtûkên Cn. Brahmî û Cn. Mûsayî bigire heta Quranê bi berfirehî hatiye neqîşandin.

Piştî xwarinê jin û mêr derketine parkeke bajêr, geh di bin siya daran de rûniştin û bêhneke hênîk standin geh axivîn û hev fêhm kirin. Ber bi êvarê êdî her duyan biryar da ku vegezin malê û amadehiya çûyîna komeleyê bikin.

Gelo şev-roj û nêr-mê pîroz in ku Xwedê bi wan sond xwaribe? Kesê ku malê xwe di riya qenc de bi hişyarî bimezêxe, helbet Xwedê jî riya wî vedike û derfetan jê re asan dike; lê kesê çepel û xwehezkişî baweriya xwe winda dike, di vê navberê de Xwedê jî astengan derdixe pêşiyê, riya wî digire û dema bobelatek tê serê wî mal-hebûna wî mifayê nadê. Xwedê rêber e, destpêk û dawî bi qudreta Wî ne. Pêxember hişyariyê dide: agirekî gurr li pêşiya bendeyan e, holepîten vî agirî kesê nebaş, vecinoq û averêbûyî him dişewitîne him jî riswa dike; ev agir komeke mirovan naşewitîne, ew kes parastî ne, ji ber ku malê xwe di riya qencyê de belav dikan, sipasdariyê ji kesî naxwazin, armanca wan a tekane razîbûna Xwedê ye, helbet xelata wan jî dê baş be û dê ji celatê bîn parastin. Şêx Zakir jî dikete koma van camêrên qenc ku îşev xwarinek belav dikir, Xwedê dianî bîra mirovan, şîretên qencyê li wan dikirin û ji bo vê yekê sipasiya kesî nedixwest, tenê mebesteke wî hebû ku di hîm û rîknê vê komeleyê de xêreke wî jî hebe ku roja qiyametê jê re guwahiyê bike.

Êvarê kurtepista axaftinan Komeleya Gavanê Kurd hildabû; beşdarên civînê qala Cn. Pêxember eleyhiselamî dikir û rûpelê çilmisî yê navê kurdan di vê pêvajoyê de diçirûsî. Her kes gelekî kêfxweş bû ku cara yekem navê kurdan li dîwana Cn. Pêxember eleyhiselamî hatiye tomarkirin. Belê, Anabasiya yûnaniyan jî qala bav-kalên kurdan ên bi navê kardûxan dikir; lê tu carî ewqasî bi servekirî navê kurdan li cihekî din peyda nedibû.

Bernameyê bi xwendina Quranê dest pê kir, Mela Hisênî derbarê damezrandin û armancên komeleyê de axaftinek kir û dor hate Şêx Zakirê mêvan. Şêx Zakir bi sûreya E'layê dest bi axaftinê kir:

-Cn. Pêxember eleyhiselamî bi wehyê navê sûreyê wekî “*Elinda Spêdeyê*” daniye ku 30 ayet in. *Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Sond bi elinda spêdeyê, bi deh şevan, bi kit-cotan, bi şevê dema ku dibihure. Ma ev ne sondek e ji bo kesên têgihîştî. Belê Xwedayê te her dem nobedar e. Dema Xwedê mirovan diceribîne, ji wan re merd û destvekirî ye ew dibêjin “Xwedê ji bo me baş e”; lê dema Xwedê wan diceribîne û bi kêmî dide ew dibêjin “Xwedê min rezîl-riswa dike”. Ne hûn bi xwe ji sêwîyan re nemerd in û hûn bi rikeberî alîkariya hejaran nakin; lê hûn mîrateya wan jî bi tevayî pûç dikin û hûn dildarên diravê xwe ne. Dema dinya hat hêrandin, Xwedayê te ligel ref bi ref firîşteyan hat û dogeh hat nîşandan wê rojê qencî dê were bîra mirovan; lê ma êdî çi fayde jê heye? Ew dê bibêje “Xwezî min bi saxî qencî kiriba”. Hingê kes azaran mîna yên Xwedê nade, tu kes mîna wî bi nîr û zincîran girênade. Ey canê aram, razî û hezkirî li Xwedayê xwe vegere, tev li bendeyên min bibe û têkeve nava bihuştê min.*

Şêx Zakir xwest ku li ser wateyên sûreyê bisekine; lewre bi kurtî çend hevok li hev anîn:

-Gelfî camêr û canikan, wekî ku di sûreyê de jî derbas bû Xwedê her dem û derê bendeyên xwe diceribîne, bi belaşî rizq li wan belav dike. Gava rizq û daxwazên mirovî bi ser de bibarin dibêjin Xwedê çiqasî qenc e; lê gava ezmûnan dest pê kir û Xwedê hinek ji dayînen xwe kêmkirin wê hingê mirovê nankor dibêje ku “Xwedê me di nava xelqê de rezîl û riswa dike”. Îro em dibînin ku gelek millet hukmê li ser kurdan dikin û ev jî îmtihaneke Xwedê ye û divê em bi awayekî serkeftî jê derbas bibin. Divê em jî mîna neyarên Xwedê yên ku zilmê li me dikin zilm û stemê li xelqê nekin û nebêjin Xwedê ji me re baş û qenc e; herwiha gava seba gunehên me Xwedê xêrê ji me bibire jî divê em nebêjin ku Xwedê em ji rêza mirovan derxistine, di nava geremola dinyayê de rezîl û riswa kirine. Hûn jî dizanin ku sazî û dezgehên me yên civakî teral dixebitin, gelek gendeliyan dikin û bi rikeberî neyartiya feqîr-fuqeran dikin, mîretaya Kurdistanê ya sererd û binerd bi destî wan tê zeftkirin û îsrafkirin. Wisa bûye ku êdî dîtina mirovên Xwedêperest mînanî zêrê zer e, peyda nabin; pûlperest û pûtperestan dest daye hev mirovahiyê ber bi bobelatan diajon. Lewre divê mirov

ji qiyameta xwe re jî bixebite ku hêjayî qebûl û bihuşta Xwedê bibe. Ez naxwazim zêde gotinê dirêj bikim, xwarin tê raxistin; fermo noşî can be û di duayên xwe de vî kalê destbigopal jî ji bîr nekin.

Beşdarên civîn û hevnasînê xurekên raxistî xwarin, destexan hatin rakirin û Şêx Zakir dîsa dest bi axaftinê kir:

-Gelî camêr û canikan ez î îşev mêvanê komeleyê me û sibê dê ber bi aliyê Aydinê herim û nixuriyê xwe yê bi navê Evdilah bibînim. Ev camêr ji zû ve ye karsaz e û ji axaftina wî ya li ser telefonê fêhm dikim ku karên wî baş naçin. Hêviya min ew e ku hûn jê re duayekê bikin ku Xwedê rizqekî helal nesîb bikê û ji derd-kulên hebûna dinyayê biparêze. Paşê ez ê vegerime Stenbolê û herime mala xwe ya li Kagitxaneyê; bi rastî piştî mirina Şêxê êdî min karên malê radestî kurê xwe yê biçûk Merdan kirine. Herwiha ez ê carinan herim serdana keçên xwe yên Zozan, Çîçek û Nazê ku hemû jî bûkên eqrebayê ne. Madem ku em cimaeta hazir li ber dergehê Xwedê li benda rehmet û şefqeta wî ne, werin em duayekê li tevahiya xwe, gelê kurd û umeta Mihemed Mistefa eleyhiselat û weselam bikin.

Piştî vê axaftinê Şêx Zakir destên xwe bilind kirin û cimaetê jî pê re dest bi duayê kir:

-Rebî tu mîrê mîran î, duayên me qebûl bike, mal û malbatên me bike lanên qenciye û xêrê ji me kêm neke. Rebî Komeleya Gavanê Kurd bike peyamnêreke gelê kurd ku pêşengê wê Caban El-Kurdî cara yekem di dîwana Cenabê Mihemed Mistefa eleyhiselat û weselam de navê kurdan daye tomarkirin. Pa û pesnên bêdawî ji bo Zatê Te yê Zulcelal bin ku ji me jî mirovek di zincîra sehabiyên de amade bûye.

Nezîh ji cihê xwe rabû û ber bi bavê hat ku wî bibe malê; lê Şêx Zakir mayîna di dergehekî ilmî de munasibtir dît û wê şevê li wir ma. Nezîh û Rûken jî vejeriyên malê, jixwe nimêja şevê li komeleyê kiribûn û êdî nivê şevê bû; divê razana û sibehê Nezîh biçûya birêkirina bavê xwe.

\*\*\*

Berbangê jin û mêr rabûne nimêja sibehê, derseke kurdî ya kurt li ser mijara navdêrê xwendin û dîsa ketine xewê. Bi zerekiyên tavê re Rûken ji xewê rabû, nimêja tavê kir û gazî mêrî kir ku xwe bigihîne bavê xwe. Nezîh bi hişyarbûnê re banzda destşokê, paşê destnimêjek girt û heta ku Rûkenê taştê amade kir wî jî du rikat nimêja tavê kirin. Nimêja tavê cureyekî nimêja nafiye ye û bi wî navî sûreyeke Quranê jî heye. Sûreya Quranê bi sonda Xwedê ya bi danê hilatina rojê û danê şevê yê bêpejn ve dest pê dike. Paşê şîret li pêxemberê umetê tê kirin ku Xwedê ew tenê nehiştiye û lê hêrs nebûye; herwiha Xwedê temeyê didê ku jiyana axret û aqubetê ji bo wî çêtir û baştir e, ew dê bi ya ku Xwedê daye wî razî bibe. Ber bi dawîya sûreyê Xwedê tîne bîra wî ku pêxember berê sêwî bûye û Xwedê ew êwirandiye, rêwinda bûye û Xwedê ew aniye ser riya rast, hejar bûye û Xwedê ew zengîn kiriye. Di dawiyê de jî Xwedê ji pêxemberî dixwaze ku zorê li sêwîyan neke, parsekan neqewirîne û merhemeta Xwedê di nava mirovahiyê de ragihîne.

Nezîhî taştêyeke sivik xwar, xatir ji Rûkenê xwest û bi lez xwe gihande komeleyê ku Şêx Zakir li benda wî bû. Nezîhî xwest ku bavê xwe bibe Aydinê; lê Şêx Zakir got ku ew dixwaze bi otobusekê here wir û bila neviyên wî werin otogarê û wî hildin. Bedir îsrar kir ku Şêx Zakir bigihîne otogarê; lê wî ev yek jî qebûl nekir û got:

-Bila piyên me ji rastiya jiyanê neqetin. Divê em di nava xelqê de herin-werin ku bi êş-kulên wan jî haydar bin.

Piştî xatirxwestin û çûyîna Şêx Zakirî, Bedirî jî xatir ji Seyda Mela Hisên û Nezîhî xwest û çû ser karê xwe. Nezîhî ji xwe û Mela Hisênî re çay dagirt, piştî vexwarina çayê her du camêran dest bi dersê kirin. Dema Mela Hisênî zêde tunebû ku derbarê mijarên dersê zêdetir têkeve kitekitên zanistî; her roj dersa şagirtên biçûk digot, paşê du-sê ders didane Nezîhî û dikete nava kûrahiya dîroka belavbûn, geşedan û rûxîna dewleta îslamê. Helbet ev babet çemekî kûr, fireh û xurt bû; dem, sebr û nixandineke baş dixwest. Di nava van rûpelên çilmisî de rola kurdan çî bû, kurd li kê derê bûn, çî dikirin, rewşa wan a siyasî û aborî çawa bû, civaka kurd li ser kîjan pergalan ava bûbû: ev mijar gişt qada xebata Mela Hisênî bûn ku divê rûpeleke rasteqîn derxista holê.

Dema ku nimêja êvarê kir Nezîhî berê xwe da malê; çawa gihişte malê piştî silav-gulavê qala rêwîtiya bavê xwe kir, çavê wî li xwarinê geriyan û qoşxane tesele kirin. Rûkenê destexan raxist, xwarineke digel suhbeta malbatî xwarin, çaya xwe dane ser êgir û li ber televîzyonê rûniştin. Çavê her duyan jî li wê yekê bû ku dersa xwe ya rojane bikin.

Piştî vexwarina çayê Nezîhî dest bi mijara veqetandekê kir û di navbera nîv saetê de agehî bi ser hev de anîn. Paşê derbasî jûra xwendinê bû, lênûskeke xwe ya kevn anî û li hinek helbestên xwe yên destpêkî geriya ku hebekê hilbijêre, rêbaza xwe ya helbestnivîsînê ya heweskariyê nîşanî Rûkenê bide; bi vî awayî him hêza wê ya hestyariyê tûj bike him jî derseke pratîk li ser rêzimanê bide.

Nezîhî di vê helbesta xwe de qala şeveke xwe ya li biyanistanekê dikir ku tijî êş û jan bû:

### **Şevnameya Biyanistanekê**

I.

Çend nameyên te bi destî penaberan gihiştin min.  
Çend heb jî di nava kel û pelên xeniqiyan de  
ketin destê sîxurên biyanî.

II.

Di nameyekê de te gotibû:  
Benîştê dagirkeran di devê xulaman de pûç nabe.  
Herwiha te dîsa gotibû:  
Evîn li şevbihurkên rebenan êşbireke demkurt e.

III.

Di nameya dawîn de jî te agehiyeke balkêş dabû:  
Li wargeha bav û kalan erd û esman talankirî ne,  
li bajarê ku tu lê yî, -dibêjin- diz û keleşên me disitirin.  
Destên serok û giregiran nagihêje wan.

III.

Min di bersivê de gotibû:  
Ez ê rojekê werim:  
dibe ku edetî ereban bi nîv-saetê bi derengî  
ji ber ku saeta min a japonî li rawestegeheke wan hate dizîn;  
dibe ku edetî cotyaran bi çend deqeyan berî berbangê  
hişyar bibim ji xewa şirîn  
û zû bigihêjim wir bi riya jorîn.

IV.

Di bersivê de jî min wiha gotibû:  
Rûne li xaniyên bê xwedî û şênî,  
bila çavên te bobelatên çûyî nas bikin;  
ez ê jî dapelim ser taximê sîng û berên şevereşan  
ji hingilên komkujîyan poşmaniya dijminan didoşim.  
Tu rûne li wir, ez dê werim.

V.

Di bersiva dawîn de  
min bi qewlê mêrê berê soz dabû te:

*Ez ê werim,  
dev berde ji diz û keleşan.  
Ez ê werim hêviya xwe bibire ji serok û giregirin.  
Jixwe her du jî du tîmên rikeber in;  
piştî lîstikê destebirak û kubar in.  
Bawer bike ez dê werim;  
wekî te birçî bimînim,  
wekî te bistrêm û bilorînim.  
Jixwe karê evîndaran e stran û lorîn.  
Jixwe karê birçiyar e azadî û serxwebûn.*

-Delalê min, Xwedê hebîn e tu çi dibêjî? Ez bi xwe hinek tiştan fêm dikim; lê dinêrim ku wate wekî bayekî digihêjin tîlên hûrik ên porê min, paşê di hişê min de vedigerine bobelîskekê, -got Rûkenê û ji nezaniya xwe qehirî-

Nezîhî li ser xemgîniya Rûkenê sûreya Înşirahê ya bi wateya “dîlaramî”yê xwend û şîrove kir:

-Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Ma me dilê te aram nekir, ew barê ku hindik mabû piştî te bişkêne me li te sivik nekir, me nav û dengê te bilind nekir? Digel tengasiyê berfirehiyek heye. Bi rastî, digel diwariyê rehetiyek heye. Gava tu ji karê xwe vala bûyî, rahêje xebateke din, jidil ber bi Xwedayê xwe ve bilezîne.

Nezîhî li ser xemgîniya Rûkenê sûreya Înşirahê ya bi wateya “dîlaramî”yê xwend û bi kurdî şîrove kir:

-Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Ma me dilê te aram nekir? Me barê te sivik nekir? Ew barê ku hindik mabû piştî te bişkêne. Me nav û dengê te bilind nekir? Digel tengasiyê berfirehiyek heye. Bi rastî, digel diwariyê rehetiyek heye. Gava tu ji karê xwe vala bûyî, rahêje xebateke din; jidil ber bi Xwedayê xwe ve bilezîne.

Li gorî zanînen xwe Rûkenê jî dizanibû Xwedê bi danê êvarê sond xwariye ku mirov dê tîk biçin; lêbelê ew kesên ku bawerî anîne, qencî kirine, ji hev re şîreta rastiyê û baldirêjiyê kirine dê bi ser bikevin. Lewre xwest ku vê xemgîniya xwe bi stranekê aşt bike, bi telefona xwe kete înternetê, straneke evîndariyê dît û ji Nezîhî pirsî:

-Îro ewqas ders û nîqaş bes in; dixwazî em straneke evîndariyê guhdarî bikin û rakevin.

Nezîhî piştî xwendina Quranê nexwest ku straneke bêjingnekirî guhdarî bike; lê dîsa jî pejirand:

-Bi texmîna min, heke em strana bijartî rexne bikin dê baştir be; him zimanê te dê xurt be him jî em dê naveroka wê ji aliyê exlaqî û hunerî ve binirxînin.

Rûkenê telefon da destê Nezîhî û got:

-Fermo, îcar ev karê te ye.

Nezîhî beşa pêşîn a strana “Nêçîrvano” da destpêkirin:

-*Nêçîrvano lo, lo lawiko min ji te re nego li vî berî ha li vî berî.*

*Egîto tu ji Xwedê newêrî, çawa ji Xwedê natirsî*

*Tu vê subengê siwarî boz î çaçan î kapreş î çavreş;*

*Beşlîkî Romê davêjî milê çepê, cotek tajiye kevn ê reşxezalî diavêjî merezê,*

*Berê xwe didî bêlanê bilind, nêçîra van xezalan diajoyî li vî hemberî;*

*Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo egîto*

*Tu nizanî di dêrisê gundê me de bîst û çar eşîr in.*

*Xaliqo bi Rebiyo ez xezal im xezala Egî im.*

*Gerdena min zer e, çepilên min dirêj in, porê min kej e, nava min bi qendîl e,*

*Zenda min bi bazin e, tiliya min bi gustîl e, lêva min tenî ye, pozê min bi qerenfîl e,*

*Sî û sê gulî li ser bejna min a tenik û zirav bûne çît e.*

*Tu dêna xwe bidê zeriye di gundê me de*



*Gelo seba xatirê çav û biriyên min ê reş û belek,  
Ketine dawê bîst û çar serî, way ax hayê.  
Ê de lo, lo lo sekvano biçûko, xişîmo, nezano, lo nijdevano...*

Bi peyva “lo nijdevano” re Nezîhî stran da sekinandin û ji Rûkenê pirsî:

-Te ji vê beşê çi fêm kir?

Rûkenê bi dilsaxî zanîna xwe rave kir:

-Keçik gazî nêçîrvanekî dike û dibêjê bi vî aliyî de were; paşê pesna temtêla wî û hespê wî dide. Piştî derbasî pesna xwe dibe, qala bedewiya xwe dike û di dawiyê de bangî xwestina xwe dike.

-Rast e, hetanî vê derê wekî parçeyekî wêjeyî yê baş xuya dike û niha lê binêre, -got Nezîhî û beşa duyem da destpêkirin-

*Lê, lê, lê lê, lê, lê xezalê*

*Tu nizanî gelo, ne ez Şemo me, ne ez Şemo me.*

*Ez Şemo me, xudanê heft sed miyê serê çiyê, diwanzde kihêlê serê tewlê me.*

*Ji malê siwar bûm li boz î çaçan î kapreş î çavreş,*

*Bêşlîkî Romê diavêjime milê çepê,*

*Cotek tajiyê xezalî diavêjim merezê,*

*Berê xwe didime bêlanê bilind, nêçira van xezalan*

*Tu dêna xwe bidê di dêrisê gundan de nebûm aşiqê qîz û bûkên di xelkê me,*

*Xên ji muhiba dilê xwe bûm, aşiqê rehma di Xwedê me.*

*Ê de lê, lê, lê xezalê wayê...*

*Bejnziravê, çepildirêjê, porkejê, navqendîlê, rûbixalê.*

*Derve sar e qasekê kêlêka min rûnê, li bircên kelehê li yaliyê malê.*

Nezîhî dîsa stran da sekinandin jê pirsî:

-A niha çi bû?

Rûken kenîya û got:

-Welleh çi bibêjim: “me got delal delal, delal çû û di çavkaniyê de rîf”.

-Tu wateyêke şaş didî vî parçeyî bi texmîna min. Nêçîrvan dibêje “derve” û “derveyî urfê” ango “zina” nebaş e, were hundirê malê ku mal keleha mirovî ye.

-Te dît ku belengaza Xwedê qala çi dike û nêçîrvan çi riyê dide pêşiyê. Keçik dibêje “ketine dawê bîst û çar serî, way ax hayê”, bi kurtî gazî nêçîrvanî dike ku were ji xwe re bixwaze; lêbelê nêçîrvan him dibêje muhib û evîndareke min heye him jî dibêje “derve sar e qasekê kêlêka min rûnê, li bircên kelehê li yaliyê malê”.

-Keçê, bi Xwedê min ji vî aliyî ve li babetê nenihêrîbû, wey Xwedê ji te razî bibe! Tu dizanî te aliyekî tarî yê jiyana min ronî kir ku Xwedê her tim te şad û bextewar bike, -got Nezîhî û beşa dawîn a stranê da berdewamkirin-

*Nêçîrvano lo, lo egîto*

*Min ji te ra nego buhar e malên me danîne li zozanê jorîn, gelo li ber belekiyan*

*Tu rabe sekvano buhar e malên me danîne li zozanê jorîn gelo li ber belekiyan;*

*Ez ê tu nîfirê li te nakim, tu ter û can î, genc î, li ber mala xwe be;*

*Hey malmîrat vê subê hêvî û gumana min heye ji Xaliqê alemê,*

*Rebê jorîn, ji mîrê mîran ji şêxê melean,*

*Belkî berfekê bibare; salêkê, şeş mehan bimîne li erdê,*

*Tu qir bikî heft sed miyê xwe yê serê di çiyê, duwanzde kihêlê serê di tewlê,*

*Gidî gelo bi derê buharê re bibî bi hasilê dewê du çêlekan.*

*Ê de lo, lo lo sekvano biçûko, xişîmo, nezano, lo nijdevano...*

*Lo, lo, lo, lo, lo, lo, sekvano...*

*Ez navê te nizanim bi navê şêrîn dibêjim şalhêşîno, şalgevezo,*

*Hey mal mîrat vê subengê heger tu neçîrvan î, neçîrvanê van xezalan...  
Qasekê bizivire li milê xwe ye çepê, li gerdena min a zer mêze ke,  
Tu dêna xu bidê vê subengê mal xirabo ez ê xezal im xezala Egût im,  
Gerdena min zer e, çepilên min dirêj in, porê min kej e, nava min bi qendîl e,  
Zenda min bi bazin e, tiliya min bi gustîl e, lêva min tenî ye, pozê min bi qerenfil e,  
Sî û sê gulî li ser bejna min a tenik û zirav bûne çît e  
Tu dêna xwe bidê di dêrisê gundan de  
Xaliqo bi Rebiyo vê subengê eger tu nêçîrvan î, nêçîrvanê van xezalan  
Bêbextiyan meke qasekê bizivire li ser milê xwe ye çepê,  
Li ter û can û gencên xelkê mêze ke,  
Tu dêna xwe bidê di dêrisê gundan de  
Kareke karxezalan hey wax li minê kujê ezo  
Ê de lo, lo lo sekvano, biçûko, xişîmo, nezano, lo nijdevano.*

-Gaziyê gelekî xwezayî heye, keçik dibêje ku nêçîrvan li pey malê dinyayê ketiye û ez ji bîr kirime; nîfirê li malê wî dike ku tunebe da ku lê bizivire, -Rûkenê ramana xwe derbir-  
Nezîhî telefon girt û da destê Rûkenê; bi laqirdiyan ber bi razanê çûn.

\*\*\*

Bi banga melayî re her du jin-mêr veciniqîn ser xwe ku divê beriya nimêjê avek bi ser xwe de kiribana. Nezîh reviya destşokê û Rûken beziya serşokê; heta ku her duyan nimêja berbangê kir sibeh ji hev zelal bû. Lewre her duyan biryar da ku bi kurtî derseke rêzimanê ya li ser mijara cînavkan bikin, taştîyekê bixwin, Nezîh pirtûkên xwe dubare bike û Rûken jî hinekî li ser kurmancî bixebite.

Piştî nimêja tavê Nezîhî berê xwe da komeleyê û di hişê wî de pêşniyareke balkêş hebû. Çawa xwe gihande cem Mela Hisênî silav da û got:

-Seyda êvarê min straneke kurdî ya gelêrî guhdarî kir û vê sibehê tiştê hate ber hişê min.

-Guhê min li te ye, fermo, -got Mela Hisênî û bi pirtûka di destê xwe re mijûl bû.

Nezîhî pêşniyara xwe ya li ser nivîsandina straneke dînî ya bi tehrê stranên gelêrî wiha şîrove kir:

-Seyda, stranên me yên gelêrî ji sibehê heta êvarê qala tîkiliyên jin û mêran dikin; stranên hevde jî qala bîrdoziyan dikin. Qe dengê ku Xwedê, pêxember, pirtûk, milyaket û axiretê bîne bîra mirovî tune. Dilê min heye straneke wisa biafirînim ku mirovî ber bi dînê Xwedê bîajo û dilê wî bike evîndarê qencyên pîroz.

-De Xwedê karê te li hev bîne û vê serbilindiyê bike para te, -got Mela Hisênî, keniya, pirtûka li dest xwe danî aliyekî û çayeke dem jê xwest-

Ji ber ku temenê wî mezin bû, di mêvanxaneyê komeleyê de jûreke taybet dabûne Nezîhî, nava rojê tê de dima û êvaran vedigeriya mala xwe. Piştî vexwarina çayê û wergirtina dersê Nezîhî berê xwe da jûra xwe ya taybet, rahişte pênûs û lînûskê. Bi qasî zanyariyên xwe yên li ser ahengên kurdî dest bi nivîsandina stranekê kir:

*Weylê dinyayê ez Gavan im, ez Gavan im;  
Bajarê min Sard e, ji qewmê kurdan im,  
Hevalê sed û bîst û çar hezar sehabîyan im,  
Hevqederê Selmanê Pak, Suhêbê Romî, Bilalê Hebeşîyan im.  
Azad ji diya xwe hatime vê cîhana xopan,  
Bi destî sextekarên ayîna Brahîmî li bazaran firotan im.  
Rojek ji rojên Xwedê ku hesabê wan nizanîm,  
Min bihîst ku pêxemberek hatiye, ez jî li wan deran im,  
Dibêje ku neviyê Brahîm Xelîlullah, kurê Evdillahê haşimîyan im.*

*Weylê dinyayê ez Gavan im, qurbana wan rojan im.*

*Min qeyd û zincîr şkandin da pey gaziyê,  
Li dîwana Pêxember eleyhiselam rûniştim bi şanaziyê,  
Guh dan şîret, exlaq, şerîet û mexaziyê.  
Heta wê çaxê kesî navê me nekiribû teraziyê,  
Lê cenabê wî navê me tomar kir bi pîroziyê,  
Kurd rizgar kirin û em derxistin serfiraziyê.  
Weylê dinyayê ez Gavan im, qurbana wan rojan im.*

Bi çilovîlokirin û kemilandina stranê re Nezhîhî rasterast berê xwe da jûra Mela Hisênî û destûr jê xwest ku strana xwe ya yekem jê re bixwîne. Bi bihîstina stranê re çend hêstirên germ ji dêmên melayî daketine xwarê û di nava rihên wî yên bi qasî bihustekê dirêj de winda bûn. Te digot qey ev stranên rastgo ji welatê dil û wijdanê bi rizaya xwe koçber bûne, nav û nîşanên cîhanê naxwazin, şênîyên nava daristanekê ne û dixwazin li wan deran bijîn. Mela Hisênî jî li pey wan rondikên şadimaniyê neket, ew terorîst nehesibandin, ji bo ewlehiyê gule berneda wan, destûr da mafê wan ê penaberîya sofîyane û welatê daristanê jî penaberîya wan pejirand.

Hevokên Nezhîhî wekî hespên çargavî, çirûskên êgir diçeqandin, serê vê spêdeyê êriş dibirin ser xêrnexwazên kurdan, toz ji dîrokê radikirin, doz li sitemkariyê vedikirin û li meydana huner û wêjeyê kom dibûn. Bi rastî neyarên kurdan nankor in, rojekê dê bi çewtiya xwe ve rû bi rû bibin û dê bibînin ku çiqasî heyranên malê dinyayê bûne; lêbelê niha çima nizanin ku rojekê gorên wan dê bên kolandin, ew dê jê bên hilfirandin, niyêt-meremên wan dê bê eşkerekirin, Xweda û bendeyên wî dê bibin şahidên kirêtiya wan? Divê kurd bi xwe jî rabin ser karê xwe, bismillahekê bikêşin û ji bereketa Xwedê sûd wergirin, bidin ser şopa pêşengê xwe yê Gavanê Kurd, pesnê Bexşendeyê vê bereketê bidin û malê xwe di riya Wî de belav bikin û ragihînin ku dijminên wan bêpişt in, Xwedê yarê wan e.

Nezhîhî nihêrî ku bandora stranê di vejandina hestên dînî de xurt e vê carê biryar da ku li ser Meymûnê Kurd jî stranekê çêke; dîsa derbasî jûra xwe ya taybet bû û dest bi nivîsandina stranê kir:

*Lo Meymûno, navbixêro, peyamê bişîne bajarê Besrayê  
Gavanê Kurd ji bajarê Sardê ber bi Mekkeyê bala xwe dayê  
Roniyek şemal dide ji Girava Ereban ber bi Şam û Bexdayê  
Bû pîrê fanî, kete rîyan fenanî rêwiyê Beytullayê  
Xwe gihande koma haşimiyan bi misilmantî dil dayê  
Ji wan re got ez kurd im, navê min tomar bikin bi tevayê  
Ez ê bibim hevalê sed û bîst û çar hezar stêrkên hewayê  
Lo Meymûno hez bike Ehlbeytê bi xatirê Bavê Fatmeyê*

*Lo Meymûno, navbixêro, peyamê bişîne Kurdistanê  
Bibêje me navê kurdan qeyd kiriye li deftera dîwanê  
Werin bi xêr û xweşî lê xwedî derkevin ji dil û canê  
Welat û bajarên xwe biparêzin, vala nekin meydanê  
Pêxember eleyhiselamî azadî bexşandiye cîhanê  
Tu carî stûyê xwe xwar nekin li ber wan dîwaranê  
Bibin pêşengê alaya îslamê heta dawîya dewranê  
Lo Meymûno bi kewserê biratiyê binin teveka Kurdistanê*

Piştî nivîsandina stranê Nezhîhî dua ji Xwedê kir ku ev deng bigihêje tevahiya kurdan, xîret bikin û bigihêjin mirazên xwe. Paşê dîsa hate cem Mela Hisênî ku hê bi pirtûkan re mijûl bû; bi hatina wî re Mela Hisênî serê xwe bilind kir û bi kêfxweşî li rûyê wî nihêrî:

-Beriya ku bixwîni çayekê ji me re dagire. Hêvîdar im ku vê carê rûyê me bidî kenandin û me nedî giriyandin.

Nezîhî wê lezê du çay anîn, gulmek didu li îşkana xwe xistin û dest bi xwendina strana xwe kir. Mela Hisênî piştî bihîstina stranê destên xwe bilind kir û got:

-Xwedê dengê kurdan bibihîze birako! Destxweş! Nezîhcan min zêde pesn neda kar û xebata te; ji ber ku pesndariya zêde berê mirovî ji rastiye diguhêze. Herwiha bi pesna zêde ji bîra mirovî diçe ku ew mêvanê goreke siksar e. Mirovê nezan dê bibîne, bi rastî jî dê bi çavên serê xwe bibîne ku agirekî gur li pêşiyê ye, her kes dê hesabê kirinên xwe bide û encam dê zelal bibe.

Nezîhî dil hebû ku vê suhbetê hinekî dirêj bike; bi vî awayî him Mela Hisênî dê hinekî bêhna xwe bistîne him jî ew dê hinek zanyariyan ji seydayê xwe wergire. Lewre bi dilsaxî jê pirsî:

-Çima mirov ewqasî ji dîne Xwedê dilsar in seyda, ji ber bandora çî ye ev?

-Tu dizanî ew ên ku ji dîn direvin kî ne? Ew kes in ku sêwiyan xwedî nakin, xwarinekê nadine hejaran. Delîl li halê wan nimêjkarên ku guh nadine nimêjên xwe, ji gotinên xwe yên ku her roj di nimêjan de dubare dikin şîretê nagirin, dixwazin ku di her dîmenê de tenê ew hebin, her kes qala wan bike. Ev nekes bûne qiraskê serê umet û mirovahiyê.

Mela Hisênî di axaftina xwe de wisa tijî bûbû ku dikir biteqîya, gazî bêbawerîyan bikira û bigota “ez bi bîrdoziya we bawer nakim, hûn jî bi bawerîya min rêzê nagirin; hema ez dê li ser bawerîya xwe bisekinim û hûn jî li bîrdoziya xwe xwedî derkevin, ne ez ê werim ser rîya we ne jî hûn ê tevî bawermendan bibin, ez bi bawerîya xwe li mala xwe û hûn jî bi bîrdoziya xwe li mala xwe.”

Nezîhî xwest mijarê biguherîne û hinek tiştan ji çanda Ehlê Beytê hîn bibe; lewre ji Mela Hisênî pirsî:

-Seyda, te heta niha qe behsa Xwedê jê raziye cenabê Eliyî nekiriye. Ji kerema xwe re hinekî behsa vê yekê bike.

Mela Hisênî ji nava pirtûkxaneya Nehc'ul-Belaxe kişand û çend rêzik jê re wergerandin:

-Bawerî li ser çar xîman ava bûye: tebat, zanîn, dadwerî, berxwedan. Tebat jî li ser çar xîman ava bûye: xwestin, tirs, dûrbûn, payîn. Kî hewesa wî bi bihuştê re were, dê ji şehwetan vegere. Kî ji êgir bitirse, dê ji qedexeyan bireve. Kî ji cihanê dûr bireve, dê bobelatan bêbiha bibîne. Kî mirinê bipê, dê bireve qenciyan. Zanîn jî li ser çar xîman ava bûye: feraseta pêşbîniyê, gihiştina kana hikmetê, penda îbretê, karpêkên pêşewayan. Kî hişmendiyê binase, hikmet jê re eşkere dibe; hikmet jî kê re eşkere bibe, dê îbretê bihesibîne û kî jî îbretê bigire, tu dibejî qey tevî pêşewayan dijî. Dadwerî jî li ser çar xîman ava bûye: têgihiştina kûr, zanîna berfireh, hikmeta berz, bêhnfirehî. Kî bigihêje kûrahiya zanistê, dê rêbaza biryarê di cih de dayne. Kî bêhnfireh be, dê di karê xwe de zêdegaviyê neke û di navbeyna xelqê de pesna wî bê dayîn. Berxwedan jî li ser çar xîman ava bûye: fermankirina başiyê, qedexekirina nebaşiyê, duristiya di şergehê de, kirêt-dîtina zindiqiyê. Kî fermanan ji bo qenciye rake, piştî bawermendan xurt dike. Kî dijberî nebaşiyê derkeve, dê pozê minafiqan bişkîne. Kî di qada cengê de bizaveke rasteqîn nîşan bide, peywira xwe bi cih tîne. Kî jî kirêtiyên zindîqan eşkere bike û ji bo Xwedê hêrsa xwe bîne, Xwedê jî ji ber wî ve dê hêrsa xwe bîne û di roja qiyametê de wî razî bike. Bawerî ew e ku tu rastiye hilbijêrî, her çiqas xesarê bide te jî. Ji derewê vejerî, her çiqas sûdê jê wergirî jî. Divê axaftina te ji karpêka te zêdetir nebe û di rexnekirina hevrikê xwe de ji Xwedê bitirsî.

Piştî ku Mela Hisênî ev rêzik xwendin tiliya xwe kire nava pitûkê û got:

-Nezîhcan axaftinên Xwedê jê raziye cenabê Eliyî gelekî kûr in; divê meriv bi baldarî û digel şerhan bixwîne. Loma jî navê pirtûka wî “Nehc'ul-Belaxe” ye, ango “Rêbaza Axaftinên Bilind”. Îro ewqas bes e, carinan bîne bîra min ku ez ji te re çend rêzikan jê bixwînim.

Nezîhî fêhm kir ku dilê Mela Hisênî gelekî tijî bûye û kela girîne li rûyê wî xuya dike; lewre destûr jê xwest ku îro hinekî zû here mala xwe û ji komeleyê ber bi malê meşiya.

\*\*\*

Dema ku gihîşte malê berêvar bû; li zengilê dêrî xist, Rûkenê pirsî bê ka kî ye, Nezhîh deng da ku mêrê wê ye û wê jî derî vekir. Piştî silavê û danîna kel-melên di destê xwe de Nezhîh qala nivîsandina her du stranên xwe û berteka Mela Hisênî kir:

-Gula min tu dizanî îro çima zû hatim?

-Ji bo çi hatibî Xwedê bi xêr bike!

-Xwedê ji te razî bibe! Kulîlka bedew, Xwedê di laşê mirovî de endamekî wisa çêkiriye ku wekî Keibeyê ye û divê mirov hertim ji tevgera wî haydar be û wî biparêze. Kesê ku mîna Ebreheyî li filên hêza xwe siwar be û ji bo rûxandina wî dilî hereket bike Xwedê destûrê nadê. Gava mirov bi zanatî dilekî bişkîne dibe ku Xwedê ref bi ref teyrên Ebabîl bi ser wî de bişîne, kevirên ji heriya şewitî bi ser de bibarîne û wî li erdê bike xesîl.

Rûkenê armanca wî fêm nekir û pirsî:

-Te dilê hinekan şikandiye yan hinekan dilê te şikandiye?

Nezhîh hewl da ku armanca vê destpêka xwe şîrove bike:

-Na, bi Xwedayê şev û rojan, min bi zanatî û dijminatî dilê kesî ji xwe nehiştiye; lê gelek kesan dilê min ji xwe hiştiye, nebaşî li min kirine, bi nebaşî der û dora min girtine, şeva min kirine roj û roja min veğerandine şevê, êdî bi xet-nivîşt û tilisman be yan jî bi tişteki din be nizanîm, gelek çavreşî li min kirine.

Rûkenê destê wî girt, lavayî lê kir ku ew jî mîna neyarên xwe nebe û ji riya Xwedê şaş nebe; Nezhîh dîsa berdewamî da axaftina xwe:

-Înşaallah ez dê ji riya Xwedê şaş nebin; lê divê tu jî alîkariya min bikî. Min xwe spartiyê Xwedayê mirovan, serdar û rebê tevahiya mirovan; hêvîdar im ku Ew min ji kurtepiستا dilnexwazan biparêze ku tasewasên wan nekevin dilê min.

Rûken li bendê bû ku qala armanca vê destpêkê hîn bibe:

-Îcar îro çi bû ku dilê te ewqasî tijî ye?

-Ka ez destnimêja xwe teze bikim ez ê ji te re bibêjim, -got Nezhîh û ber bi destşokê çû-

Piştî destnimêjê Nezhîh hate hinda Rûkena ku li hêwanê rûniştibû û silav dayê; qehweyek jê xwest û got ku îro qe çi kiriye. Rûkena ku li benda axaftinekê bû behsa karên malê, xwendin û nivîsandinên xwe kir. Mijara nivîsandinê wekî rûnê helandî derfet da ku Nezhîh jî qala hinek ramanên xwe bike. Piştî vê danûstandinê Rûkenê dest bi mizgineyeke xwe kir:

-Xwedê yek e, herheyî ye; ne Ew ji kesî bûye ne jî kesek ji Wî, hevberê wî tu kesek tune.

-Keçê ev çi raz û tilism in?

-Te hê fêm nekir? Ez behsa Xwedayê bêheval û bêhogir dikim; wisan e em bende biheval û bihogir in.

-Xwedê me bike heval û hogirên qencan, -got Nezhîh û li bendê bû ku Rûkena bi nazenîni diaxive tişteki bibêje-

-Êdî hevparek, hevalek û hogirekî me heye lo lo! -got Rûkenê û li benda berteka wî sekinî-

Nezhîhê ku li ser paldankeki rûniştibû serê xwe kire ber xwe, her du destên xwe birin nava porê xwe û giran giran peyivî:

-Bila bi xêr û bawermend be înşaallah! Hêvîdar im ku cêwî bibin.

-Xwedê hêviya te bigihêjîne sêrî, -got Rûkenê û qala ezmûna xwe ya ducaniyê kir-

Nezhîh pêşniyar kirê ku sibehê herin bijîjkekî û rewşê zelal bikin; Zelalê jî tişteki negot, tenê xwest ku gotina mêrê wê bi cih were, ji vir şundetir îfrazan li mêrê xwe neke ku li gorî baweriya wê îfrazan li mêrî dibijîne nifşa tezehatî jî.

Piştî zelalbûna ducaniyê êdî şereş winda bûbû, stêrk xuricîbûn; diyar bûbû ku Rûken şaş nebûye, dengê xwe winda nekiriye û ji ber xwe neaxiviye. Zarokê nû wekî daxuyaniyeke Xwedayê jin-mêran û mê-nêran hatibû ragihandin; Xwedayê ku bi hêzeke xurt giyan dida ber giyaneweran zagona xwe ya di nava bendeyan de disepand, ew li hev zêde dikirin û ji hev kêmbûn dikirin. Çûyîna bijîjki rewş neguherandibû û zarok hebû; lê du dilan bi hev re diavêt, bijîjkiyê gotina xwe ya dawîn digot ku hemla Rûkenê du zarok in û ji bo zanîna zayenda wan hê zû bû. Giyan rewşeke zelal a wisan e Xwedê pifî çi bike demildest dibe giyanewer, dikeve nava liv û

tevgerê. Êdî ev pifêke çawa ye kesek nizane; lê diyar e ku ji hafa Xwedê berjêr dibe, bi qasî dûrahiya du tîran nêzik dibe û digihêje armanca xwe. Tîrên Nezîhî jî ji kevana xwe derketibûn, berê xwe dabûn rehma Rûkenê, hinekan ji xwe re zevînek guncan dîtibû, tovê avêfî pejirandibû, giyan hatibû ber avikê, êdî Nezîhî dê bi Rûkenê re neketa nîqaşan ku derûniya wê xera nebe,

Nezîhî hewl da ku diyariyeke ducaniyê bide jina xwe; rabû, çû mitbexê û dest bi çêkirina xwarinekê kir. Tebatiya Rûkenê li hêwanê nehat û ew jî hate hinda mêrî bê ka çi dike. Bêyî ku îfrazê li naziktî û kubariya wî bike tevgera destên wî temaşe kir û paşê li ser kursiyekê rûnişt. Ji nişkê ve her sê pûtên ereban Lat, Menat û Uzza hatin bîra Rûkenê; ew pûtperestiya ku zarokên keç û kur ji hev vediqetandin, kur bi ser keçan re digirtin, keç saxî saxî di nava axê de çal dikirin. Pirsra “gelo Nezîhî ji kuran hez dike yan ji keçan?” di ber hişê wê re çû û hat. Di vê navberê de Nezîhî li pişt xwe ve zivirî û bi devekî henekî:

-Înşaallah qe nebe zarokek dê keç be ku alîkariya te bike û bibe delaliya malê, -got û Rûkenê di dilê xwe de şukra Xwedê kir ku nexweşiya bavixsalariyê bandor li Nezîhî nekiriye yan jî exlaqê wî xera nekiriye-

Rûkenê dizanibû ku parevekirina kur û keçan ne di destên wê de ye; lê dab û nêritên kurdan ên bavixsalariyê ev desthilatdarî daye mêran ku hertim xwedî li zarokên kurîn derkevin û keçan piştguh bikin. Ev zanyariyên gelêrî yên texmînî û bihîstinî tenê kevneşopiyek in û xwe naspêrin agehiyeke zanistî; lê dîsa jî her jineke ducanî dikeve tatêla hemla xwe û naxwaze ji ber zarokên xwe bi mêrî re têkeve nava tengasiyan. Bi rastî mirov nikare bigihêje her tiştê ku dixwaze, dil diavêjê û dibijjinînê; heke Xwedê destûrê nede milyaket jî nikarin xêrê li mirovan bikin. Lewre Rûkenê bi dilekî şa li xurekpehtina Nezîhî temaşe kir, palûşkên xewê hatinê û dîsa vegeriya hêwanê, hinekî xwe dirêj kir. Gelo Nezîhî serhişk îro çima ewqasî sernerm bûbû? Gelo milyaketên van zarokan hebûn ku li nava malê digeriyan? Ji nişkê ve hate bîrê ku zayenda milyaketan nîn e, ew afirandiyên şefaf in û mîna mirovan naxwin-venaxwin; lê gelo çima gelek wêne hatine xêzkirin ku milyaketan wekî jinan û keçan nîşan didin? Rûken hizirî ku “bi rastî ev bawerî ji kevneşopiyên şaş derdikeve holê û ji aliyê zanistê ve nayê piştrastkirin”; bi vî awayî ji nava şik û gumanan derket, da ser şopa zanyariyên Quranê, li ser karpêkên xelat û celatê fikirî û ji xew re çû.

Piştî niv saetekê Nezîhî hate hêwanê û dît ku jina wî ya ducanî razaye; bêyî ku xewa wê biherimîne dîsa vegeriya mitbexê û bi amadekirina xurekî re mijûl bû. Dema ku xurek amade bû Nezîhî bi nazikiyeke nedîtî jina xwe ji xewê hişyar kir, xwarineke xurt pê da xwarin û pêşniyar kirê ku bi tevayî herine mala bavê wê. Rûkenê bi kêfxweşî pêşniyara wî qebûl kir û bi erebeyê çûn mala Bedirî. Piştî pirsîna hal-xatiran, Rûkenê diya xwe bire jûreke din û ew bi ducaniya xwe ve agehdar kir. Hê Bedir û Nezîhî diaxivîn ku hewaye cejnê li nava malê belav bû, qirtevirt û kurtepestek ket nava xwişk û birayên Rûkenê. Beriya ku ji malê veqetin Nezîhî gote malxêzûrana xwe ku ew dê sibehê here, xatirê xwe ji seydayê xwe bixwaze û berê xwe bide Stenbolê. Piştî veqerê Nezîhî tevdirên aborî û yên din ên pêwîst girtin, çenteyê xwe yê rêwîtiyê amade kir û kete xewê.

\*\*\*

Sibetirê Rûken bi êş û janekê ji xewê hişyar bû ku Nezîhî ne di paşilê de bû, xêleke xurt bêpejn sekinî ku dengê bibihîze; lê qireqira malê bû û cara yekem bû ku mala wê bi tenêtiyeke ewqasî kûr ve dihejiya. Lewre rabû ser xwe û berê xwe da destşokê; dest, ser û çavên xwe şuştin û çû mitbexê. Li ser maseyê taştêyê amade, guline teze di guldanekekê de û parçeyek kaxeza nivîsandî hebû. Beriya ku dest bi xwarinê bike çavên xwe li nivîsê gerandin ku di çend rêzikan de wiha gotibû:

“Gula min,

Min baqek pere û lînûskê daniye bin balgiyê xwe. Bêtirs pereyên xwe xerc bike û ji vî aliyê ve nekeve xeman. Ew lînûsk razên min in ku min navê “Lînûska Muflisekî Eşqê” lê daniye. Bi rastî ev lînûsk wekî ferhengêkî ye û her tîpek qala hezkiriyê min dike; lê min xwediyên wan eşkere nekirine. Êdî maye ser te ku razên min vereşîni û derûniya min baş nas bikî.

*Ezîza min,*

*Te hêviyeke wisa xurt daye ber dilê min ku ez ê êdî bikaribim heta remeqa dawîn a jiyana xwe ji bo xewn-xeyalên xwe têkoşînekê bidim. Helbet ez ê jî bibim hêviyeke rasteqîn ji bo te ku bikaribî bi êş û azarên dêtiyê re serederiyê derxî. Şîreta min li te: Çi gava hişyar bûyî, pêşiyê taştiya xwe bixwe, lénûska min hilde û here hêwanê; xwe baş û tendurist dirêj bike û paşê telefonî min bike.*

*Li benda dua û şîretên te, niyazên bextewariyê pêşkêşî dilê te yî mezin dikim.*

*Nezîhê te yî rûreş”*